



K.T.

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind
TESRÎFA TEREMAXÎ**

(Metn û Lêkolîn)

Aydın ÜNEŞİ

11711014

Mêrdîn-2016

K. T.
Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind
TESRÎFA TEREMAXÎ

(Metn û Lêkolîn)

Aydın ÜNEŞİ
11711014

Şêwirmend
Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn -2016

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Teskîfa Teremaxî” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

21/06/2016

Aydın Üneşi

KABUL VE ONAY

Aydın Üneşi tarafından hazırlanan Tesrîfa Teremaxî adındaki çalışma, 13.07.2016 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

Başkan:

Juri:

Juri:

PÊŞGOTIN

Mala Xwedê ava ku di vê biwara pîrepayîzî ya zimanê kêmketî kurdiya kurmancî de em îstîxdam kirin. Bi qasî çandina kulîlkekê yan avdana gulekê be jî me feyde dabe vî zarê şêrîn bo me bextewarî ye. Dibêjin “we li ku riya xwe şaş kir, vegerin destpêka rê”. Bi vê xebatê em jî çûn serdema mîrekiyên kurdan (ss16-17an), sibeha ronesansa siyasî û çandî ya kurdan. Me xwe gihand babê ruhî yê zimanê kurdî Eliyê Teremaxî danerê rêzimana kurdiya kurmancî û yekemîn pexşannûsê kurdî. Li gorî pîvanên akademîkî bi qasî ji me hat me ronî da ser Eliyê Teremaxî û berhema wî ya ku me navê *Tesrîfa Teremaxî* lê kir.

Armancên vê tezê ev in: 1. Bi awayekî zanîstî li gorî rêbazên rêzimanî dahurandina naveroka *Tesrîfa Teremaxî*. 2. Ji bo ehlê ilmê ji berhemê baştir îstîfade bike traskrîbekirina wê. 3. Da ku nifşa nûgihîştî jê baştir fêhm bike, rojanekirina wê. 4. Destnîşankirina ciyê wê di kevneşopîya medreseyan de nexasim ên kurdan. 5. Bi awayakî rast û lihev danasîna Eliyê Teremaxî û berhema wî ye, lewre gelek şaşî û xeletî derheqê wî û berhema wî de hatine kirin. Bo nimûne: Eliyê Teremaxî kirine Eliyê Termokî, serdema jiyana wî ku 1000ê hicrî ye kirine 1000ê mîladî, tarixa serdema jiyana wî kirine tarîxa jidayîkbûna wî. Hinek berhem ji wî re kirine mal ku ne ew berhem li ber dest in û ne jî delîlên ciddî yên hebûna wan hene.

Di xebata vê tezê de heta ji destê me hat me xwe gihand çavkaniyên eslî yên derheqê Teremaxî û *Tesrîfa* wî, ku gelek hindik in. Ên ku hene jî sêpayî wan hema bêje wek hev in, ji hevûdin girtine û şaşiyên wan hene, ji ber ku ji hevûdin girtine îstîsna ne tê de şaşiyên hev dubare kirine, hinan jî şaşî lê zêdetir kirine. Me li ber xwe da ku wan şaşîyan sererast bikin. Ez çûm Teremaxê gundê Eliyê Teremaxî. Min agahiyên derheqê Teremaxî

de ji nevîçîçirkên wî wergirtin. Teremaxî wêga jî li gundê xwe aktuel e tê zanîn, heta bi navê wî zewîyek li gund heye. (Ciyê xebînetê ye ku hê jî ne li Muksê û Wanê ne jî li deverêke din a kurdan navê hêja Eliyê Teremaxî li saziyekê nehatiye kirin, nayê vejandin.)

Bi vê mebestê em pê hisîyan ku seydayê hêja Marûf Xeznedar ji gelê kurd nexasim ji akedemîsyenan sipasiyeke xusûsî heq dike. Seyda Xeznedar *Tesrîfa Teremaxî* tenê dernexistiye ronahiyê, her wiha bi awayekî zanistî li ser xebitiye, beyî ku dest di orjînaliya wê werde ew pêşkêşî aliman kiriye. Ne ji wî bûya vêga hê jî ev berhema giranbûha di nav refikên arşîva pirtûkxaneyê Enstîtuya Rojhilatnasî ya Akademiya Zanistîya Sovyet li Lenîngradê bû.

Bi xebata vê tezê ez ji gelek mamoste, dost û hevalan re bûm deyndarê sipasiyê. Di serî de ji bo ked û serêşandina wî ji şewirmendê xwe Mamoste Hayrullah Acar re sipasiyên xwe yên xusûsî pêşkêş dikim. Min bi şewirmendiya mamoste Kadrî Yıldırım dest bi vê tezê kiribû, ji bo handan û qewîtiyên wî sipasiya wî jî dikim. Her wiha ji bo nîrxandina wan a tezê ji Mamoste Zahir Ertekin, Mamoste Ahmet Gemi û Mamoste Abdurrahman Adak re sipas dikim. Ji bo alîkariya xebata farisî ji Mamoste Sedat Baran re, ji bo ya kurdiya soranî ji hêja Muhsin Özdemir re, ji bo ya inglîzî ji hêja Abdurrezak İlge re, ji bo alîkariya xebata sererastkirin û mîzanpajê ji hêjayan Ayhan Yıldız, Ramazan Çetin, Ahmet Eyer û Ferzan Şêr re sipasiyên xwe pêşkêş dikim, Xwedê ji hemûyan razî be.

Aydın Üneşi

Batman-2016

KURTE

Eliyê Teremaxî ku li gundê Teremaxê yê Muks [Bahçesaray] yê Wanê hatiye dunê, di şikesteka sedsalên 16 û 17an de jiyaye. Cara ewil, wî rêzimana erebî bi kurdiya kurmancî nivîsiye. Teremaxî di berhema xwe de beşeke musteqîl ji rêzimana kurdiya kurmancî re jî veqetendiye, her wiha rêzimana erebî, farisî û ya kurdiya kurmancî berawird kiriye. Lewre ew weke rêzimanzanê kurd ê yekem e ku bi kurdiya kurmancî li ser rêzimana erebî û kurdiya kurmancî rêzimanek nivîsiye.

Destnivîsa *Tesrîfa Teremaxî* cara ewil di salên 1850yî de li Hekarî li ba melayekî hatiye dîtin. Mela Mahmûdê Bazîdî ew rûnûs kiriye û pêşgotinek li ser medreseyên kurdan û danerê berhemê jê re nivîsiye. Konsolosê Rûsyayê yê li Erzerûmê A. Jaba ew şandiyê arşîva Akademiya Zanistiya Sovyet a li Lenîngradê. Marûf Xeznedar jî ji wir girtiye û di sala 1971ê de li Bexdayê, digel pêşgotinekê çap kiriye.

Berhem ji destpêkek û 31 beşan pêk hatiye û ji bo ehlê medreseyê yên ku nû dest bi xwendina erebî bikin hatiye amadekirin. Bi traskrîpekirin û rojanekirina zimanê *Tesrîfa Teremaxî* û ji aliyê şêwe, ziman û rêzimanê ve dahurandina wê, palpiştiyeke girîng ji xebatên modern ên li ser rêzimana kurdiya kurmancî re ava bûye. Tesrîf, bi aliyên xwe yên dîrokî, di nav kitêbên dersê yên mufredata medreseyên Kurdistanê de, bûye xwedî ciyekî girîng.

Peyvên sereke: Eliyê Teremaxî, Serf-Tesrîf, Mela Mahmûdê Bazîdî, medrese, A. Jaba.

ÖZET

Van'ın Bahçesaray (Muks) ilçesine bağlı Yaylakonak (Teremax) köyünde dünyaya gelen Eliyê Teremaxî, 16-17. Yüzyıllarda yaşamış bir kürt medrese bilginidir. Teremaxî Kürt dili tarihinde ilk defa Arapça gramerini Kurmanci Kurtçesiyle kaleme almıştır. Teremaxî eserinde Kurmanci Kurtçesi gramerine de özel bir yer ayırmış, bunun yanı sıra Arapça, Farsça ve Kurmanci Kürtçesi gramerlerini karşılaştırmıştır. Çünkü O dilbilimci olarak Kurmanci Kürtçesiyle Arapça ve Kurmanci Kürtçesi gramerleri hakkında nesir olarak kürtçe eser yazan ilk kişidir.

Tesrifa Teremaxî'nın ilk elyazması 1850'li yıllarında Hakkari'de bir mollanın yanında bulunmuş olup, Mela Mahmûdê Bazîdî onun bir örneğini kaydetmiş ve Kürt medreseleri ile eserin yazarı hakkında bir önsöz eklemiştir. Rusyanın Erzurum konsolosu A. Jaba eseri Leningrad (Petersburg)'ta bulunan Sovyet Bilimler Akedemisi arşivine göndermiş olup, eser günümüze kadar burada muhafaza altında bulunmaktadır. Marûf Xeznedar da el yazmayı oradan alarak 1971'de Bağdat'ta, bir önsözle birlikte yayınlamıştır.

Eser bir giriş ile 31 bölümden oluşmuş olup medrese mensuplarından Arapçaya yeni başlayacaklar için hazırlanmış. *Tesrifa Teremaxî*'nin transkripsiyonu ve dilinin günümüz konuşma diline adapte edilmesiyle şive, dil gramer açısından incelenmesi, Kurmanci Kürtçesi çalışmaları için önemli bir dayanak olmuştur. *Tesrîf* tarîhsel boyutlarıyla, Kürdistan medreseleri müfredatı içerisindeki ders kitapları arasında önemli bir yer edinmiştir.

Anahtar Kelimeler: Eliyê Teremaxî, Serf-Tesrîf, Mela Mahmûdê Bazîdî, medrese, A. Jaba.

ABSTRACT

Eliyê Teremaxî was born in the village Teremax near Mukus, Van and he lived in turn of the 16th and 17th century. He is the first person who wrote of Arabic grammar in Kurmanji Kurdish. In his book Teremaxî detached a section for grammar of Kurmanji Kurdish as well as he compared the grammars of Arabic and Kurmanji Kurdish. Therefore, he is considered as the first Kurdish linguistic who wrote of the Arabic and Kurmanji Kurdish grammars in Kurmanji Kurdish.

The manuscript of Conjugation by Teremaxî was discovered by an imam in Hakkari in 1850. Mela Mahmûdê Bazîdî made a copy of it and wrote a prologue about Kurdish madrasahs and the author. A. Jaba, the Russian Consul of Erzurum, sent a copy of the work to the Soviet Academy of Sciences in Leningrad. Marûf Xeznedar obtained it from there and published it with a prologue in Baghdad in 1971.

The work, which consists of one introduction and 31 sections, was prepared for the new students of madrasahs to learn Arabic. The subject of this thesis has been in an interesting position in terms of characteristics of tradition of madrasahs in general and of Kurdish madrasahs. Conjugation by Teremaxî has been transcribed and updated as well as analyzed in terms of style, language and grammar in order to constitute a crucial support for the modern studies on Kurmanji Kurdish. With regards to its historical features, The Conjugation has had an important position among the textbooks of curriculum of madrasahs in Kurdistan.

Key words: Eliyê Teremaxî, Arabic conjunction, Mela Mahmûdê Bazîdî, madrasah, A. Jaba.

NAVEROK

PÊŞGOTIN.....	I
KURTE	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT.....	V
NAVEROK.....	VI
KURTEBÊJE.....	IX
ALFABEYA TRANSKRÎBEKIRINÊ.....	X
DESTPÊK	1
1. Armanç û Çarçove.....	1
2. Rêbaz û Çavkanî.....	1
3. Tesrîf, Naverok û Cureyên Wan.....	4
3. 1. Serf û Tesrîf.....	4
3. 1. 1. Danerê Serfa Erebî.....	4
3. 1. 2. Mijarên Naveroka Tesrîfan.....	5
3. 1. 3. Tesrîf, Haşîye û Wergerên wê di Zimanên Cûrbecûr de.....	5
3. 1. 3. 1. Hinek Tesrîfên Erebî.....	5
3. 1. 3. 2. Hinek Tesrîfên Tirkî.....	6
3. 1. 3. 3. Hinek Tesrîfên Kurdî.....	7

BEŞA YEKEM

MEDRESE Ê DÎROKÇEYA WAN

1. Kevneşopiya Medreseyan û Medreseyên Bakurê Kurdistanê.....	11
1. 1. Medrese di Desthilatdarî û Xanedanên Kurdan de.....	13
1. 2. Jiyan û Debara Feqiyên Medreseyan.....	16
1. 3. Ilm û Pirtûkên li Medreseyên Kurdan Dihatin/Tên Xwendin Ango Kitêbên Rêzê.....	19
1. 3. 1. Ilmên li Medreseyên Kurdan Dihatin/Tên Xwendin.....	19
1. 3. 2. Pirtûkên li Medreseyên Kurdan Dihatin/Tên Xwendin Ango Kitêbên Rêzê.....	20

BEŞA DUYEM JIYAN Ê BERHEMÊN ELİYÊ TEREMAXÎ

Destpêk.....	26
1. Jiyana Eliyê Teremaxî	28
1. 1. Navê Wî	28
1. 2. Gundê Wî Teremax	28
1. 3. Nasnameya Wî	29
1. 4. Şexsiyeta Wî ya Ilmî	30
2. Tesrîfa Eliyê Teremaxî	31
2. 1. Serencama Tesrîfa Teremaxî	31
2. 1. 1. Navê Tesrîfa Teremaxî	32
2. 1. 2. Şekl û Şemala Destnivîsê	33
2. 1. 3. Naveroka Tesrîfa Teremaxî	34
3. Guftugoyên li ser Eliyê Teremaxî	35
4. Berhemên Ku Nisbeta Wan Didin Aliyê Eliyê Teremaxî ve.....	37

BEŞA SÊYEM TEYBETMENDIYA ZIMANÎ YA TESRÎFA ELİYÊ TEREMAXÎ

1. Tesrîfa Teremaxî ji Hêla Şewe û Şewezariyê ve	39
1. 1. Bikaranîna Erebi û Kurdî Digel Hev:	41
1. 2. Term û Têgihên Alîkar ên Vegotinê:.....	41
1. 3. Teşe û Qalibên Vegotinê:	42
1. 4. Ji Bo Hînbûn û Çavnasîyê Bikaranîna Term û Tabîrên Biyanî:	42
2. Dahurandina Tesrîfa Teremaxî ji Aliyê Rêzimanî ve	43
2.1. Îsm/Navdêr	43
2.1.1. Navdêr li Gorî Mêjer, Zayend û Wesfandinê.....	44
2. 2. Cînavk	46
2. 2. 1. Cînavkên bi Lêkera Dema Niha re Tê Bikaranîn	47
2. 2. 2. Cînavkên Nehazir	48
2. 2. 3. Cînavkên Hazir	49
2. 2. 4. Cînavkên Şanîdanê	49
2. 3. Rewşa Banglêkirinê ya Baneşanan	50

BEŞA ÇAREM

A- METNA TRANSKRÎBEKIRÎ YA TESRÎFA TEREMAXÎ	
HAZA KÎTABÛ ‘ÎBARETÎ ‘ELÎ TEREMAXÎ	52
HAZA KÎTABÛ ŞERFÎ LÎSANÊ KURDÎ	52
ÎSMUTE’RÎF Ê BEYANA WÊ	53

B- METNA ROJANEKIRÎ YA TESRÎFA TEREMAXÎ	
HAZA KÎTABÛ ÎBARETÎ ELÎ TEREMAXÎ	71
NAVDÊRÊN DIYAR Ê BEYANA WAN.....	72

ENCAM	90
PÊVEK 1.....	92
PÊŞGOTINA MELE MAHMÛDÊ BAZÎDÎ YA TESRÎFA TEREMAXÎ	92
PÊVEK 2	94
FOTOYÊN HINEK ÇAVKANIYAN.....	94
ÇAVKANÎ	106



ALFABEYA TRANSKRÎBEKIRINÊ

Teremaxî tesrîfa xwe bi tîpên erebî nivîsiye, me jî li gor alfabeya navneteweyî ew transkrîbe kirin. Alfabeya transkrîbekirinê:

ا: A a

ب: B b

پ: P p

ت: T t

ج: C c

چ : Ç ç

د: D d

ر: R r

ز: Z z

ژ: J j

س: S s

ش: Ş ş

گ: G g

ف: F f

ق: Q q

ك: K k

ل : L l

م : M m

ن : N n

و : W w

ف : V v

خ : X x

ه : H h

ی : Y y

ی : Î î

Tîpên ku di alfabeya kurdî de tune ne:

ص : Şş

ذ : Zz

ح : Hh

غ : Ğğ

ط : T t

ض : Dd

ع : ‘

ظ : Zz

ث : Şş

ء : ‘

DESTPÊK

1. Armanc û Çarcove

Ziman amûra herî xurt a ragihandinê ye. Gava amûr bi zende be, karê ku pê tê kirin jî zerarê dibîne. Ji bo ragihandineke qenc û durust amûreke tekûz ango zimanekî tekûz pêwîst e. Tekûziya zimên jî bi gramera wê pêkan e. Mijara teza me jî *Tesrîfa Teremaxî* ye. Ev berhem derheqê gramera erebî, kurdî û farisî de ye. Mebesta me bi vê tezê ew e ku em hinek ronahî bidin ser vê berhemê. Nivîskarê berhemê Eliyê Teremaxî bi dorfirehî bidin nasandin. Behsa şert û mercên sosyo- siyasî yên serdema wî bikin. Mij û morana li ser nav, bernav û navê gudê wî rakin. Ciyê ku lê hatiye dinê, dema ku berhema xwe nivîsiye û ciyê ku lê hatiye definkirinê teqez bikin.

Ji bo xebateke bi rêk û pêk sînorên destnîşankirî lazim in. Helbet pîvan û tixûbên vê teza me jî hene. Bi kurtahî çarçoveya vê tezê, *Tesrîfa Teremaxî* û danerê wê ye. Pê ve girêdayî, ji bo ku Eliyê Teremaxî seydayekî medreseyê ye û berhema xwe jî ji bo mubtediyên medreseyan wekî pirtûka dersê amade kiriye, em ê beşa yekem jî medreseyan re veqetînin. Ji karvaniya Eshabê Suffe heta medreseyên Mensûriye, ji medreseyên xanedanên kurdan heta yên mîrekiyên wan û heta roja îro em ê rola medreseyan, pergala wan, ilm û kitêbên di wan de tînin xwendin hilgirin dest.

2. Rêbaz û Çavkanî

Ev berhema ku 400 sed sal berê weke destxet hatiye nivîsîn gramera erebî bi kurdiya kurmancî vedibêje û di heman demê de rêzimana kurdiya kurmancî ye jî. Me

xwest em bidin zanîn ka rasteqîniya nav û bernavê nivîskarê vê berhemê bi çi awayî ye. Teybetmendiyên wê çi ne? Xwedî çi xweseriyên e? Kurdiya kurmancî ya ku di berhemê de hatiye bikaranîn bi kîjan şêwe û devokê ye? Ji aliyê derbirîn, term û têgehan ve rewşa wê çawa ye? Serencama wê bi çi awayî cîriyaye? Şekl û şemala wê bi çi awayî ye? Û hwd. Ji bo ku em bersiva van pirsan bi dest bixin em çûn gundê Eliyê Teremaxî me bi gundî û nevîçîrkên wî re hevdiştin kir, navê wî, navê gundê wî û cîyê lê hatiye defînkirin teqez kirin. Me pirtûk û gotarên derheqê teremaxî de analîz kirin, şaşî, nakokî û kêmasiyên derbarê wî û berhema wî de hatine kirin destnîşan kirin.

Wekî rêbaz, beşa yekem ji medreseyan re hat terxan kirin. Beşa duyem, ji Eliyê Teremaxî û *Tesrîfa* wî re hat veqetandin. Di vê beşê de, Teremaxî û berhema wî hat danasandin. Gumanên li ser wî û berhema wî hatin rakirin. Beşa sêyem, berhemê ji aliyê ziman, rêziman, vegotin û şêwezariyê ve hat dahurandin. Beşa çarem, beyî ku dest di orjînaliya wê bê werdan berhem hat trasnkribebikin û rojanekirin. Sedema rojanekirinê ev bû: zimanê ku berhem pê hatiye nivîsandin heta redeyekê bi kurmanciyeke sehl û rihet be jî, ji aliyê term û têgehên rêzimanî ve gelek hişk û giran e. Da ku nifşa nûgihîştî jê baştir sûdê werbigre ji dêvla ferhengeke pir û berfîreh me rojanekirina wê munasibtir dît. Di berhemê de cîyê ku pêdivî bi lêzêdekirinekê hebe em ê wê di kevaneka koşedar de destnîşan bikin.

Çavkaniyên Sereke

Di vê tezê de me ji gelek çavkaniyan sûd wergirt. Hinek ji wan çavkaniyan ên ku wan jî Eliyê Teremaxî û berhema wî kirine mijara xwe ev in:

1. ***Destûrî Zimanê Erebi Be Kurdî Eliyê Teremaxî Sedey Hevdemî Zayînî:*** (Foto: 1) Marûf Xeznedar.¹ Xeznedar di amadekirina vê berhemê de beyî ku dest tê werde metna orjînal weşandiye. Pêşgotinek, gotareke ku du beşan pêk tê û ferhengogekê lê zêdekiriye. Di pêşgotinê de behsa xebata xwe û hinek şaşiyên derbarê Eliyê Teremaxî û berhema wî de hatine kirin dike. Di beşa yakem a gotarê de dîrokçeya berhemê ji bi destxistina wê heta çapkirinê vedibêje. Di beşa duyem a gotarê de behsa naveroka berhemê dike.

¹ Marûf Xeznedar (Amd.), ***Destûrî Zimanê Erebi Be Kurdî Eliyê Teremaxî Sedey Hevdemî Zayînî***, Daru'z-Zeman, Bexda 1971.

2. Mele Elî Teremaxî Serfa Kurmancî: Zeynelabidîn Zinar.² Zinar *Tesrîfa Teremaxî* ya ku Marûf Xeznedar çap kiribû bi vî navî latînîze kiriye. Bi sernavê Agahdarî wekî pêşgotinekê û ferhengogekê ji bo têgihên erebî û farisî lê zêde kiriye. Kopyeyê çapa marûf Xeznedar jî digel ya xwe weşandiye. Di vê teza xwe de me vê kopyayê bingeh girt. Zinar di pêşgotina xwe de dibêje Marûf Xeznedar ev destnivîs li Bexdayê dîtiye, ew sererast kiriye û çap kiriye. Lêbelê çawa me di ciyê we de ji nîşan kiriye Marûf Xeznedar ev berhem li Lenîngiradê bi dest xistiye û ji bilî xalbendiyê bîyî ku dest tê werde ew çap kiriye.

3. Kîtabu's-Serfî (el-'Erebiyyî) bî'l-Luxetî'l-Kurdiyye li 'Elîyyî Teremaxî (el-Qern 16-17M.): Nairouza Abdulmajid Mahmoud.³ Xwediya vê tezê piştî min dest bi xwendina masterê kiriye û bîyî haya wê ji mijara teza min hebe li ser vê mijarê xebitiye. Ez jî vê dawiyê pê hisiyam. Ji xwe terzê xebata her du tezan û naveroka wan jî ne bi ser hev ve ne. Ev tez bi erebî hatiye amadekirin, ji destpêkek û sê beşan pêk tê. Di destpêkê de berhema Teremaxî hatiye danesandin. Hinek mextûtâtên kurdî hatine destnîşankirin û behsa zimanê kurdî û zaravayên wê hatiye kirin. Beşa yekem ji ji Eliyê Teremaxî re hatiye terxan kirin. Di beşa duyem de berhem, pêşgotina wê ya Mele Mahmûdê Bazîdî hatine weşandin û tercûmeyî erebî hatine kirin. Di beşa sêyem de di bin sernavê Şerha Kîtabê de berhem hatiye îzah kirin.

4. Elî Teremaxî Êkemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e: Reşîd Findî.⁴ Findî di vê berhema xwe de, bi îsbat û delîlan angaştî xwe ya ku kiriye navê berhemê diselmîne û 13 fêsl ango beşên *Tesrîfa Teremaxî* yên derberê gramera kurdiya kurmancî de ne di bin sernavê Rêzimana Elî Teremaxî de weşandiye.

5. “Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê Destûra Zimanê Erebi bi Kurdî Digel Hinde Numûneyêd

² Zeynelabidîn Zinar (Amd), **Mele Elî Teremaxî Sserfa Kurmancî**, Pencînar Weşanxaneya Çanda Kurdî, Stockholm 1997.

³ Nairouza Abdulmajid Mahmoud, "**Kîtabu's-Serfî (el-'Erebiyyî) Bîluxetî'l-Kurdiyyeh Li 'Elîyyî Teremaxî (el-Qern 16-17M.)**", (Yüksek Lisans, Dicle Üniv. Sosyal Bilimler Enst. , Diyarbakır 2015).

⁴ Reşîd Findî, **Eliyê Teremaxî Êkemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e**, el-Mektebetu'l – Weteniyê, Bexdad 1985.

Farisî û Kurdî": Mamoste Qedrî.⁵ Mamoste Qedri, di vê gotara xwe de beşên gramera kurdiya kurmançî ya *Tesrîfa Teremaxî* latînîze û rojane kiriye.

3. Tesrîf, Naverok û Cureyên Wan

3. 1. Serf û Tesrîf

Serf ilmek ji ilmên girîngtir ê zimanê erebî ye. Ilmekî xwedî rêbaz e ku sîxe û rewşa peyvên erebî yên nayên î'rab û bînakirin pê tînen naskirin. Behsa kelmeyê dike ji aliyê "tesrîf" [kişandin û kesandin], "î'lal" [hewandina tîpên illetê], "îdxam" [têkşelîn] û "îbdal" [pevguherîn]ê ve û em bi wê, berî ku di hevokê de cih bigre, ji bo avakirina peyvê çî lazim e wî tiştî hîn dibin. Her wiha serf behsa navên mu'reb û lêkerên ku tînen kişandin dike, behsa navên mebnî, lêkerên nayên kişandin û herfan nake. Dîsa serf, berê beşek ji 'ilmê nehwê bûye. Nehwa ku bi alîkariya wê hal û rewşa peyvên erebî, çî yekjimar çî hevedudanî tînen naskirin.⁶

Tesrîf peyveke erebî ye. Mesderê "serrefe" ye. Tê wateya; îdarekirina tiştêkî yan xerakirin û guherandina wî tiştî bi bal şiklên din ve. Ji aliyê rêzimanî ve, li gorî deman, bi dorê kêşan û vegotina peyvek an lêkerê ye. Li gorî rêbazên serfê veguherîna şiklê raderê ye bi bal peyvîne din ve.⁷ Ango tesrîf binbeşeke ilmê serfê ye. Ji hêla din ve tesrîf di gelek zimanan de navê pirtûkên ilmê serfê ye jî. Ên dibêjin ku "serf" û "tesrîf" du peyvên xwedî heman wateyê ne jî hene.⁸

3. 1. 1. Danerê Serfa Erebi

Li ser kesê yekem ê ku ilmê serfê/tesrîfa erebî bi kar anîye aliman li hev nekirine. Hin dibêjin yekemîn car ê ku ilmê serfê bi kar anîye Mu'az bin Musellem el-Herrâi ye.⁹ Abdurrahman Celaluddîn es-Suyûtî (m. 911H.) jî yek ji van e, Suyûtî dibêje ku ev Mu'az apê Ebu Ca'fer er-Rewasî ye, ê ji Kufiyên ku yekemîn kitêba

⁵ Mamoste Qedrî, "Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê *Destûra Zimanê Erebi bi Kurdî Digel Hinde Numûneyêd Farisî û Kurdî*", **Kovara Lêkolîn û Lêgerînê Bîr**, Diyarbakır 2005, j. 1, r. 192-198.

⁶ el-Şeyx El-Mustafa el-Xelayînî, **Camîu'd-Durûsu'l-Erebîyye**, Daru'l-Kutûb, Beyrût 2007, r. 8.

⁷ Osmalîca-Türkçe Ansiklopedik Büyük Luğat, "Tasrif", Derya Dağıtım A. Ş., İstanbul 1978. r. 1459.

⁸ Muhemmed Muhyeddîn Ebdulhemîd, **Durusu't-Tesrîf**, el-Mektebu'l-Weqfiyye; Muhammed Salîm Muhsîn, **Tesrîfu'l-Ef'alî We'l-Esma**, Musewwîrat Ebdurrahman en-Necdî, el-Mektebu'l-Esriyye, Beyrût 1995, r. 15.

⁹ Mu'az bin Musellem el-Herrâi el-Kûfî (Ebu Muslîm) şaîr e, di nehwê de gelek berhem dane lê belê neketine ber destan: Umer Rida Kehhale, **Mu'cemu'l-Muellifîn**, el-Mektebu'l-Weqfiyye, c.3. Dîmeşq 1957, r. 895.

nehwê ya bi navê *el-Feysel* nivîsiye.¹⁰ Hin dibêjin Îmam Elî bin Ebî Talîb¹¹ (m. 40H.) e ku yekem car serfa erebî bi kar aniye.¹² Ê ku yekem car berhemeke musteqîl a ilmê “tesrîf”ê nivîsiye Ebu Usman el-Mazinî (m.248 H.) ye.¹³

3. 1. 2. Mijarên Naveroka Tesrîfan

Naveroka tesrîfan hema bêje bi piranî li gorî mijarên Izzîyê¹⁴ hatine lêkirin, kêma zêde gişt wekî hev in. Bi giştî bi peyva “î’lem” (tu bizan)ê dest pê dikin bi pênasîya “tesrîf”ê didomînin û şîroveya van mijaran û ya binbeşên wan dikin: Fê’l (kirde), Îsmu’l-Fa’îl (kirdenav), Îsmu’l-Mef’ûl (bireser), Mesder (Rader), Emîr (ferman), Îsmu’z-Zeman (hokera demî), Îsmu’l-Mekan (hokera cih), Îsmu’l-Alet (navê alavan), Tenbîh (hêşyarî)...

3. 1. 3. Tesrîf, Haşîye û Wergerên wê di Zimanên Cûrbecûr de

Digel ku tesrîf derbarê serfa erebî de ne jî bi gelek zimanan hatine nivîsandin. Mebest jê çavnasî û bi awayekî hêsan, fêkirina zimanê erebî ye. Daxwaza fêrbûna zimanê erebî jî berê pêşî ji bo fêrbûna *Qur’ana Pîroz*, baş têgihiştina hedîsên şerîf û ilmên dînî yên Îslamî ne. Hêjayê gotinê ye ku kurdan tesrîfên erebî jî nivîsîne. Çend nimûne ji tesrîfên erebî, tirkî û kurdî:

3. 1. 3. 1. Hinek Tesrîfên Erebi

3. 1. 3. 1. 1. *Izzî*: Izzuddîn ez-Zencanî.¹⁵

3. 1. 3. 1. 2. *Seyyid Ele’l-Izzî*: es-Seyyid eş-Şerîf el-Curcanî.¹⁶

¹⁰ Ebdurrahman Celalu’d-dîn es-Suyûtî, *el-Muzhîr Fî Ulûmu’l-Luxetî we Enwa’ha*, şerh û tewzîh: Muhammed Ehmed Cadu’l-Mewlabîk, Elî Muhammed er-Recawî, Muhemmed Ebu’l-Fedîl Îbrahîm, Daru’t-Turas, Qahire 2008, r. 400.

¹¹ Elî bin Ebî Talîb bin Ebdulmuttalîb el-Qureyşî el-Haşîmî Ebu’l-Hesen, ji xelîfeyên raşîd ê çaran e û ji eşereyên mubeşşere ye, di sala çil ê hicretê de bi şehîdî wefat kiriye; Şehabbuddîn Ebdurrahman bin Îsmâîl bin Îbrahîm, *Kîtabu’l-Murşîdu’l-Wecîz*, Darsadir, Beyrûd 1975, r. 41.

¹² Muhammed Salîm Muhsîn, h.b. , r. 14,15.

¹³ Umer Rida Kehhale, h.b. c. 1, r. 443.

¹⁴ Mahmûd Hesen et-Tûnikî, *Mu’cemu’l-Musennifîn*, Dimeşq 1957, r. 229-230.

eş-Şeyx el-Elametu’s-Serfî en-Nehwî Izzuddîn Ebu’l-Fedaîl Îbrahîm Îbn Ebdulwehhab bin Îmaduddîn Îbrahîm ez-Zencanî (m.655H). Xwediyê *Tesrîfa Izzîyê* ye. Ebdullah Muhemmed el-Hebeşî di pirtûka xwe ya bi navê *Camîu’s-Şurûhî We’l-Hewaşî* de bi nav û nîşan behsa 41 şerh, 17 haşîye, 5 haşîyeyên haşîyeyan û 5 metnên binezm ên Izzîyê dike.

¹⁵ H. b.

¹⁶ es-Seyyid eş-Şerîf el-Curcanî, *Seyyid Ele’l-Izzî*, Hacı Hüseyin Efendi Metbeesi, 1311 H.

3. 1. 3. 1. 3. *Tesrîfu'l-Ellame Elî bin eş-Şeyx Hamîd el-Eşnewî*: Elî bin eş-Şeyx Hamîd el-Eşnewî.¹⁷

3. 1. 3. 1. 4. *Tedricu'l-Edanî*: Se'duddîn et-Teftezanî.¹⁸

3. 1. 3. 1. 5. *e't-Tesrîf Fî Ilmî't-Tesrîf*: Mele Fexredîn.¹⁹

3. 1. 3. 1. 6. *Mecmu'etu's-Sarf*: M. Said Yıldırım.²⁰

3. 1. 3. 1. 7. *Mecmu'etu's-Sarf*: Amd. Mehmet Talu.²¹

3. 1. 3. 1. 8. *Durusu't-Tesrîf*: Muhammed Muhyeddîn Ebdulhemîd.²²

3. 1. 3. 1. 9. *el-Qewaîdu'l-Esasiyye Fî'n-Nehwî We's-Sarf*: Yûsuf el-Hemmadî, Muhammed Muhammed eş-Şennawî, Muhammed Şefîq Eta.²³

3. 1. 3. 1. 10. *et-Tesrîfu'l-Mulûkî*: İbnî Cinnî.²⁴

3. 1. 3. 1. 11. *Tesrîfu'l-Ef'al We'l-Esma'*: Muhammed Salîm Muhsîn.²⁵

3. 1. 3. 1. 12. *el- Umûd*: Ebdulqahir el-Curcanî.²⁶

3. 1. 3 . 2. Hinek Tesrîfên Tirkî

3. 1. 3 . 2. 1. *el-Muşezzeb*: Mehmed Zihni.²⁷

¹⁷ Elî bin eş-Şeyx Hamîd el-Eşnewî, *Tesrîfu'l-Ellame Elî bineş-Şeyx Hamîd el-Eşnewî*, Misir 1384H. Ev pirtûk sê şerhên li ser hev in: Ev Tesrîf şerha İzziya Zencanî ye. Elî el-Qizilcî ev tesrîf şerh kiriye. İcar Umer bin Muhammed Emîn bin el-Qeredaxî jî şerha Elî Qizilcî şerh kiriye.

¹⁸ Se'duddîn et-Teftezanî, *Tedricu'l-Edanî İla Qîraetî Şerhu'l-Se'dî Ela Tesrîfî'z-Zencanî*, Dar İhyau'l-Kîtabu'l-Erebiye, Misir 1348H.

¹⁹ Fexruddîn bin e's-Seyyid Mela Ebdullah el-Ernasî summe el-Batmanî, *e't-Tesrîf Fî Ilmî't-Tesrîf*, 1384 H., li ku hatiye çapkirin ne diyar e.

²⁰ M. Said Yıldırım (Amd.), *Mecmu'etu's-Sarf (Emsîle, Bîna, Meqsûd, Tasrîf)*, Beka Yayınları, İstanbul 2006.

²¹ Mehmet Talu (Ed.), *Mecmu'etu's-Sarf (Emsîle, Bîna Fî's-Sarf, Meqsûd Fî's-Sarf, İzzî Fî's-Sarf)*, Yasin Yayınevi, İstanbul 2013.

²² Muhammed Muhyeddîn Ebdulhemîd, *Durusu't-Tesrîf*, el-Mektebu'l-Esriyye, Beyrût 1995.

²³ Yûsuf el-Hemmadî, Muhammed Muhammed eş-Şennawî, Muhammed Şefîq Eta, *El-Qewaîdu'l-Esasiyye Fî'n-Nehwî We's-Sarf*, el-Mektebu'l-Emîriyye, Qahîre 1994.

²⁴ Ebu'l-Feth 'Usman bin Ebdullah İbnî Cinnî en-Nehwî, *et-Tesrîfu'l-Mulûkî*, Misir 1913.

²⁵ Muhammed Salîm Muhsîn, *Tesrîfu'l-Ef'al We'l-Esma' Fî Dew'î Esalîbî'l-Qur'an*, Mesûrat Ebdurrahman en-Necdî, Daru'l-Kîtabu'l-Erebî, Beyrût 1987.

²⁶ el-Bedrawî Zehran (Ed.), *Ebû Bekir Ebdulqahir bin Ebdurrahman el-Curcanî el-'Umûdû Kîtabun Fî't-Tesrîfî*, Multeqa ehlu'l-Luxe, Daru'l-Me'arif, Qahîre 1995.

²⁷ Mehmet Zihni, *el-Muşezzeb yahut el-Murtabû Fî Serfî We Nehwî Lîsani'l-Ereb*, İstanbul 1980.

3. 1. 3 . 2. 2. *Tesrîfu'l-Ef'alî We'l-Esmâî'l-Erebiyye*: Ahmet Meral.²⁸

3. 1. 3. 2. 3. *Türkçe Sarf ve Nahiv Eski Lisan-î Osmanî Sarf ve Nahiv*: Ahmet Cevat Emre.²⁹

3. 1. 3. 2. 4. *Açıklamalı Emsile Bina Maksud Metin ve Tercemesi*: Arif Erkan.³⁰

3. 1. 3. 2. 5. *Açıklamalı Izzi Metin ve Tercümesi*: Nurettin Turgay.³¹

3. 1. 3. 2. 6. *Arapça Fiil Çekimi ve Sarf Bilgisi*: M. Sadi Çöğenli.³²

3. 1. 3. 3. *Hinek Tesrîfên Kurdî*

3. 1. 3. 3. 1. *Muxteser Serf û Nehwî Kurdî*: Se'îd Sidqî Kaban.³³

3. 1. 3. 3. 2. *Tuhfetu'l-Xillan Fi Zimanî Kurdan*: Mela Mahmûdê Bazîdî.³⁴

3. 1. 3. 3. 3. *Qewaîdî Lisanî Kurdî*: Omer Ewnî.³⁵

3. 1. 3. 3. 4. *Tesrîfa Kurdî*: Îmaduddîn Reşpojan.³⁶

3. 1. 3. 3. 5. *Rîsala Hella Sîxê Tesrîfa Izziyê*: Sadullah Fetlewî.³⁷

3. 1. 3. 3. 6. *Neclu Ehmedîn*: Metîn (?).³⁸

²⁸ Ahmet Meral, *Tesrîfu'l-Ef'alî We'l-Esmâî'l-Erebiyyeh*, Yasîn Yayinevî, İstanbul 2013.

²⁹ Ahmet Cevat Emre, *Türkçe Sarf ve Nahiv Eski Lisan-î Osmanî Sarf ve Nahiv*, TDK Yayınları, Ankara 2004.

³⁰ Arif Erkan, *Açıklamalı Emsile Bina Maksud Metin ve Tercemesi Arapça Kelime Bilgisi Sarf 1*, Sağlam Yayınevi, İstanbul 1981.

³¹ Nurettin Turgay, *Açıklamalı Izzi Metin ve Tercümesi*, Sağlam Yayınevi, İstanbul 1986.

³² M. Sadi Çöğenli, *Arapça Fiil Çekimi ve Sarf Bilgisi*, Erzurum Kültür-eğitim Vakfı Yayınları, Erzurum 1997.

³³ Mela Seîd Kaban Sidqî *Muxteser Serf û Nehwî Kurdî*, Çapxaneyê Necah, Bexda, 1928. Kesê yekem ê Kurd e ku ji bo Diyalekta Kurdiya Navendî [Sorani] kitêba rêziman nivîsandiye.

³⁴ Jan Dost (Amd.), *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, Nûbihar, İstanbul 2012.

³⁵ Mesut Arslan, “*Di Dewra Osmaniyan de Weşangeriya Kitêbên Kurdî (1848-1923)*”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn 2014), r. 99.

³⁶ Îmaduddîn Reşpojan, *Tesrîfa Kurdî Gulzara Zarokên Kurdan*, Mektebu Diyarbekir, Diyarbekir, 2013. Ev berhem digel ku piraniya mijarên Izziyê di hundirîne jî ne şerha wê ye. Di sala 1965an de hatiye nivîsandin. Ebduselam Bêcirmanî ew amade û tertîb kiriye.

³⁷ Sadullah lawê Hac Mehmûd lawê Ebulah ji gundê Fetla Jor qeza Bismil bajarê Amed, *Rîsala Hella Sîxê Tesrîfa Izziyê*. Ev berhem di sala 2002yê de hatiye nivîsandin. Ji şîrove û kişandina sîxeyên Izziyê pêk tê. Destxet e, 187 rûpel in.

³⁸ Metîn, Neclu Ehmedîn. Berhem serfa Erebi bi Kurdî dibêje. Ne şerha Izziyê ye. Destxet e. Ji du beşan pêk tê; beşa serfê (40 rûpel), beşa zerfê (16) rûpel e. Musennif navê *Neclu Ehmedîn* [Kurê Ehmed] li berhemê kiriye. Navekî din ne xuya ye. Lê li binê şê'r û qesîdeyeke ku tê de ne Metîn hatiye nivîsandin. Li çiyekê destpêk 2005 meha 12, xelasî: 2006 meha 9an dinivîse. Navê Metîn û ev dîrok aidê nivîskar in an ên mustensîx in ne diyar in. Fotokopiya vê destxetê li ba min e.

3. 1. 3. 3. 7. *el-Mecmû'ê-tu'l-Menhecîyetu Ew Tesrîfu't-Teremaxî Fî 'İlmî's-Serfî:*
Amadekarê wê, Muhemmed Nezîr ez-Zaza ye.³⁹ Amadekarê vê berhevokê metnê *Tesrîfa İzzîyê û Şerha Tesrîfa İzzîyê* ya Teremaxî (?) û metnê *Bînayê û Şerha Bînayê* ya *Kefewî* û metnê *Emsîleya Muxtelîf e û Şerha Emsîleya Muxtelîfe el- Emsîletu'l-Muxtelîfetu'l-Mutterîde* ya *Kefewî* û *Kîtabu'l-Herekatê* di vê berhemê de civandiye. Berhevkar, li gorî xwe di gelek ciyan de sererastkirin û şîrove kirine, em ê li ser wan nesekinin. Ya ku bi wesîleya teza me, me eleqedar dike ew e ku M. Nezîr Zaza jê re gotiye “*Şerha Tesrîfa İzzîyê ya Teremaxî*” û ew wekî “*Tesrîfa Teremaxî*” bi nav kiriye. Ev agahdariyeke ne bi serê xwe ye, lewre li gorî delîlên di dest de ev berhem ne ya Teremaxî ye:

1. Muhemmed Nezîr Zaza navê *el-Mecmû'ê-tu'l-Menhecîyetu Ew Tesrîfu'l-Teremaxî Fî İlmî's-Serfî* li berhema berhevokî kiriye. Ev metna Zaza jê re gotiye *Tesrîfa Teremaxî* hin nusxeyên wê yên destxetî li ba me jî hene, ew ne serf an *Tesrîfa Teremaxî* ye, ew e ku Marûf Xeznedar li Petersburgê bi dest xistiye û di sala 1957ê de li Bexdayê çap kiriye, ew *Tesrîfa Kurmancî* ye ya ku di medreseyan Kurdistanê de berbelav e û bihtir ya Helqetînî tê naskirin.

2. Zaza di pêşgotina berhemê de dibêje: Ev “Serf”a Mewlana Mela Eliyê Teremaxî şerha *Tesrîfa Zencanî* ye, ya ku bi navê *İzzîyê meşhûr e* digel hinek rêbazên îlalê bi zimanê kurdî.⁴⁰ Rast e ku ev berhema navborî şerha *Tesrîfa İzzîya Zencanî* ye, lê şubhe û guman derbarê nivîskarê wê de ye; lewre berî Zaza -bi qasî ku em dizanin- kesî negotiye ev berhem ya Teremaxî ye. Jixwe çavkaniya ku Zaza jînenîgariya Eliyê Teremaxî jê wergirtiye pêşgotina Mela Mahmûdê Bazîdî ye, ya ku ji bo *Tesrîfa Teremaxî* nivîsiye. Bazîdî di wê pêşgotinê de ji bîlî *Tesrîfa Teremaxî* behsa *Tesrîfa Helqetînî* jî dike.⁴¹ Li gorî qeneeta me jî ya ku Zaza jê re gotiye *Şerha Teremaxî* ew *Şerha Helqetînî* ye. Di ciyê wî de em ê li ser her du tasrîfan jî bi dorfirehî rawestin.

³⁹ Muhemmed Nezîr ez-Zaza (Ed.), *el-Mecmû'ê-tu'l-Menhecîyetu Ew Tesrîfu'l-Teremaxî Fî 'İlmî's-Serfî*, Mektebetu'z-Zengîyye-Mektebetu'l-Mînhac, Diyarbekir 2014.

⁴⁰ H.b. , r. 5-6.

⁴¹ Xeznedar, r. 27.

3. 1. 3. 3. 8. *Tesrîfa Kurmancî*: Mele Yûnisê Helqetînî⁴² Ev berhem şerha *Izziya Zencanî* ye. Bi zaravayê kurmancî ye. Ji aliyê ehlê medreseyan ve wekî *Tesrîf* an jî *Tesrîfa Kurmancî* tê binavkirin. Li ser hinek destxetan wekî *Tesrîfa Kurdî* jî tê dîtin. Heta vêga bi tîpên latînî nehatiye çapkirin. Ez di vê xebatê de rastî berhemekê nehatim ku navê musennif li serî hebe. Bihtir navê mustensîxan û dîroka tensîxê heye. Gelek nusxeyên destxetî yên vê berhemê hene, lewma hewceyî xebateke edîsyon-krîtîkî û latînîzekirinê ye.

Delîl û nîşaneyên ku ev Tesrîf şerha Mele Yûnisê Helqetînî ye:

1. Mele Mahmûdê Bazîdî di pêşgotina *Tesrîfa Teremaxî* de gava behsa pirtûkên ku ji aliyê feqîyan ve tên xwendin dike, dibêje: "...îcarê îbaretê *Tesrîf* û *Zurûf* û *Terkîba* Mela Yûnisê Helqetînî dixwînin."⁴³ Wekî tê zanîn *Terkîb* û *Zurûf* ne berhemên Helqetînî ne, Helqetînî ew bi kurmancî şerh û şîrove kirine. Îhtîmaleke zêde ye ku Helqetînî her wiha *Izzî* jî şerh û şîrove kiribe.

2. Herekol Azîzan [Mîr Celadet Alî Bedîrxan] dibêje ku vî melayî (Mela Ênisê Erqetînî) daye pey Elî Teremaxî û kitêbên *Tesrîf*, *Zurûf* û *Terkîbê* bi zimanê kurdmancî nivîsandine, min ne eserên Elî ne jî yên Ênis dîtine; ji lew re min nekarîbû ez hin tiştan ji wan belav bikim.⁴⁴

3. Mînorskî di Îslam Ansiklopedisi [Ansîklopediya Îslamê] xala "kurd"an de dibêje: Li gorî Jaba Mela Yûnusê Helqetînî xwediyê *Tesrîf*, *Zurûf* û *Terkîba* kurdî ye.⁴⁵

4. Mihemed Merdoxî Kurdistanî di Mejûyî Merdoxî de dibêje, Mele Yûnisê Helqetînî di sedê diwazdemîn ê koçî de miriye û xwediyê sê pirtûkên ilmê serfê yên bi zimanê kurdî (kurmancî) ne: *Tesrîf*, *Zirûf* û *Terkîb*.⁴⁶

5. Bileç Şêrko (Sureyya Bedîrxan) di pirtûka xwe ya bi navê *el-Qediyetu'l-Kurdiyye Madî'l-Kurdî We Hazîrûhûm* de dibêje ku Mela Yûnus el-Halqetînî

⁴² Mele Yûnisê Helqetînî, *Tesrîfa Kurmancî* Destxeta Mele Mihemedê Hirorişî.

⁴³ Xeznedar, r. 27.

⁴⁴ Herekol Azîzan, "Klasîkên Me", *Hawar*, c. 2, r. 6.

⁴⁵ Minorski, "Kürtler" *İslam Ansiklopedisi*, MEB, İstanbul 1955, c. 6. r. 1114.

⁴⁶ Xeznedar, r. 27.

xwedyê sê pirtûkên hîndekariya zimanê erebî ye: *Tesrîf, Zurûf û Terkîb* ku li Kurdistanê meşhûr in.⁴⁷

3. 1. 3. 3. 9. *Tesrîfa Teremaxî*: Eliyê Teremaxî. *Tesrîfa* ku mijara teza me ye. Bi gotina Mele Mahmûdê Bazîdî berhema “mûcîdê şerfê”⁴⁸ Eliyê Teremaxî ye. A ku li Hekarî li ba meleyekî hatiye dîtin û Mele Mahmûdê Bazîdî li Erzerûmê rûnûs kiriye û Aleksandir Jaba ew şandiye Petersburgê Zankoya Rojhilatnasiyê. Îcar Marûf Xeznedar ew ji wir girtiye û di sala 1957an de li Bexdayê çap kiriye. Xeznedar ji bilî metnê *Tesrîfê* pêşgotina Bazîdî, pêşgotineke xwe û du gotarên lêkolînî ku ji 22 rûpelan pêk tên xistine ber pirtûkê. Xeznedar di van gotaran de behsa nameyên Jaba û Akedemî Dorn⁴⁹ ên derbarê berhemê û guftugoyên derheqê navê Eliyê Teremaxî û berhama wî dike. Her wiha Xeznedar, ferhengogêke kurmancî-soranî ya berhemê xistiye dawîya berhemê û hinek têbînî xistine binê metnên pêşgotina Bazîdî û metnê *Tesrîfa Teremaxî*.

⁴⁷ Bileç Şêrko, *el-Qediyetu'l-Kurdiyye Madî'l-Kurdî We Hazîrûhûm*, Daru'l- Aras, Erbil 2011. r. 45.

⁴⁸ Xeznedar, r. 25.

⁴⁹ Lerînhardet Dorin (1805-1881), rojhilatnasekî Elman e, li Rûsya karê dersdêriyê dikir û mesûlê namexaneyê Rojhilatî ya Akedemiyê bûye li Petersburg (Lenîngrad). Gelek lêkolînên wî yên derbarê dîroka rojhilat û destnivîsên miletê misilman hene. Di xwendinê de gihîştibû asta ew çend bilind heta ku leqeba “Ekademî” wergirtibû. Xeznedar, r. 8.

BEŞA YEKEM

MEDRESE û DÎROKÇEYA WAN

1. Kevneşopiya Medreseyan û Medreseyên Bakurê Kurdistanê

Peyva “medrese” ji radera “derese” [xwendin]ê tê, hokera cih e, bi wateya ciyê ku lê tê xwendin e.⁵⁰ Li nav kurdan bi piranî ji dêvla peyva medreseyê ve peyva “hicre” yan “hucre” tê bikaranîn. Digel wî em dibînin ji wan ciyan re ku feqî lê pir in xasma peyva “medrese” dibêjin. Ji ciyên ku feqî lê hindik in, an ji ode û xaniyên ku feqî lê dijîn re jî “hicre” dibêjin.

Kevneşopiya medreseyan digihîje destpêka Îslamiyetê. Serê pêşî mizgeft û camiyan wezîfeya medreseyan pêk tanîn. Mirov dikare bêje yê ku ev kevneşopî daye destpêkirin Hz. Muhemmed (a.s.w.) bi xwe ye. Li mizgefta Medîneyê sehabî mijarên dînî û dinyayî ji Pêxemberê me fêr dibûn. Ev yek bû adet û kemilî. Piştî heyamekê digel zanîstên olî yê pozîtîf jî li van mizgeft û camiyan hatin xwendinê, heta ku cih li van deran teng bû, îcarê ciyên musteqîl ên xwendinê li derdora wan ava kirin, tehsîla ilmê di wan de pêk hat. Jixwe piratîka *Eshabê Suffeyê* hebû: Ew ciyê Hz. Muhammed (a.s.w.) li eywana *Mizgefta Medîneyê* dabû avakirin, feqîr û bêkes lê diman û ders û talîma Îslamê ji Hz. Pêxember werdigirtin. Gava pêdivî çêdibû wekî dersdêr diçûn cih û welatên din mamostetî dikirin.⁵¹ Medreseyên Kurdistanê jî hema bêje prototîpên kemilî yê *Suffeyê* ne.

⁵⁰ Lîsanu'l- Ereb Lî Îbnî Munzir, “Medrese”, Daru'l-Me'arif, Qahîre 1119H.

⁵¹ Sabri Hizmetli, *İslam Tarihi (Başlangıçtan İlk Dört Halife Sonuna Kadar)*, Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, Ankara 1991, r. 149-150.

Bi belavbûna Îslamê re kevneşopiya tehsîla ilm jî li nav welatên Misilman belav bû. Mizgeftan digel îbadetxanehiyê erka xwe ya ilmgehiyê jî pêk tanîn, ev yek heta serdema Fatimiyan ajot. Piştî wî ji bilî Endulûsê hema bêje li hemû erdnîgariya Misilmanan mizgeftan ev wezîfeya xwe dewrî medreseyan kir. Ji xwe ev erdnîgarî berê jî xwedî kêşwera ilm û marîfet û medreseyan bûn. Wekî niha li Împeretoriya Farsê *Medreseya Cund-î Şapûr*, li Misrê *Medreseya Helenî Îskenderiye* û li Sûriyeyê *Medreseya Antaqya* yên meşhûr hebûn. Demek piştî wê gava li Qahîreyê *Daru'l-Ilmên* bi feraseta Şî'îtiyê hatin avakirin wekî bertekî medreyên Sunniyan jî ava bûn. Bi xurtbûna mezhebên Henefî û Şafî'îtiyê li Rojhilat gelek medreyên navdar deng vedan.⁵² Ebdulqadir bin Muhammed en-Ne'îmî ed-Dîmeşqî (m.978 H.) nav û wesfê 60 medreyên Şafî'î, 54ên Henefî, 11ên Henbelî û 4ên Malikî dide.⁵³

Derheqê avakirina saziya yekemîn, a bi navê “medrese”yê de nelihevkirinek heye. Dîroknaşên Îslamê bi piranî bibêjin yekemîn medreseya Îslamê, *Medreseya Nîzamiyeyê* ye jî, tê zanîn ku berî ev medereze ava bibe gelek medrese hebûne. Lê belê mirov dikare bibêje sedema ku *Medreseya Nîzamiyeyê* yekemîn saziya kevneşopî a dîroka ilmê Îslamê tê hesibandîn, bi awayekî giştî sazûmanîya wê ye, û hebûna weqfên wê yên ji bo debara muderris û xwendevanan e. Hinek ji medreyên Îslamê yên ewil hatine avakirin ev in:

1. Medreseya Ebu'l-Welîd Hesên bin Muhemmedê Emewî ya di 349/960î de li Nîşabûrê ava kiriye,
2. Medreseya Îbn Hîbban Teymî berî sala 354/965an li Nîşabûrê ava kiriye,
3. Medreseya es-Se'îdiye ya berî sala 402/1011han li Nîşabûrê hatiye avakirin,
4. Medreseya Ebu Osman Sabûnî ya berî sala 405/1014han li Nîşabûrê hatiye avakirin,
5. Medreseya Îbn Farûq a berî sala 405/1015han hatiye avakirin,

⁵² Epözdemir, r. 8-9.

⁵³ Ebdulqadîr bin Muhammed en-Ne'îmî ed-Dîmeşqî, ed-Daris fî Tarîxî'l-Medaris, Daru'l-Kitabu'l-Ilmiyye, Beyrût 1990. r. 96-372.

6. Medreseya Îbn Xedîret Esedî ya di sala 450/1058an de li Buşîhê hatiye avakirin.⁵⁴

Piştî *Medreseyên Nîzamiyeyê* avakirina medreseyan hê bihtir bi rêk û pêk bû. Ji bo ku mijar ji heddê xwe neborîne em bi giştî nadin dûv medreseyên serdema Ebbasî, Selçûqî û Osmaniyan.

1. 1. Medrese di Desthilatdarî û Xanedanên Kurdan de

Heta niha li ser medreseyên Kurdistanê yê serdema desthilatdarî, xanedan û mîrnişînên kurdan de, hinek xebatên ciddî û akademîkî hebin jî ne bes in. Pêdivî ye, demek berî dema din ev mijar bibe babeta tezên akademîkî yê berfirehtir. Di vî warî de xebatên hatine kirin hinek ji wan ev in:

1. *Xwendina Medresê*: Zeynelabidîn Zinar, 1993.
2. *Medrese ji Her Aliyê ve Medreseyên Me*: Mele Birhanê Tarînî, Weşanên Şîn, Ankara 2011.
3. *Medreseyên Kurdistanê di Dewra Mîran û Neqşebendîyan de*: Şakir Epözdemir, Weşanên Nûbihar, İstanbul 2015.
4. *Şark Medreselerinin Serencami*: Halîl Çiçek, Beyan Yayınları, İstanbul 2009.
5. "Medreseden Okula Osmanlı-Cuhuriyet Modernleşmesi":Serdar Şengül, *Modern Türkiyede Siyasi Düşünce*, Ömer Laçiner (Haz.), İletişim Yayınları, İstanbul 2008, Cilt 9. s. 634-650.
6. *Medreseler Geleneği Ve Modernleşme Sürecinde Medreseler*, Uluslararası Sempozyum, Fikret Gedikli (Ed.) Muş Alparslan Üniversitesi Yayınları, Muş 2013.
7. Bingöl Üniversitesi "Uluslararası Medrese ve İlahiyat Kavşağında İslami İlimler Sempozyumu", (29Haziran-1Temmuz 2012).
8. "Xwendin û Feqîfî": Emîn Narozi, Kovara Bîrnebûn, h.18, 2002.
9. "Ji Destpêkê Heta Îro Medreseyên Kurdî": Mela Abdulla Tellî, Kovara Nûbihar, h.63/64, İstanbul 1998.

⁵⁴ Ahmed Ulusoy, *Kuruluşundan 17. Yüzyıla Kadar Osmanlı Medreselerinde Eğitim-Öğretim Faaliyetleri*, (Yüksek Lisans Tezi, Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İlköğretim Ana Bilim Dalı Sosyal Bilimler Öğretmenliği Bilim Dalı, Konya 2007), r. 8.

Desthilatdarî û xanedanên kurdan jî ji kar û barên tehsîla ilm û avedaniya medreseyan li paş nemane. Mihemed Emîn Narozi di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê *Medreseyên Kurdistanê di Dewra Mîran û Neqşebendiyan de* van agahiyan dide:

Di serdema Hezbaniyan de li Meraxeyê ji bo dersdarên weke Ebdu-l-Baqî ibn Yûsuf ibn Elîel-Meraxî ku li Hemedanê jî miftî û miderisî kiribû, medrese hatibû vekirin. Herwiha mirov dibîne ku di dema Hezbaniyan de li Erbilê jî ji bo debara feqîyan weqîf hatine saz kirin û gelek zanayên weke Qazî Ebû Suleyman Dawidê kurê Mihemedê kurê Hesenê Xalidiyê Erbilî (1099-1177), Mihemedê kurê Ebû Tahîrê kurê Mihemedê kurê Umerê Hezbanî (m. 1217) û gelekî din di nav desthilatdariya wan de dersdarî kiriye. Çi li Salmasê, çi çawa me got li Erbil û Meraxeyê, çi li Ormiye û Tebrîzê û hinek deverên Azerbeycanê yê din be, di dema Hezbaniyan de ji gelek hêlan ve di warê hedîs û fiqh, tesewîf û felsefe, edeb û şîrê de, di hisab, feraîz hendeseyê de û di felekiyatê de perwerde hatiye dayîn û zana û ustad hatine gihandin. Her bi vî awayî di nav Şeddadî û Rewadiyan de jî gava li nav van deverên navbihurî desthilatdariya wan li ser heng û penga xwe bûye ev girîngiya meyla ser xwendin û zanîn û perwerdeyê domandîye û zana şairê mezin Qetranê xwediyê *Kabûsnameyê* jî ku bi helbestkî gelek agahdariyên heja li ser van herdu xanedaniyan jî me re hiştine, yek ji yê wê serdemê bûye. Çawa ku li der û dorên Şehrezor, Hulwan, Samîxan ku di pêlekê de navendên desthilatdariya Eneziyan (990-1117) bûne, xwendin û perwerde her li wan deran li kar bûye û bi teybetî jî Şehrezor digel dilbijîn û destêwerdana gelek desthilatdaran jî diwa weke navendeke xwendin û zanînê, xwe derxistiye pêş. Jixwe weke ku tê gotin Nasiruddîn Bedîrê Hesnewî jî gelek qîmet daye perwerde û zanîstê û çawa em dibînin li navendên Dewleta Hesnewîyan (941-1050) yê weke Sirmac, Hemedan, Nihawend û Dînawerê jî zanayên weke Ebû Henîfe Dînawerî û yê din derketine. Diwa kê m zêde her di vê serdema xanedaniyên kurdan a xweş û pêşkeftî de em li cem Ebû Caferê Dasînî jî zana û şairê mezin Baba Rafî'ê Hemedanî (m. 839) û li cem Mensûr Babek jî zanayê mezin Ebdusemed Babek (m. 972) dibînin. Jiwe di dema Dewleta Dostikî/Merwaniyan (950-1096) de û bi teybetî jî di wextê fermanrewayîya Nesr el-Dewle Ehmed ibn Merwan de payeya perwerde û medreseyan û girîngiya her cure babetên xwendin û zanîstê gihabû radeyeke bilind. Weke tê zanîn gelek şairên mezin çûne cem, li ser wî nivîsîne û pesnê wî dane, herwiha gelek zana û zahid jî li cem wî kom bûne. Weke nimûne ji bilî zanîna dînî û edebî perwerdeya zanîstên bijîşkî (beşek ji nexweşxaneyê Meyafariqînê medreseya tîbê bûye), endazyarî/pîvankarî, ziman û felsefe, dîrok û cografya/erdnîgarî, astronomî/stêrknasî û cureyên cihê yê mîmarî/avahîsazî, xetnasî/xetkêşî, kitêbxane, nîgarkêşî û wênekêşî, dataşîn û bertiraşî, geçkolî û hilkolîyê, pîr li pêş bûye.⁵⁵

⁵⁵ Epözdemir, r. 10-11.

Desthilatdariya Eyyûbiyan girîngiyeke taybet dida medreseyan. Ji ber ku medrese cih û warên kemilîna bîrdoziya sunnîtiyê bûn Selahaddînê Eyyûbî û xelîfeyên wî ji bo vejandina sunnîtiyê û hakîmiyeta wê pêk bînin di serî de li Misrê û welatên di bin desthilatdariya wan de bûn medrese didan avakirin. Li Misrê medreseyan ku berî Selahaddînê Eyyûbî hêjmara wan sisê bûn di encamê de, ji van medreseyan li Şamê 75, li Qudsê 42, li Bexdayê 40, li Helebê 40, li Trablûsê 13, li Mûsilê 9 û li Misrê 74 heb hatibûn avakirin. Di sala 1169an de li Qahîreyê ji aliyê Sultan Selaheddîn ve pênc medrese hatin avakirin, û piştî wî jî, ji aliyê malbata wî ve 26 heb medreseyan din li van hatin zêdekirin.

Di vê serdemê de gelek medreseyan meşhûr hatine avakirin, hinek ji wan medreseyan ev in:

1. **el-Medresetu'n-Nasiriyetu'l-Ûla**, muderrisekî wê: Ebu'l-Abbas Ahmed b. el-Muzaffer Îbnî'l-Huseynî ed-Dîmaşqî (m. 1195M.) ye.
2. **el-Medresetu'l-Kutbiyye**, muderrisekî wê: el-Faqîh el-Îmam Ebu'l-Feth Nasr b. Muhammed b. Muqallîd el-Quda'î eş-Şezerî eş-Şafi'î (m. 1201M.) ye.
3. **Medresetu Îbnî'l-Ersûfi**, muderrisekî wê: Afifuddîn Ebu Muhammed Abdullah b. Muhammed b. Abdullah b. Hîbetullah el-Ersûfi eş-Şafi'î (m.1197M.) ye.
4. **Medresetu'l-Meşhedu'l-Huseynî**, muderrisekî wê: Şeyhu'ş-Şuyûx Sedru'd-Dîn Muhammed b. Omer b.Hameviyye el-Cuveynî (m. 1219M.) ye.
5. **el-Medrestu's-Seyfiyye**, muderrisekî wê: Îmaduddîn Ebu Amr Osman el-Kurdî eş-Şafi'î (m. 1223M.) ye.

Dîsa gelek alim, zana û muderrisen mîna Şîhabu'd-Dîn Muhammed b. Îbrahîm el-Hamevî (m. 1218) yê ku wekî Îbnu'l-Camûs tê naskirin, Ebu't-Tahîr Îsmâîl b. Tahîr b. el-Huseynî (m. 1229M.) yê ku wekî Îbnu'l-Mawerdî tê naskirin, Ebu'l-Fedaîl Lokman b. Hasan b. Behram b. Bedîl (m.1240M.), Ebu'l-Berekat Hebbehullah b. Abdîlmuhîsin b. Alî b. Sa'leb b. Ahmed el-Ensarî el-Malikî

(m.1193M.), Ahmed b. Alî b. Muhammed el-Esqalanî (m.1238M.) û hwd. ji van medreseyan guhîştine an jî li wan dersdêriyê kirine.⁵⁶

Di dema mîrekiyên kurdan de jî pûtepêdana medrese û hicreyan berdewam kiriye, nexasim piştî *Peymana Amasyayê* ya di sala 1514yan a bi serpereştiya Idrîsê Bedlîsî ku di navbera kurd û osmanîyan de pêk hat. Gelek ciyên wekî Bedlîs, Cizîra Botan, Wan, Bazîd, Amed, Sêrt, Çolemêrg û hwd. bûbûn navendên ilm û tahsîlê. Ewliya Çelebî wiha behsa mizgeft, camî, medrese û dibistanên li Bedlîs û Wanê dike yê di serdema mîrekiya Evdal Xanê kurê Şeref Xanê Bedlîsî de: “Li bajarê kevnare Bitlîsê 110 mîhrab hene ku çend heb ji wan camiyên siltanan e. Xerîb e hemû camî bi xalîçeyên Ecem û kulavên Isfehanê raxistî ne. Te hew dît hinan dev ji dersxwendinê berdan û dest bi setrencê kirin. Piştî demekê dîsa li xwendinê vegehiyan. 26 heb jî mizgeft hene. Bi her yek camî û mizgeftekê ve medreseyek heye. Di nav medreseyan de hemin yek an dido dersdêrên hesbî hene. Ev îbadetxane bi telebeyên ku hemû ilman hîn dibin dagirtî ne. Gelek medreseyan ku weqf û xêratên siltanên berê ne jî hene; Medreseya Siltan Şeref, Medreseya Gokmeydan, Medreseya Versengî, Medreseya Hacı Beg û Medreseya Xetîbiyye. Ji bilî van camî, mizgeft û medreseyan 70 heb dibistanên zarokan hene. Ji van herî yê birêkûpêk ev in: Dibistana Şeref Xan, Dibistana Xusref Paşa, Dibistana Xaniye, Dibistana Çarsuyê û Dibistana Beşaret Axa. Zarok li van dibistanan ebcêd (elîfbêtik)ê dixwînin.⁵⁷ Dîsa li Wanê digel camî û mizgeftên ku Qur’an, tefsîr û hedîs lê dihatin xwendin xwendegehên mîna Medreseya Xusref Paşa, Medreseya Deriyê Tebrîzê, Medreseya Ebbas Axa û Medreseya Kayaçlî hebûn. 20 heb jî dibistanên zarokan ên ku farisî jî li wan dihat xwendin hebûn.⁵⁸

1. 2. Jiyan û Debara Feqiyên Medreseyan

Kurd wekî niha berê jî qedrê mele û feqîyan digirtin. Nan û danê xwe bi wan re parve dikirin. Hebûna hîcre û medreseyan li gund û bajarên kurdan ciyê şeref û pesindanê bû. Wan, bi awayekî bê minet tayîn û ratib didan wan. Cil û bergên wan dişûştin. Nizir, fitre û sedeqeyên xwe didan wan. Zekat û fitreyên xwe li wan xweş

⁵⁶ Mahmut Dündar, "Mısır Eyyûbilerinde Eğitim ve Öğretim Faaliyetleri", (Doktora Tezi, Atatürk Üniversitesi sosyal Bilimler Enstitüsü, Erzurum 2014), r. 37-56.

⁵⁷ Seyit Ali Kahraman – Yücel Dağlı, (Ed.) *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahatnemesi*, c. 1, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul 2010, r. 130-132.

⁵⁸ H.b. , r. 263.

dikirin. Miriyekî wan bimira îsqata wî ji feqîran zahftir didan seyda û feqîyan. Melbatên halxweş xwedîkirina feqiyekî digirtin ser xwe, wekî şexsekî malê didîtin. Havînê ji xwe re li zekatê digeriyan. Li gund û mezrayên ku mele lê nîn bûn, meletiya Remezanê dikirin. Bi destheq xitme û dewra salê ji xelqê re dixwendin. Gundiyên me Cimzerqîyan -a li ser Misirca Sêrtê- behs dikirin, digotin hinek feqiyên Serhedî çend salan berşa havînê li gundên derdora me ji bo debara xwe, paleyî dikirin. Piraniya meleyan meleyên zekatê bûn. Ji salê heta salê gundiyan para zahf zekata xwe dida wan. Li hember van qenciyan, mele û feqîyan jî gava lazim bibûya hinek pêdiviyên gundiyan pêk tanîn. Miriyên wan bi heq dikirin, mewlûdên wan dixwendin, dersa zarokên wan didan û di bicîanîna taet û îbadetê de rêberiya wan dikirin.

Digel wî li hinek ciyan, xasma li deverên ku hêjmara feqîyan lê xilbe bû, feqîyan an jî aşpêjan xwarina wan amade dikir. Van salên dawî, li nav kurdan pergala medreseyan hema bêje bi temamî guheriye. Medreseyan di bin navê Kur'an Kursu [Qursên Qur'nê]yan de sitatuyeke fermî wergirtine. Dersdêrên wan meleyên Diyanetê yên bi qadir in. Feqî di ber xwendinê de bi riya hindekariya bervekirî (açık öğretim) perwerdehiya formel jî dibînin, pîştî îcazetnemeya xwe ji medreseyê werdigrin, dîplomayên xwe jî ji zanîngehan distînin û wezîfeyên fermî bi dest dixin. Wekî meleyên berê nakevin ber mineta zekatê.

Jiyana feqîyan a medreseyê: Feqî pîştî nimêja sibehê ranazên, heta wextê taştê metnan dixwînin, ango dersên ku berê ji ber kirine dubare dikin. Pîştî ratibên⁵⁹ xwe tînin û taştêya xwe dixwin, îcarê amadehiya derswergirtinê dikin. Li medreseyan usûleke xweser a derswergirtinê heye, rêbaza çalek; seyda yek bi yek rûbirû dersa feqîyan dide. Feqî li himber seyda li ser çokan rûdinên. Rojê carekê, li gorî qabiliyeta feqî seyda nîv rûpel, rûpelek an perekî dersa wî dide. Bi piranî seydayê mezin dersa taliban⁶⁰ didin, talib jî dersa yên kitêbên wan li jêr in, ango di binê *Hel û Şerhu'il-Muxniyê* de ne didin. Ê ku dersê werdigre ku talib be êvarê dersa xwe mitale⁶¹ kiriye, ew bi xwe dixwîne ciyên lê asê dimîne, an baş tê negihiştîye seyda şîrove dike. Heger feqiyên ku kitêbên wan ne zahf li jor bin, dersa rojek berê, an metnê kitêba

⁵⁹ Xwarina feqîyan a ku ji nav malan tînin.

⁶⁰ Talib, feqiyên ku kitêbên wan bi ser *Mele Camî* ketine.

⁶¹ Mitale, feqî nexasim ên talib li hucreyê berî razanê bi bêdengî metnê dersa ku dê roja din werbigrin an jî pirtûkên din dixwînin.

dersê li ber seyda ji ber dixwînîn, heke jiber nekiribin nikarin derseke nû wergirin. Carinan du, an sê feqî dibin hevalders, pêkve dersê werdigrin. Di dema derswergirtinê de, feqiyên din carinan guhdariya dersên ji dersê xwe jêtir jî dikin. Feqiyê ku guhdarî dike, teqez divê bê deng bimîne, usûl wisa ye. Piştî ku feqî ders xwergirt -nexasim feqiyên ne talib- digel feqiyên din dersa xwe muzakere ango bi hev re guftûgo dike. Ev yek heta nîvro dewam dike. Piştî ratibanînê û xwarina nîvro, ders û muzakereyên mane tên temamkirin û kar û barên rojane tên pêkanîn. Ji esir heta mexrebê metin tên xwendin û jiberkirin. Bermexrebkî, ratibên ku êvarê tên anîn. Pîştî eşayê qasek metin tên xwendin, dûv re talib berî razanê kitabên mitale dikin. Di dema mitalekirinê de kes deng dernaxe. Hema bêje her rojê medreseyê bi vî awayî derbas dibe. Betlane jî heye, heftiyê rojekê, êvara îne ji esir heta esra roja îne betlane ye. Di betlaneyê de hinek feqî bi destûra seyda diçin mala babê xwe. Feqiyên din îhtiyacyên xwe yên şexsî pêk tînin.

Lîstikên feqîyan: Di vî navê de feqî roja betlaneyê bi kêf û henek û lêstikan diborînin. Bêlîte* digrin. Li derve lîstikên mîna; birê, kêlê, tefşê, kevîrê qewetê, çalo û hwd. dilîzin. Êvarê jî li hicreyê bi dehan lîstikan dilîzin. Piraniya van lîstikan xwedî varyasyon in, ji bilî terzê wan ên normal awayên wan ên bi fen û xapanê jî hene û şiddetê dihundirînin. Berê pêşî awayê normal dilîzin, feqiyên xêşim, an gundiyên mêvan dixin xefikê. Hinek ji van lêstikan ev in: Şah û xurab, mîr û kizîr, mamê mûs, şerê hespan, şerê kîsoyan, sêrbazî, koşkalî, çûna hecê, avdana pembû, vînvîn, çiz û hwd.

Ratib ango tayîn; xwarina feqîyan e ku ji nav malan tînin. Feqiyên talib ne mecbûr in herin tayinan. Her heftî an ji pazde rojan carekê malên ratiban ji nû ve tên peşkirin, ji ber ku hinek mal dûr in, da ku hin feqî mexdûr nebin.

Dîsîplîna feqîyan: Jiyana medreseyan xwedî dîsîplîneke xusûsî ye, bi taybet ji aliyê sincî ve. Feqî nikare serqot derkeve nava malan. Dema derket derve divê serê wî di ber de be, bi gavên lezgîn bimeşe û heta mecbûr nemîne bi kesî re nepeyive. Li nava hicreyê jî divê bi hevalên xwe re baş biborîne, heke na dê seyda ciyê wî xera

* Bêlîte, navê listikeke dîlanê ye, bihtir feqî wê digrin. Feqî dibin du bir, dikevin milên hev, digel strandina qesîde an dilokan ber bi hev ve diçin û tên.

bike, yanî wî biqewirîne. Li zahfê hicreyan mîrê hicreyê hene. Mîr ji organîzasyona hicrê mesûl e.⁶²

Edeb û erkanê feqiyan: Feqî û talib wekî nîşaneyê hurmetê digel bernavan xîtabê hev dikan wekî; feqe filankes û mele bêvankes. Dîsa ji bo hurmetê wekî kesê sêyemîn xîtabê seydayê xwe dikan. Di ruyê wî de nabêjin; “te gotibû”, dibêjin “seyda gotibû”. Dema feqiyek kitêba xwe qedand berî dest bi kitêbeke nû bike “muftûhane”ya xwe dide; fêkî an şîranî li feqiyan belav dike.

1. 3. Ilm û Pirtûkên li Medreseyên Kurdan Dihatin/Tên Xwendin Ango Kitêbên Rêzê

Li medreseyên kurdan hindekarî bi zimanê kurdî ye. Termînolojiyeke taybet tê bikaranîn, mirov dikare bêje uslûbeke kurdo-erebîkî heye. Erê hindekarî bi kurdî pêk tê lê piraniya tabîr û têgihan bi erebî ne. Di darsa şerîetê de têgihên mustehcen bi kurdî nayên bilêvkin, bes erebiya wan tê gotin.

Li medreseyan gelek pirtûk tên xwendin, hinek ji van pirtûkan wekî “kitêbên rêzê” tên binavkirin. Ji bo ku feqî bikaribin muntehî bibin û îcazeyê wergirin lazim e van pirtûkan kuta bikin. Ji bilî kitêbên rêzê gelek kitêbên din jî tên xwendin; ev yek li gorî însiyatîfa seyda yan daxwaza feqiyan diguhere. Ilmên ku tên tehsîlkin jî gelek in, ne standart in, navlêkirina “meleyê heftilmî” yan “meleyê duwazdeilmî” jî vir tên. Em ê li jêr bi giştî behsa van ilm û kitêbên rêzê bikin.

1. 3. 1. Ilmên li Medreseyên Kurdan Dihatin/Tên Xwendin

1. Serf.
2. Nehuw.
3. Fiqih.
4. Mentiq.
5. Kelam.
6. Belaxet-Bedî‘-Beyan-Me‘anî.
7. Tefsîr.
8. Hedîs.

⁶² Emîn Norozî, “Xwendin û Feqîfî”, **Bîrnebûn**, j. 18, 2002, r. 15-26. ; Mela Ebdulla Telli, “Ji Destpêkê Heta Îro Medreseyên Kurdî”, **Nûbihar**, j. 63/64, Îstanbul 1998. ; Mela Birhanê Tarînî, **Medrese Ji Her Aliyî Ve Medreseyên Me**, Weşanxaneya Lîs, Diyarbakir 2011. ; Zeynelabidîn Zinar, **Xwendina medresê**, Weşanxaneya Pencînar, Stockholm 1993.

9. Siyer.
10. Feraîz.
12. Wedî‘.
12. Felekiyat.
13. Menare.
14. ‘Eqaîd.
15. Usûlu'l-Fiqh.
16. Usûlu'l-Tefsîr.
17. Usûlu'l-Hadîs.
18. Usûlu'l-Kelam.
19. ‘Urûd.
20. Munazere.
21. Îstî‘are.

Berê ilmên pozîtîf wekî; tib, hendese, cebîr, kîmya û hwd. jî di medreseyan de dihatin xwendin, piştî vebûna mekteban ev ders êdî li van mekteban hatin xwendin.

1. 3. 2. Pirtûkên li Medreseyan Kurdan Dihatin/Tên Xwendin Ango Kitêbên Rêzê

Li hemû medreseyan -hinek cihêrengiyên biçûk ne tê de- heman mufredat tê şopandin. Ev mufredat ji sê serdeman pêk tê. Serdema suxtetiyê, serdema feqetiyê û serdema talibiyê.

Serdema Suxtetiyê

Ev serdema destpêkê ye. Di vê serdemê de ji xwendevan re “suxte” tê gotin. Suxte ne li medreseyan, bêtir li mizgeft û malan dursa xwe werdigre û van berheman dixwîne:

1. ***Elîfbêtik***: Ji tîpên erebî pêk tê, lê herekeyên wê bi kurdî ne. “Zêr” dengê ‘î’, “zîber” dengê ‘e’ û “pêş” jî dengê ‘û’ dide û hwd. Elîfbêtikên ku bi kurdiya kurmancî hatine nivîsandin û cî dane tîpên kurdî jî hene.⁶³
2. ***Qur’an***: Serê ewil sûreya Fatîhayê tê xwendin, dûvre sûreyên *Nas*, *Feleq* û *Îxlas* tên xwendin heta cizwa *Emmayê* diqede, pey re cizwên *Tebareke*,

⁶³ Xelîl Xeyalîyê Motkî, Elîfbayê Kurmancî, tabî’ Kurdîzade Ehmed Ramîz, 1325.

Qesem û Zariyat tên xwendin û derbasî sûreya *Beqere* dibin û didomînin hetanî *Qur'anê* xetim dikan.

3. **Mewlûd:** Mele Huseynê Bateyî (Sedsala XVII M.). Jiyana Hz. Muhemmed (a.s.w.) e. Bi kurdî ye. Menzûm e, di şiklê mesnewiyê de hatiye nivîsandin. Gelek cureyên mawlûdan hene. Di nav kurdan de ya herî meşhûr a Bateyî ye.
4. **'Eqîdeya Îmanê:** Ehmedê Xanî (1650-1707). Bi kurdî ye. Bi nezm e. Ji aliyê gelek kesan ve hatiye nivîsandin. A herî meşhûr a Xanî ye. Tê jiberkirin.
5. **'Eqîdeya Îslamê:** Ehmedê Xanî (1650-1707). Bi kurdî ye. Bi nezm e. Tê jiberkirin.
6. **Nehcu'l-Enam:** Mele Xelîlê Sertî (1754-1843). Bi kurdî ye. Bi nezm e. Derbarê eqîdeyê de ye. Tê jiberkirin.

Serdema Feqetiyê

Di vê serdemê de, êdî xwendevan bi awayekî profesyonel dest bi xwendinê dike. Li medreseyê diji. Wekî feqî tê binavkirin. Divê bi dîspilîn tevbigere, ji ber ku temsîla ilm û olê dike. Ev serdem du merheleyan di hundirîne: Merheleya ilmê serfê (morfolojî) û merheleya ilmê nehew (sentaks)ê. Di vê merheleyê de kitêbên tên xwendin ev in:

1. **Nûbihara Bîçûkan:** Ehmedê Xanî. Ferhenga kurdî-erebî ye. Menzûm e, li gorî kêşeya arûzê hatiye nivîsandin û tê jiberkirin. Musennifê wê di beşa destpêkê de erka berhemê wiha destnîşan dike:
*"Ne ji bo sahib rewacan, belkî ji bo bîçûkê kurmancan.
Wekî ji Qur'anê xelas bin, lazim e li sewadê çavnas bin.
Da bi van çend reşbelean, li wan tebî'et melean.
Derê zihnê vebitin, herçî bixwînin zehmet nebîtin".*⁶⁴

⁶⁴ Ehmed Hilmî Qoxî ed-Diyarbakirî (Ed.), *Gulzara Hemûkan Şerha Nûbehara Bîçûkan*, Îhsan Yayınları, İstanbul 2004, r. 17.

2. ***Xayetu'l-Îxtîsar***: Ebu Şuca' el-Îsfehanî (m.1106M.) Derbarê fiqha Şafî'î de ye. Da ku feqî bi hindikahî be jî hînî rêz û rêbazên olî bibe vê kitêbê dixwîne. Li hinek medreseyan çend kitêbên din jî yên fiqhê dixwînin.
3. ***Tesrîfa Kurmancî***: Mela Yûnusê Helqetînî (m. 1785M.) Bi kurdî ye. Şerha Izziya Curcanî ye. Çend heb tesrîfên din jî hene lê ya herî berbelav ev e. Feqî bi vê berhemê dest bi ilmê serfê dikan.
4. ***el-Emsîle***: Muellifê wê nayê zanîn. Kitêba serfa erebî ye. Kêşana lêkerên curbicûr dihundirîne. Tê jiberkirin.
5. ***Bîнау'l-Ef'al***: Muellifê wê nayê zanîn. Kitêba serfa erebî ye. Di berhemê de 35 qalibên kêşana lêkeran hene.
6. ***el-Maqsûd***: Muellifê wê ne diyar e. Kitêba serfa erebî ye. Di berhemê de 30 qalibên kêşana lêkeran hene. Hin seyda wê nadin xwendin.
7. ***el-'Izzî***: Izzuddîn ez-Zencanî (m.655/1256). Kitêba serfa erebî ye. Gelek şerh û haşiyeyên wê hatine çekirin û li gelek zimanan hatiye wergerandin. Tê jiberkirin.
8. ***Merahu'l-Erwah***: Ahmed bin Elî bin Mes'ûd (538/650-1144/1250[?]) Kitêba serfa erebî ye. Hin seyda wê nadin xwendin.
9. ***el-'Ewamîl***: Abdulqahir bin Ebdurrahman el-Curcanî (m. 474/1080). Kitêba nehwa erebî ye. 100 amil û mînakên wan hildigre nav xwe. Tê jiberkirin.
10. ***Zirûf***: Mela Yûnusê Helqetînî (m. 1785). Bi kurdî ye. Kitêba nehwa erebî ye. Tê jiberkirin.
11. ***Terkîb***: Mela Yûnusê Helqetînî (m. 1785). Bi kurdî ye. Kitêba nehwa erebî ye. Tê jiberkirin.
12. ***Sa'dullah Sexîr***: Dibe ku ev pirtûk jî ya Sadullah Gewra be. Şerha Ewamila Curcanî ye. Tê jiberkirin.
13. ***Şerhu'l-Muxnî***: Muhemmed bin Ebdurrehîm el-Emerî el-Mêlanî (m.1408M.) Kitêba nehwa erebî ye. Şerha *Muxniya* Ehmed bin Hesên el-Çarperdî (1265-1346) ye. Muxnî tê jiberkirin.
14. ***Tedricu'l-Edanî Îla Qîraetî Şerhu's-S'edî 'Ela Tesrîfî'z-Zencanî***: Ebdulheq ec-Cawî. Kitêba serfa erebî ye. Şerha *Se'dîya* Teftezanî (1312-1369M.) ye.

15. **Helu'l-Me'aqîd Şerhu'l-Qewa'id:** Ehmed bin Muhemmed el-Henefî (m.1597). Kitêba nehwa erebî ye. Şerha *Qewa'idu'l-Î'raba* Îbnû Hîşam e.
16. **Se'dullah Gewre/Hedaîqu'd-Deqaîq:** Se'deddîn Se'dullah el-Berde'î. Kitêba nehwa erebî ye. Şerha *Enmûzecê* ye, ya Îmam Zemexşerî.
17. **Suyûtî:** Celaleddîn Ebu'l-Fazl Ebdurrahman bin Kemaleddîn Ebî Bekir bin Muhammed el-Huzeyrî es-Suyûtî el-Şafî'î (1445-1505). Kitêba nehwa erebî ye. Şerha *Elfiyeya* Îbn Malik (1203-1273M.) e. *Elfiye* tê jiberkirin.
18. **Kafiye:** Îbn Hacib, Cemaleddîn Ebî Emr Usman el-Kurdî (m.1248 M.) Kitêba nehwa erebî ye.

Serdema Talibiyê

Ev serdem teqabulê dibistana bilind dike. Xwendevan êdî “talib” e, dikare dersa feqiyên kitêbên wan li jêr in bide. Bixwaze dora hicreyê nake û naçe ratiban; lê hin ji wan bi xwebexşî diçin ratibên malên nêzik. Di xîtabê de wekî “mele filankes” gazî wan tê kirin. Zanîna wan guhîştîye ku bikaribe kitêbên ku ne xwedine mitale bikin. Bi hindikahî meletiya Remezanê bi wan dibe. Di vê serdemê de bihtir kitêbên ji bilî serf û nehwê tên xwendin. Para zehf şerh û haşîye ne.

1. **Mela Camî/el-Fewaîdu'd-Diyâîyye:** Mewlana Camî/Nûreddîn el-Camî, Ebdurrehman bin Muhemmed bin Ehmed (m. 1490 M.). Kitêba nehwa erebî ye. Şerha *Kafiyya* Îbnû Hacib e.
2. **Îsaxocî/ er-Rîsaletu'l-Esîrîyye:** Mufeddel bin Umer (m.1264 M.) Ebherî. Kitêba ilmê mentiqê ye.
3. **Cerîr Muxnî e't-Tullab:** Mehmûd bin Hafiz el-Manîsaî (m.1807). Kitêba ilmê mentiqê ye. Şerha *Îsaxocîyê* ye.
4. **el-Fewaidu'l-Fenariyye:** Muhemmed bin Muhemmed er-Rûmî (1350-1431 M.). Kitêba ilmê mentiqê ye. Şerha *Îsaxocîyê* ye. Her talib wê naxwîne.
5. **Qewl/Qûl – Ehmed:** Ehmed bin Muhemmed (1306-1383 M.) el-Henefî . Kitêba mentiqê ye. Şerha *el-Fewaîdu'l-Fenariyyê* ye.

6. *Şerhu'ş-Şemsî/Teqrîru'l-Qewaîdu'l-Mentiqîyye Fî Şerhî Rîsaletî'ş-Şemsiyye*: Mehmûd bin Muhammed (1295-1365M.). Kitêba ilmê mentiqê ye.
7. *'Evdî'l-Xefûr*: Evdîlxfûr bin Selah el-Larî (m. 1057 M.). Kitêba nehwa erebî ye. Haşiyeya *Mela Camî* ye.
8. *er-Rîsaletu'l-Wad'iyye*: Izzeddîn Evdirrehman bin Ehmed. Kitêba ilmê wed'ê ye. Şerha *er-Rîsaletu'l-Edûdiyeyê* ye.
9. *Rîsaletu'l-Welediyye*: Muhammed bin Ebî Bekir el-Mereşî (m.1737). Kitêba ilmê belaxetê ye.
10. *Telxîsu'l-Mîftah*: Xatîbî Dîmeşq, Celaleddîn Muhammed bin Ebdurrahman el-Qazwînî (m.739 M.) Kitêba ilmê belaxetê ye.
11. *el-Mutewwel Ele't-Telxîs*: Se'deddîn Teftezanî, Mes'ûd bin 'Emr (1322-1390). Kitêba ilmê belaxetê ye.
12. *Muxteseru'l-Me'anî*: Se'deddîn Teftezanî, Mes'ûd bin 'Emr (1322-1390). Kitêba ilmê belaxetê ye.
13. *Mîftahu'l-Ulûm*: es-Sekkakî Ebû Yaqûb Yûsuf ibn Ebî Bekr bin Muhammed (m. 1226 M.). Beşa sêyem a vê pirtûkê derbarê ilmê belaxetê de ye.
14. *Şerhu'l-Eqaîd*: Se'deddîn Teftezanî, Mes'ûd bin 'Emr (1322-1390). Kitêba ilmê eqaîdê ye.
15. *Cemu'l-Cewamî'*: Ebdulwehhab bin Elî es-Subkî (1327-1370 M.). Kitêb derbarê usûla hedîs, usûla tefsîr û usûla fiqh û hinek usûla kelmê de ye⁶⁵.

Li medreseyan kurdan di ber kitêbên rêzê de hinek kitêbên din jî tên xwendin, lê belê ne hemû feqî. Ji vê yekê re dibêjin dersên zêde. Dersê zêde dikare Fiqih, Tefsîr, Hedîs an Sîyer be an jî zimanê farisî be. Zimanê farisî li kêr ciyan heye.

Bi *Cem'u'l-Cewami'*ê serdema talibiyê kuta dibe. Xwendevan êdî muntehî ye, kitêbên xwe qedandine. Bi rêûresmekê îcazeyê xwe werdigre. Ku bixwaze dikare di warê ilmê Tefsîr, Hedîs an Fiqhê de pisporiya xwe baştir bike; hinek pirtûkên din jî

⁶⁵ Dursun Hazar, *Osmanlı Medreselerinde Arapça Öğretimi ve Ders Kitapları*, Gazi Üniversitesi Çorum İlahiyat Fakültesi Dergisi, j. 1, 2002, r. 274-293; Epözdemir, h. b. , r. 15-26.; Telli, h. g., 63/64, Tarînî, h. b. ; Zinar, h. b.

bixwîne. Bi piranî talib heta muntehî nebin nazewicin, piştî wî îcazeyê xwe werdigrin û li gundekî meletî dikan.

Helbet ev rewş û şêla feqî û muntehiyên medreseyan vêga gelek guheriye. Êdî piraniya seydayan bi kadro ne. Medrese jî bi navê Qursên Qur'anê di bin îdereya Diyanetê de bi awayekî fermî tên vekirin. Debara feqiyan jî ji aliyê dewlet, komele û saziyên xêrxwaz ve tê meşandin. Feqî naçin ratiban, aşpêj ji wan re xwarinê amade dikan. Gelek ji van medreseyan bi rêxistinî bi hinek derdorên wekî terîqet û cemaetan ve girêdayî ne. Lê pirtûkên ku tên xwendin kêr-zêde cardin ên berê ne.⁶⁶



⁶⁶Tatvan Medine Medresesi, Tatvan Medine Medresesinin Eğitim ve Müfredat Programı, http://www.Tatvanmedinemedresesi.com/main/index.php?option=com_content&view=article&id=39:medine-camii-medrese-mufredati&catid=12&Itemid=143 (18. 01.2016).

BEŞA DUYEM

JIYAN Û BERHEMÊN ELİYÊ TEREMAXÎ

Destpêk

Ji bo ku baştir bê fêmkirin ka Eliyê Teremaxî ber û berhema kîjan şert û mercan e û bi saya kîjan zerf û zurûfan berhema xwe *Tesrîfê* diyariyê mubtedî û zarokên kurmancan kiriye, divê şikestina dîrokî ya sosyo-siyasî ya kurdan a ku bi şerê Çildêranê dest pê kiriye baş bê zanîn. Şerê Çildêranê çawa çêbû? Çi bi xwe re anî? Heta dawiya sedsala 15an jî neteweya Îranê ne di nav yekîtiyeke siyasî de bû, wekî kraliyetên piçûk bû. Piştî xanedana Sefewiyan ev perçebûn nema, ji ber ku Şah Îsmâîl xanedanên din hemû ji holê rakirin.⁶⁷ Di vê navê de giregirên Kurdistanê li hev kirin ku serpereştiya şahê Îranê qebûl bikin. Di sala 1511ê de 12 mîr û begên Kurdistanê berê xwa dan Xoyê baregeha Şah Îsmâîlê Sefewî da ku sdaqet û teslîmiyeta xwe jê re diyar bikin. Şah Îsmâîl ji dêvla ku wan xelat û teltîf bike gişt derdest kirin û avêtin zîndanê. Şah Îsmâîl bi vî awayî ji hêlekê ve heyfa têkçûna bav û kalan a li hember mîrê Botan ji kurdan hiltanî, ji hêla din ve siyaseta xwe ya Şîîkirinê pêk tanî.⁶⁸ Li gorî dîroknasê tirk Faruk Sümer qet şik tê de tune ku xanedaniya Sefewiyan ji Fîrûz Şahê kurd ê Sincar [Şengal]î tê.⁶⁹ Lê belê hîrsa mezhebî hişê Şah Îsmâîl ji serê wî girtibû, nexwe dê bi kurdên ku ji aliyê nijadî ve digihîştin hev re ji dêvla neyartiyê, hevalbendî bikira. Vê yekê kir ku kurd mêla xwe bidin ser Osmaniyên Sunnî. Jixwe ew serekên kurdan, piştî Şah Îsmâîl di Şerê

⁶⁷ Hasan Arfa, **Kürtler Üzerine Tarih ve Folklor Yazıları**, Sevgi Soysal-Enis Talu Çelikkan (Wer.), Öz-Ge Yayınları, Ankara 1991, r. 26-27.

⁶⁸ Şerefhanê Bedlîsî, **Şerefname**, Ziya Avcı (Wer.), Weşanxaneya Avesta, İstanbul 2012, r. 221.

⁶⁹ Faruk Sümer, **Safevi Devletinin Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin Rolü**, TTK Yayınları, Ankara 1992, r. 1.

Çildêranê de li himber padîşahê Osmaniyan Yavuz Selîm têk çû, hê nû ji hepîsxaneyê xilas bibûn.

Di wê serdemê de siyaseta Osmaniyan a ku dimeşandin berovaciyê siyaseta Sefewiyan bû. Vê siyaseta tirkên, heta radeyekê daxwazên kurdan pêk tanî, dilê wan xweş dikir û pîştî wê, wan a xwe dibir serî û saziyên xwe yên desthilatdariyê ava dikirin.⁷⁰ Piştî Şerê Çildêranê (28 Gelawêj 1514)⁷¹ Yavuz Selîm di bin serpereştiya Îdrîsê Bidlîsî de digel 28 mîrên kurd li Amasya runişt û peymana yekîtiya tirk û kurdan pesend kir. Li gorî xala yekem a deqa wê peymanê, mîrên kurdan, ew xaka ku ji bavên wan mabû dê serbixwe li gorî adet û toreya xwe biparastan.⁷²

Her wiha, Padîşahê Osmaniyan Sultan Selîm 16 mîrekiyên kurdan bi awayekî fermî nas kirin. Ev mîrekî hukûmet bûn, kar û barên xwe yên navxweyî bi destê xwe dimeşandin. Bi domana demê re hêjmara van hukûmetan wekî mîrektî, begîtî û sancaxiyan bi zanîn hate zêdekirin. Hêjmara wan heta çarsedî derket. Du sedemên zêdekirina mîrekiya kurdan hebûn; yek ji bo yekîtiyên kurdan ên xurt çênebin, dido; ji bo desthilatdarî bi tevahî nekeve destê kurdan. Mesela Hikûmeta Diyarbekir, li 19 sancaxan hatibû parvekirin, 8 heb ji wan bi destê mîr dihatin îdarekirin, 11 heb jî rasterast bi destê padîşah angê dewletê dihatin îdarekirin.⁷³

Di 1639an de peymana ji aliyê Osmanî û Persan ve hate îmzekirin digel gelek şer, pevçûn û serhildanên herêmî, hikmê wê heta sala 1918an domiya. Vê peymana navnetewî ku welatê kurdan kir du perçe, jiyana wan a siyasî û aborî jî ji ebrê xist. Êdî sedemeke ku tirk ji persan bitirsiyan nemabû lewma bi awayekî sistematîk desthilatdarî hat navendîkirin. Ji 1650yan heta 1730yan li herêma Wan û Diyarbekirê hema bêje mîrekiyên xwedmuxtar neman, li nêveka sedsala nozdehan ev proses temam bû.⁷⁴

⁷⁰ Muhammed Emîn Zekî Beg, **Kürtler ve Kürdistan Tarihi**, Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan (Wer.), Weşanên Nûbihar, İstanbul 2013, r. 162.

⁷¹ Baron Joseph Hammer Purgstal, **Hammer Büyük Osmanlı Tarihi**, Mehmed Ata Bey, Vecdi Bürün, Refik Özdek, Erol Kılınç, Fuat Onuk, İsmet Elbaş, Mumin Çevik (Wer.), Üçdal Neşriyat, c. 2, İstanbul 2010, r. 560- 567.

⁷² Ekrem Cemil Paşa, **Dîroka Kurdistan**, Omer Dewran (Wer.), Weşanên Bîr, Diyarbekir 2007, r. 120-121.

⁷³ Hasan Yıldız, **XX. Yüzyıl Başlarında Kürt Siyaseti ve Modernizm**, Nûjen Yayınları, İstanbul 1996, r. 16-17.

⁷⁴ Amir Hasanpour, **Kurdistan'da Milliyetçilik ve Dil**, İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan (Wer.), Weşanên Avesta, İstanbul 2005, r.125.

Jemal Nebez dibêje, heke kurdan di sala 1515an de li dewsa girêdana rêzeke peyman û kontraktan federasyoneke rasteqîne ligel Selteneta Osmaniyan ava bikiran, dê ew tengavî û şerperzetiya ku bi sedsalan dewam kir nebûya.⁷⁵ Dîsa gelek nivîskar di wê baweriyê de ne ku piştî têkçûna Sefewiyan û serketina Osmaniyan, kurd ji aliyê tirkên Osmanî ve hatine xapandin.⁷⁶

Divê ji Şerê Çildêranê û encamên wê tenê xapandina kurdan neyê fêmkirin, her wiha divê geşedana çand, huner, ilm û irfanê jî bê fêmkirin, û heta radeyekê pergala xweîdarekirin û hêz û qeweta leşkerî jî bê dîtin ku mirov dikare wekî ronesansekê bi nav bike.

1. Jiyana Eliyê Teremaxî

1. 1. Navê Wî

Navê wî Eliyê Teremaxî ye. Teremax navê gundê wî ye. Nisbeta wî bi bal gundê wî ve hatiye dayîn. Ji ber ku xwendina medreseyê kuta kiriye û seydatî jî kiriye wesfê “mela” jî wergirtiye. Li ser navê wî lihevkin heye lê belê di bilêvkirina bernavê wî de lêkolîneran li hev nekiriye wekî “Mela Eliyê Teremaxî”, “Mella Ali et-Terâmâxî el-Müksî”, “Eliyê Termûkî”, “Elî Termukî”, “Eliyê Teremokî” û “Ali Termokî” jî hatiye binavkirin.

1. 2. Gundê Wî Teremax

Min piştî guftugo û şaşiyên li ser nav û gundê Eliyê Teremaxî dîtin, ez bi xwe çûm Teremaxê min ji nevîçîrkên wî Munir Hatim (82 salî), Hacer Bal (68 salî) (Foto: 2) û Îhsan Hatim (35 salî keyayê gund)(Foto: 3) agahiyên nisbeten rasttir wergirtin.

Teremax (Yaylakonak) (Foto: 4) gundê Eliyê Teremaxî ye. Li ser Muksa qezaya Wanê ye. Di serdema Teremaxî de Muks li ser Hekarî bûye. Teremax bi 23 km.yan li rojavayê başûrê Muksê dikeve. Sê aliyê wê çiya ne. Ew bi xwe jî di qûntara çiyê de ye. Li beroj e, berê wê li roja nîvro ye. Li başûrê wê gundê Zerdas

⁷⁵ Jemal Nebez, **Kurd (Dîrok û Kultura Wan)**, Ergîn Opengîn (Wer.), Weşanên Avesta, İstanbul 2008, r. 44.

⁷⁶ Ekrem Cemîl Paşa, r. 121; Hasan Yıldız, **XX. Yüzyıl Başlarında Kürt Siyaseti ve Modernizm**, Nûjen Yayınları, İstanbul 1996, r. 14-15.; M. S. Lazarev, Ş. X. Mihoyan, E. İ. Vasilyeva, M. A. Gasratyan, O. İ. Jigalina, **Kürdistan Tarihi**, İbrahim Kale (Wer.), Avesta Yayınları, İstanbul 2001, r. 93.; Amir Hasanpour, r. 124-125.

heye. Li rojhilatê wê bi çolebirî bi qasî dûrbûna 10 km.an Werezoz heye; gundê hevçerxê Teremaxî Feqiyê Teyran. Li bakurê wê Evdiwan û Arwas hene bi hizrê 5-6 km.yan. Ji Muksê berî mirov bigihîje Teremaxê mirov di ber gundê Nankas (Foto: 5) de dibûhire ya ku bi mizgefta xwe meşhûr e.⁷⁷

Teremax gundekî kevin î xilbe ye. Niha jî ava ye, 96 mal tê de hene. Gund berê xilbetir bûye, gundî dibêjin berî niha 200 mal bûn, heta dibêjin berêya berê hejmara malan heta derdora 700î jî çêbûye. Wê demê gund ji kurdên misilman û ermenên mesîhî pêk dihat. Vêga jî kaviîlê dêreke ermenan (Foto: 6) di nav gund de hê nîvava ye. Ji mizgeft, medrese û zêdxas/dinga Teremaxî ya di nîvê gund de ava kiribûn îro tenê dîwarek maye di binê mizgefta nûçêkirî (Foto: 7) de.

Gundiyên Teremaxê dibêjin qebra Eliyê Teremaxî li nav qebrîstana Muksê di kêleka qebra Mîr Hesenê Welî de veşartiye. Gundî behsa qebrên 18 heb sehabîyan jî dikin ku niha li nav qebrîstana gund veşartî ne. Her sal meha pûşperê xelqê derdorê tîn li ser van qebiran, sê rojan cemahî dikin. Li ber gund zewîyeke ku ji Eliyê Teremaxî maye heye, di destê neviçîçirkên wî de ye. Baweriya xelqê bi nanê ji genimê vê zewîyê hatiye çêkirin heye ku: Zarokên ku misêwa digrîn an natebitin vî nanî deynin bin balgiya wan, aram dibin. Jinên ku zarokan naynin an şîrê wan kêr e vî nanî bixwin zarokên wan çêdibin û şîrê wan zêde dibe.

Teremax ji mêj ve navkoya xwendin û zanînê bûye. Maxwena, li milekî wê Werezoza Feqiyê Teyran, li milê din Nankasa bi mizgeft û feqiyên xwe meşhûr, li hêleke wê Muksa Hesenê Welî, li hêla din Arwasa şêx û meleyên Mala Arwasiyan û Evduwana Mele Marûfê bi ilm û meletiya xwe meşhûr ê ku hatiye li Zoqeyd û Têlanê meletî kiriye û vêga li Têlanê di nav kumbeta şêxên Mala Qadiriyan de veşartî ye. Cîraniya Nûrs, Tax û Hîzanê jî divê neyê jibîrkirin.

1. 3. Nasnameya Wî

Li gorî Mela Mahmûdê Bazîdî, Eliyê Teremaxî di 1000ê koçî de ango di şikesteka sedsala 16 û 17an de jiyaye. Mirovekî xweyîzîhn û îdrak, sahibîş û fetanet bûye. Teleba ilm û fenên bedî kiriye, bi vê mebestê demeke dirêj li Bexda, Muks, Behdînan û Soran kesb û tehsîla ilmî kiriye. Di fennê ilmê serfê de zêde meharet û pisporiyê bi dest xistiye. Di zemanê xwe de gelek meşhûr û naskirî bûye. Bazîdî

⁷⁷ Vêga jî xelqê derdorê bi Mizgefta Nankasê sond dixwin.

dibêje belkî heta dema ku ew lê dijiyan jî nav û nîşanên Teremaxî li Kurdistanê hebûye. Dîtiye ilmê serfê zehmet, dijwar û asê ye, xwendevanên nû zû bi zû nikarin sîxe û î'alan ji kitêbên erebî derxin, ji bo ku ji van mubtediyan re hêsan bike bi zimanê kurdiya kurmancî îbaretekî tesrîfê tesnîf kiriye. Eliyê Teremaxî di gundê xwe de medfûn e.⁷⁸ Lê belê gundiyan Teremaxê dibêjin qebra Teremaxî li Muksê li ba ya Mîr Hesenê Welî ye.

1. 4. Şexsiyeta Wî ya Ilmî

Marûf Xeznedar balê dikişîne ser vê rastiyê: "Ji berê ve heta vêga jî li hucreyên mizgeftên Kurdistanê ne ilmê serfê tenê belkî hemû ilmên Îslamî bi zimanê kurdî pêk dihatin, lê belê dilsozî û hestên neteweyî yên vî zanayê kurd aniye serfa erebî bi zimanê kurdî xistiye ser kaxiz û bi zimanê farisî û kurdî re jî berawird kiriye. Ev yek ji bo wê serdemê pêngaveke niştîmanperwerî ye û nîşaneya hestên kurdayetî ye."⁷⁹ Teremaxî bi qasî ku bikaribe gramera wan binivîse bi zimanê erebî, farisî û kurdiya kurmancî zanibû, helbet bi tirkî jî zanibû. Berhama Teremaxî ji gelek aliyan ve girîngiyê dihevine. Abdurrahman Adak vê girîngiyê bi çar xalan destnîşan dike: "Yek ji wan ew e ku ne bi nezmê bi pexşanê hatiye nivîsandin. Mirov dikare vê berhemê wekî yekem berhema pexşan a kurdî bihesibîne. Ya duyem ew e ku ev berhem di destpêka serdema mîrekîtiyan de hatiye nivîsandin. Wate di demeke zû de hatiye nivîsandin. Ya sêyem ew e ku berhem taybetiyên vegotina kurdiya kurmancî ya dema xwe bi me dide nîşandan. Ya çarem jî di berhemê de carcaran digel qaîdeyên zimanê erebî û farisî behsa rêzikên kurdiya kurmancî jî hatiye kirin. Bi vî awayî ji bo gramera kurdiya kurmancî wekî xebateke pêşîn tê hesibandin."⁸⁰ Wesfekî berhemê yê ji hemûyan girîgtir heye, berhem numûneya hîndekariya bi zimanê kurdî ye. Rast e ku berhemê bingeha rêzimana kurdiya kurmancî daniye, lê ya ji wê muhîmtir berhem bi erka xwe nîşan dide ku zimanê kurdî wekî alet têr dike da ku tu bi zimanê kurdî hîndekariya zimanekî dîtir jî bê kirin.

⁷⁸ H. b. , 25-26.

⁷⁹ H. b. , 15.

⁸⁰ Abdurrahman Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, Weşanên Nûbihar, İstanbul 2014, r. 269.

2. Tesrîfa Eliyê Teremaxî

Berhem bi gelek awayan hêjayî nirxandinê ye, em ê li pêş naveroka wê li gorî ziman, rêziman û şêwezariyê binirxînin lê niha em ê serencam, nav, teşe û naveroka wê wergerin dest.

2. 1. Serencama Tesrîfa Teremaxî

Di destpêka nivê didoyê ya sedsela 19an de zanayê kurdnas konsolosê Împeratoriya Rûs Alêksandir Jaba li Erzerûmê agahiya destnûsekê distîne, ya derbarê “serf”a erebî bi zimanê kurdiya kurmancî. Ev destnivîs li Hekarî li ba meleyekî ye. Jaba bi awayekî wê destnivîsê bi dest dixe. Mela Mahmûdê Bazîdî di sala 1284H/1857-1858M an de destnivîsê li ser daxwaza Jaba rûnûs dike û pêşgotinekê jê re dinivîse ku tê de behsa xwendewariya li Kurdistanê û bi kurtî bahsa jiyana nivîskarê wê Eliyê Teremaxî dike.

A. Jaba pêwendî bi Akedemiya Împeratoriya Rusya ya li Petersburg (Lenîngirad) re datîne, bi taybetî nameyeke xusûsî ji rojhilatnasê Almanî Dorin re dişîne. Jê re behsa destnivîsê û pêşgotina wê dike û jê tika dike ku vê destnivîsê pêşkêşî Enstîtuyê bike. Dorin ji Jaba dixwaze ku destnivîsê wergerîne fîransîzî lê Jaba terzê nivîsîna nivîskar ya ku wekî rêbaza rojhilatîyan e wekî mazeret nîşan dide û wernagerîne. Di sala 1860î de Jaba pêşgotina Mele Mahmûdê Bazîdî ya ku ji berhema Teremaxî re nivîsiye werdigerîne Firansîzî û digel destnivîsê dişîne Enstîtuya Petersburgê. Jaba piştî wê, vê pêşgotinê digel wergera wê di pirtûka bi navê *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* de dide weşandin.⁸¹ Ev pirtûk bi zimanê kurdiya kurmancî û fîransîzî ye, di nav weşanên Lîsê de bi amadekarina Ziya Avcî ji nû ve hatiye weşandin.⁸²

Di sala 1927an de Mînorskî di Îslam Ansiklopedisi [Ansîklopediya Îslamê] gotara kurdan de wekî çavkanî vê kitêba Jaba amade kiriye *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî* nîşan dide û dibêje: Eliyê Teremaxî yek ji wan kesan e ku bi kurdî gramera zimanê erebî nivîsiye.⁸³

Em ji Xeznedar hîn dibin ku; di sala 1957an de Dr. Margirît Borîsêvna Rûdênko di gotarekê de behsa vê destnivîsê dike. Di sala 1961ê de cardin Rûdênko

⁸¹ Xeznedar, r. 10.

⁸² Avcî, r. 55-56.

⁸³ Mînorsky, “Kürtler”, Îslam Ansiklopedisi, İstanbul 1955, c. 6, r. 1114.

ev car di pirtûkeke taybet de behsa vê destnivîsê dike.⁸⁴ Di sala 1970yê de Marûf Xeznedar di kovara “*Defterî Kurdî*” h. 2, Bexda, r. 142-144 de derbarê *Tesrîfa Teremaxî* de gotarekê da weşandin.⁸⁵

Di sala 1971ê de Marûf Xeznedar *Tesrîfa Teremaxî* bi navê *Destûrî Zimanê Erebî Be Kurdî Eliyê Teremaxî Sedey Hevdemî Zayîn* digel pêşgotinek, gotarek, ferhengokek û pêşgotina Mahmûd Bazîdî ya ji *Tesrîfa Teremaxî* re nivîsandibû li Bexda, li çapxaneyê Daru’z-Zeman çap dike.

Di sala 1997an de Zeynelabidîn Zinar *Destûrî Zimanê Erebî Be Kurdî Eliyê Teremaxî Sedey Hevdemî Zayîn* latînîze dike, bi sernavê “Agahdarî” pêşgotinekê dixê berî, digel kopiyaya *Destûrî Zimanê Erebî* ya Marûf Xeznedar bi navê *Mele Elî Teremaxî Sserfa Kurmancî* li Pencînar Weşanxaneyê Çanda Kurdî, Stockholmê diweşîne.⁸⁶

Mamoste Marûf Xeznedar dibêje ku destnivîs bi xwe ya ku nivîskar navê *Haza Kîtabû Îbaretu Elî Teremaxî – Haza Kîtabu Serfî Lîsanî Kurdî* lê kiriye niha bi hejmara (C1958)ê li nav dolabên Pirtûkxaneyê Enstîtuya Rojhilatnasî ya Akademiya Zanistîya Sovyet li Lenîngradê de ye.⁸⁷ Mixabin ev destnivîs di nav arşîva A. Jaba de ya ku Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Artuklu da anîn ne xuya ye.

2. 1. 1. Navê Berhema Teremaxî

Gelek nav li berhemê hatine kirin. Li ser destnivîsê du nav ji bo pêşgotina Mela Mahmûdê Bazîdî û du nav jî ji bo eslê berhemê hatine danîn. Navên di pêşgotinê de hatine danîn bi vî awayî ne:

1. *Muqeddîma Ilmê Serrî û Be’dî Usûlê Lazîmeyê Te’lîmîye bi Zimanê Kurmancî*
2. *Muqeddîma Behsa Musennîf û Mûcîdê Serrî di Nêv Ekradan da Tête Beyankirin 1274H*⁸⁸

Navên di eslê berhemê de hatine danîn jî bi vî awayî ne:

1. *Haza Kîtabû Îbaretu Elî Teremaxî* (Ev Îbaretê Kitêba Eliyê Teremaxî ye)
2. *Haza Kîtabu Serrî Lîsanî Kurdî* (Ev Kitêba Serfa Zimanê Kurdî ye)⁸⁹

⁸⁴ Xeznedar, r. 12.

⁸⁵ H.b., r. 12, nîşeya 11.

⁸⁶ Zinar, h. b.

⁸⁷ Xeznedar, r. 10.

⁸⁸ H. b., r. 25.

A. Jaba li ser bergê destnivîsê bi Firansizî ev nav lê kiriye: **Grammaire Kurde**⁹⁰

Marûf Xeznedar dema di sala 1971ê de li Bexdayê berhem çap kiriye ev nav lê kiriye: **Destûrî Zimanê Erebî Be Kurdî**

Reşîd Findî dema di sala 1985an de li Bexdayê pirtûka xwe ya bi navê *Eliyê Teremaxî Êkemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd* e daye çapkirin ev nav lê kiriye: **Rêzimana Eliyê Teremaxî**⁹¹

Zeynelabidîn Zinar dema di sala 1997an li Stokholmê *Destûrî Zimanê Erebî Be Kurdî* ye latîniye kiriye û çap kiriye ev nav lê kiriye: **Serfa Kurmancî**⁹²

Mela Birhanê Tarînî di sala 2011an de di berhama xwe ya bi navê *Medrese Ji Her Aliyê Ve Medreseyên Me* de dibêje, Mela Eliyê Teremaxî bi kurdî pirtûka serfê nivîsiye, navê wê **Tesrîfa Melle Elî** ye.⁹³

Muhemmed Nezîr e'z-Zaza dema di sala 2014an de li Diyarbekir di nav berhevokekê de bi îddîaya ku ya Eliyê Teremaxî ye *Tesrîfa Kurmancî* ya Helqetînî çap kiriye ev nav lê kiriye: *el-Mecmû'et'ul-Menheciyetu Ew Tesrîfu't-Teremaxî Fî Ilmî's-Serfî*⁹⁴

Ji ber çend sedeman me navê **Tesrîfa Teremaxî** li berhemê kir. 1. Ev navê ravekî her du navên wê yên eslî di hundirîne; “*Kitêba Teremaxî*” û “*Serfa Kurdî*”. 2. Piraniya pirtûkên bi vê naverokê hatine nivîsandin wekî *Tesrîf* hatine binavkirin lewma. 3. Li gorî kevneşopiya navlêkirina pirtûkan e, wekî; *Ewamila Curcanî, Elfiyeya Îbnî Malik, Camî, Sa'dînî* û hwd. 4. Da ku bi *Tesrîfa Kurmancî* (ya Helqetînî) re neyê tevîhevkin, lewre vê dawiyê tevîhevkinê heye. 5. Ji bo ku ji aqûbeta *Tesrîfa Kurmancî [Tesrîfa Helqetînî]* xelas bibe, ango bê xwedî nemîne. 6. Wekî kesê yekemîn ê kurd ku rêzimana kurdiya kurmancî nivîsiye Teremaxî layiq û musteheqê vê navlêkirinê ye, da ku navê wî bi xwe jî bê vejandin.

2. 1. 2. Şekl û Şemala Destnivîsê

Berhem bi vê hevokê dest pê dike: “Î’lem tu bizan ey mufredê muzekker ê muxateb ku ji boy tayîfa ekradan ra jî lazim e ku bi zimanê kurmancî ew ji ‘ilmê

⁸⁹ H. b. , r. 29.

⁹⁰ H. b. , r. 13.

⁹¹ Findî, h. b.

⁹² Zinar, h. b.

⁹³ Tarînî, r. 65.

⁹⁴ Muhemmed Nezîr ez-Zaza (Ed.) *El-Mecmû'et'ul-Menheciyetu Ew Tesrîfu't-Teremaxî Fî Ilmî's-Serfî*, Mektebetu'z-Zengiyye-Mektebetu'l-Minhac, Diyarbekir 2014.

şerfê bizanin, lewra bina û esasa hemû ‘ilman, li ser ‘ilmê şerfê ye”.⁹⁵ Li gorî saloxdana Marûf Xeznedar şêl û forma destnivîsê bi vî awayî ye: Li ser bergê wê bi xetê Jaba bi zimanê Firansîzî navnîşana destnivîsê hatiye nivîsandin: “*Grammaire Kurde par Ali Teremakhi offerts à l’Academie Imperial des sciences à St. – Petersbourg par A. Jaba.*” Destnivîs di sala 1274an ê koçî de ji aliyê Mela Mahmûdê Bazîdî ve hatiye rûnûskirin. Pêşgotin bi rûpela 2yan dest pê dike, rûpela 3yan û hemû raperên pêş bi tîpên latînî ji bo nivîsandina tekstan hatine danîn. Lê belê nehatine temamkirin, tenê heta rûpela 15an bi tîpên latînî jî hatiye nivîsîn, êdî ji wir û bi şûn ve hemû rûpel spî mane. Diyar e Jaba latînîzekerina berhemê nîvco hiştiye. Ebadên destnivîsê 19x25î, ebadên tekstan 11x20, her rûpelek 7 rêzik tê de ne, kaxîzê Ewrûpaî ye, tekst bi murekeba reş û navê feslan jî bi murekeba sor hatine nivîsandinê, bi xetê *ruq’e* ye û cuzûbenda Ewrûpayî ye.⁹⁶

Teremaxî bi vê fêslê dawî li berhema xwe aniye: “**FÊSIL** Xetmu’l- kîtab, me’lûmê te bibî ey talibê ‘ilmê şerfê ku ev ‘ilme zêde fenekî müşkil e û zaf şîge û î‘lal û tebdîlat û çemîr û keyfîyat heyîn, lazim e ku tu bi cid û se’î diqet û xîret bikî. Evane be’q qewa‘idêd cuziye bûn ku min bi heysu’l-qudret tenzîm kiriye, lakin evane cuzwî ne, bi cuzwî kul hasil nabî, lazim e tu kitêbêd şerfiye bixûnî îcarê bi eşl û fer‘ qewa‘idê şerfiye me’lûmê te dibî, yanî ‘ilmê şerfê mutleq ji hemû ‘ilman çetintir e, lewranî, şa‘irêd tirkîan gotine ku ev beyta tirkî di ‘ilmê şerfê da bit:

Şerfin î‘lali çokdur bir demirden baş gerek

Okuyan derrak gerek, ya okutan qardaş gerek⁹⁷

Îcarê bi her wechê mewqûf dîqet û se’î û xeyreta talib

Wellahu’l- muwafîq, el muste‘anû ‘ela kullî’l- umûr”.⁹⁸

2. 1. 3. Naveroka Tesrîfa Teremaxî

Berhem bi “î‘lem tu bizan”ê dest pê dike, pîştî sermijara “Îsmutte‘rîf û Beyana wê” derbasî feslan dibe. 31 yek fesil hene. 14 ji wan derbarê gramera erebî, 3 ji wan derbarê gramera farisî, 6 ji wan berawirdkirina gramera her sê zimanan, 7 ji wan berawirdkirina farisî û kurmancî, 1 ji wan jî fesla xetmulkîtabê ye. Bi gotina

⁹⁵ Xeznedar, r. 29.

⁹⁶ H. b. , r. 13.

⁹⁷ Î‘lalên şerfê gelek in, serekî hesinî divê. Ê dixwîne divê zîrek be, yan ê dide xwendin divê bira be.

⁹⁸ H. b. , r. 53.

Teremaxî: “Zîkrê şerfa ‘erebî û farisî û kurmancî digel yekûdu hatiye kirin.”⁹⁹ Di berhemê de 14 beş bi aweyek ji aweyan behsa rêzimana kurdiya kurmancî dikin in. Ev jî têr dikin ku mirov berhemê wekî bingeha rêzimana kurdiya kurmancî bi nav bike.

4. Guftugoyên li ser Eliyê Teremaxî û Berhema Wî

Teremax çawa bû Termûk an Termok û hwd. 1000ê hicrî çawa bû 1000ê mîladî û salên jiyana Teremaxî çawa bûn sala jidayikbûna wî? A. Jaba di sala 1860î de pirtûka Mele Mahmûdê Bazîdî *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* ya ku ji çîl çîrok û sê gotaran pêk tê werdigerîne Fransizî û P. Lerç digel pêşgotinekê li Petersburgê ew çap dike. Yek ji van her sê gotaran jî pêşgotina Mele Mahmûdê Bazîdî ya ku ji bo destnivîsa *Tesrîfa Teremaxî* nivîsîbû.¹⁰⁰ Piştî belavbûna vê berhemê ya ku tê de metnê *Tesrîfa Teremaxî* tunebû tenê pêşgotina wê hebû ya ku Mele Mahmûdê Bazîdî tê de hinek bahsa medreseyan kurdan, Eliyê Teremaxî û *Tesrîfa* wî fikir hişt ku gelek kes beyî metnê *Tesrîfê* bibînin behsa wê bikin, ev yek jî bû sedema gelek şaşîyan. Yek ji wan ên ku ev şaşî kiriye Bileç Şêrko ye, Şêrko di pirtûka xwe de ya bi navê *el-Qedîyet'ul-Kurdiye Madî'l-Kurdî We Hadîruhum* dibeje: “EliyêTermûkî yek ji alimên hêja ye û seydayekî mezin e. Di sala 1000H.ê de li gundê xwe yê ku dikeve navbera Hekarî û Muksê hatiye dinê. Di ilmê fennê de, nexasim di ilmê bedî'ê de pîspor bû. Muellifê serf û nehwa kurdî bû...”¹⁰¹ Li vê derê wekî tê dîtin “Teremax” bûye “Termûk” û sala nivîsîna berhemê bûye sala jidayikbûna Eliyê Teremaxî. Gelo mumkun e ku ji ber pevdenga Fransizî ev şaşî hatibe kirin, lewre navnîşana pirtûkê ya bi Firansizî wiha ye: *Grammaire Kurde par Ali Teremakhi offerts à l'Academie Imperial des sciences à St. – Petersburg par A. Jaba*¹⁰². Di gotara Mele Mahmûdê Bazî ya pêşgotina *Tesrîfa Teremaxî* de ev îbare derbas dibe: “Paşî di tarîxa hezarî bi şûve ji qezayêd Hekariyan di qeza Miksê da gundek heye Teremax dibêjîn, ji wî gundî navê Elî mirovike xoyzihn û îdrak sahibbîş û fitanet peyda bûyî, teleba ilm û funûnêd bedî'e kirî, mideyekî medîde li Bexda û Musil û Behdînan û Soran geriyayî û mayî û xwendî û kesb kemal û funûnê ilûm

⁹⁹ H. b. , r. 30.

¹⁰⁰ Ziya Avcî (Amd.), *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî Mela Mahmûdê Bazîdî*, Lîs, İstanbul 2010, r. 18-19.

¹⁰¹ Bileç Şêrko, *el-Qedîyet'ul-Kurdiye Madî'l-Kurdî We Hadîruhum*, Dar Aras, Erbil 1998, r. 45.

¹⁰² Xeznedar, r. 13.

kirî”.¹⁰³ A rast ji vî metnî tarîxeke teqez dernayê, tenê yek dikare bibêje ku Eliyê Teremaxî piştî salên hezarê Hicretê hatiye dinê, ew jî çima hicret? Em wî jî ji gotina Teremaxî derdixin a ku tewsiyeya xwendina *Sa’dînîya* Teftezanî dike, lewre Sa’dê Teftezanî di salên 1322 – 1390M. de jiyaye. Feqî Huseyn Sağniç di vê behsê de wiha dibêje: “Ev pirtûka ku bi kurmancî ye û ilmê serfa erebî vedibêje ya ku Elî Teremaxî nivîsandîye, di nav wan pirtûkan de, çûye Petersburgê û ew jî bi zimanê rûsî û frensî hatiye wergerandin. Di van wergerandinan de, li gorî rêziman, binyat û şîroveya zimanê biyanî, navê Elî Teremaxî bûye Elî Termûkî. Gundê wî, ji Miksê birine Hekarî. Dibe ku li wir, bi navê”Termuk” gundek jî hebe. Em bi vê yekê nizanin. Heger hebe jî, Elî Teremaxî ne ji wir e”.¹⁰⁴ Elî Seydo Goranî, Elî Termûkî[Elîyê Teremaxî] wekî seyyah û alimê ilmê “el-funûnu’l-cemîle”[hunerên bedew] nîşan dide.”¹⁰⁵ Abdurreqîb Yûsuf jî behsa Eliyê Teremaxî dike dibêje: “ Li gor qenaeta min, ev kitêba han **Tesrîfa Kurmancî** ye ya ku şerha **Tesrîfu’l-zincanî** ye, li ser ilmê serfa erebî heta fesla El-Meda’ife û bi kurmancî ye. Ev kiteba han niha jî di nav feqiyên kurdan ên Botan, Muksê, Hîzanê û Diyarbekirê de tê xwendin û jiberkirin. Lê belê kitêb bi tevayî nayê jiberkirin; heta el-tenbîh fî’1-fi’lî’l-mute’eddî we’l-lazim tê jiberkirin. Destpêka *Tesrîfa Kurmancî* ev e: *(I’lem) Tu bizan ey mufred û muzekker û muxateb û zihnî ye*. Ev kitêba han nêzikî sed rûpelan e. Min di kitêba xwe ya destnivîs a bi navê “**el E’lam Min Meşahir’l Kurd we Kurdistan**” a ku çend sal berî niha hatiye nivîsandin û niha jî 2000 hezar tê tercumekirin de gotiye; Mele Huseynê Teremaxî Tesrîfa Kurmancî daniye. Ew li Muksê seyda bûye û gorra wî li Muksê di nav gorristana Mîr Behdîn de ye. Eva han min ji hinekan bi vî awayî wergirtibû, lê ne dûr e navê danerê vê kitêbê Mele Elî Teremaxî be, ne Mele Huseyn be û ev malûmatên han ewan xelet ji min re gotibin.”¹⁰⁶ Diyar e Abdurreqîb Yûsuf jî berhema Teremaxî nedîtiye lewma *Tesrîfa Kurmancî* ya ku li gorî qeneeta me ya Helqetînî ye wekî ya teremaxî be nîşan dide. Tahsîn Î. Doskî û Mihemed Şêxo jî behsa Eliyê Teremaxî dikin; Mamoste Qedri, beşa gramera kurmancî ya *Tesrifê*

¹⁰³ Xeznedar, r. 25.

¹⁰⁴ Sağniç, h. b. , r. 388-389.

¹⁰⁵ Elî Seydo Goranî, **Mîn Umman Île’l-Emadiye**, Daru’l- Aras, Erbil 2012, r. 286.

¹⁰⁶ Yûsuf, h. b. , r. 20.

latînîze û rojane kiriye.¹⁰⁷ Tahsîn Î. Doskî, agahiyên di pêşgotina *Tesrîfa Teremaxî* de ya ku Mele Mahmûdê Bazîdî nivîsiye dubare dike û ji devê xelqên derdora Muksê lê zêde dike dibêje; vê dawiyê Teremaxî çûye li nava Muksê niştasih bûye, li medreseya Mîr Hesenê Welî dersdêriyê kiriye û li wir gihîştîye ber dilovaniya Xwedê, qebra wî jî ne li Teremax li Muksê li kêleka medreseya Mîr Hesenê Welî ye.”¹⁰⁸ Mihemed Şêxo, Gotarekê li ser Eliyê Teremaxî nivîsiye, di vê gotarê de bi giştî behsa guftugoyên li ser Teremaxî, berhema wî û helbestên nisbeta wan bi aliyê Teremaxî ve hatine dayîn radiweste.”¹⁰⁹

Nexwe Eliyê Teremaxî ye, ne navekî din. Di sala 1000ê hicretê de jiyaye, ne di 1000ê mîladê de û 1000ê hicretê ne sala jidayikbûna wî ye. Bi îsbat û delîl yek berhema wî heye ku ew jî tesrîf e, heta neyên dîtin an delîlên hebûna wan neyên selmandin berhemên wî yên din dê di bin nîrê gumanê de bin. Îcarê berhema wî gramera kurdiya kurmancî ye, an gramera erebî bi kurdiya kurmancî ye yan jî her du ne, va ye êdî behrem li ber çavan e. Li gorî me her du ne jî.

3. Berhemên Eliyê Teremaxî

Gelek nivîskaran nisbeta berhemên curbecur dane bi bal Teremaxî ve, wekî niha: Mela Birhanê Tarînî: “Mela Eliyê Teremaxî digel pirtûkeke serfê bi kurdî *Tefsîrekê* jî nivîsiye, lê heta niha nehatiye peyda kirin û çap kirin”.¹¹⁰ Di vê xebata xwe de ji bilî Tarînî em rastî kesekî din nehatin ku behsa tefsîra Teremaxî kiribin. Nusrettin Bolelli dibêje: “Mella Ali et-Terâmâxî el-Müxsî (m.1655) bi navê “*et-Tasrîfu’l-Kürdî*” kitêba İzzeddin ez-Zencânî “*el-‘İzzî fî’t-tasrîf*” wergerandiye kurdî.”¹¹¹ Nairouza Abdulmajid Mahmoud jî vê angaştê Bolelli dubare dike.¹¹² Me bi çavkanî û delîlan nîşan da ku ev *Tesrîf* ne ya Teremaxî, ya Helqetînî ye. Feqî Huseyn

¹⁰⁷ Mamoste Qedîrî, “Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê “*Destûra Zimanê Erebî bi Kurdî Digel Hinde Numûneyêd Farisî û Kurdî*”, **Kovara Lêkolîn û Lêgerînê Bîr**, Diyarbakır 2005, j. 1, r. 192-198.

¹⁰⁸ Tahsîn Î. Doskî, *Îqdu’l-Cuman: fî Teracîmî’l-Ulemaî we’l-Udebaî’l-Kurdî we’l-Mensûbine îla Mudunî we Qura Kurdistan*, Mektebetu’l-Ûsale wet’-Turas, eş-Şarq 2008, r. 715-717.

¹⁰⁹ Mihemed Şêxo, “Rûpelek ronîdayî ji dîroka toreya kurdî: Eliyê Teremaxî”, Welatê Me, 2016, <http://www.welateme.info/kurdi/modules.php?name=News&file=article&sid=3169#.VyHm85qLQdU> (28.04.2016)

¹¹⁰ Tarînî, r. 65.

¹¹¹ Nusrettin Bolelli, “Kürt Bilginlerin Yazdıkları Bazı Eserlerin Tanıtımı”, **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, c. 1, r. 76.

¹¹² Abdulmajid Mahmoud, r. 28.

Sağniç wiha dibêje: "...gelek berhemên Elî Teremaxî jî bi destê Aleksander D. Jaba dikevin û wan dişîne pirtûkxaneyê Petersburgê."¹¹³ Abdurrahman Adak di berhema xwe ya bi navê *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* de îma dike ku berhemên Eliyê Teremaxî ji yekê zêdetir in: "Berhemên Helqetînî ji yê Xanî zêdetir dikevin kategoriya yê Teremaxî."¹¹⁴ Di mufredata Medreseya Camiya Tatwanê de hatiye gotin ku "Mela Eliyê Teremaxî di ilmê nehwê de bi kurdî *Terkîb* û *Zurûf* nivîsîne, li gorî rîwayetekê ew yê Mela Yûnus el-Irkîtinî [Helqetînî] ne."¹¹⁵ Qanatê Kurdo Eliyê Teremaxî di nav helbestvanê kurd de nîşan dide û diyar dike ku Teremaxî digel rêzimanên kurdî û erebî helbestên "Qewlê Yekane", "Kurêd Weten", "Moriya Yaqût", û "Jiyana Heqîqet Xewn e" nivîsîne.¹¹⁶ Izzedîn Mustafa Resûl gumana xwe diyar dike derbarê van qesîdeyan de yê ku Loîs Pol Margret û (K.A.B)[Kamûran Alî Bedirxan] ew wergerandine Firansîzî û di pirtûka xwe ya bi navê *Dîrasat Fî'l-Edebî'l-Kurdî* de weşandine. Tişta gumanê dide Resûl; ji ber ku berî wê di tu kitêban de kesî wekî şair behsa Elî Termûkî[Eliyê Teremaxî] nekiriye.¹¹⁷ Reşîd Findî jî rexne li Loîs Pol Margret û Kamûran Alî Bedirxan digre ji ber ku nisbeta van helbestan dane bi aliyê Elî Termûkî[Eliyê Teremaxî] ve, Findî diyar dike ku mumkun e ev helbest yê Elî Herîrî bin û bi şaşî nisbeta wan bi aliyê Eliyê Teremaxî ve hatibin dayîn.¹¹⁸

¹¹³ Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2002.

¹¹⁴ Adak, r. 305.

¹¹⁵ Tatvan Medine Medresesi, h. ç.

¹¹⁶ Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Amed 2010, r. 23.

¹¹⁷ Izzedîn Mustafa Resûl, *el-Waqî' Fî'l-Edebî'l-Kurdî*, Dar Aras, Erbil 2010, r. 54.

¹¹⁸ Findî, h. b. , r. 11-13.

BEŞA SÊYEM

TEYBETMENDIYA ZIMANÎ YA TESRÎFA ELİYÊ TEREMAXÎ

Mirov dikare ji gelek aliyan ve zimanê pirtûkê dahurîne. Ji ber ku kurdiya kurmancî di pirtûkê de ji bo zimanê erebî, farisî û helbet kurdî jî wekî alet hatiye bikaranîn hinek mekanîkî ye, ev yek. Teremaxî li gelek cî û deveran tehsîla ilm kiriye, vê yekê tesîr li xwerûtiya zimanê wî kiriye, ev yeka din. A sêyem Teremax gundê ku Eliyê Teremaxî lê mezin bûye gundekî Muksê ye, Muks di sînore Hekarî û serhedan de ye, ev jî dihêle ku devoka wî nerm bibe. Yeke dîtir, bandora devoka medreseyan Kurdistanê ye. Digel van, gava em asta zanîstî ya Eliyê Teremaxî bigirin ber çav lêkolîneke tekûz xwe li ser me ferz dike.

1. Tesrîfa Teremaxî ji Hêla Şêwe û Şêwezariyê ve

Teremaxî kurmanc e. Zaravayê kurmanciya jorî bi kar anîye. Digel ku şêweya Çolemêrgê şixulandiye jî bandora devoka medreseyan di pirtûkê de serdest e. Wekî tê zanîn di devoka Çolemêrgê de qertafa pirjimari *-ên* wekî *-êd*, qertafa kesane *-bin* wekî *-bit* tên bi kar anîn. Tewanga navdêrên nêreze bi gerta *-îyê* tê destnîşankirin, wekî emîrî, îsmuzemanî. Lêker bi paşqertafa *-tinê* diqedin, wekî *têtin* û *buxutin*. Û hwd. Ji *Tesrîfa Teremaxî* çend heb mînakên şêweya Çolemêrgê:

*Li van mîsalêd ku hatine gotin tene qiyaskirin, teşniye û cem'êd wan bi vê terzê tîn.*¹¹⁹

*Teşniya îsmuzemanî jî bi "y" û "n" ûnan têtin.*¹²⁰

¹¹⁹ Xeznedar, r. 31.

*Yanî dê niha **buxutin**.*¹²¹

***Van** îsmufa‘il û îsmumef‘ûlan jî wezn **heye**.*¹²²

***Evene** ji boyî tehqîq in.*¹²³

*Yanî ehlê **bajêrî** hemû hatine îla hatina **emîrî** meşkûk e.*¹²⁴ Li vir bajêrî du car hatiye tewandin, diyar e bandora şeweyê ye.

*Yanî feyde û xêr di vê **şolê** de nînin.*¹²⁵

*Yanî xundkar nisretê **nadite** me.*¹²⁶

*Ew jî me‘na ‘înde û **nik** e.*¹²⁷

*Ji boyî teşniya **muennesêd** haqîr e, yanî bi tehqîq hûn herdu **jinêd** haqîr e.*¹²⁸

***Demayirêd** gayib **êd** zimanê kurmancî.*¹²⁹

*Me‘lûmê te bibî ey talibê ‘ilmê şerfê ku ev ‘ilme zêde feneki muşkil e û zaf şîge û î‘lal û tebdîlat û zemîr û keyfîyat **heyin**.*¹³⁰

*Lewranê **şa‘irêd** tirkan gotine ku “ev beyta tirkî di ‘ilmê şerfê da **bit**.*¹³¹

***Zîkrê** şerfa ‘erebî û farisî û kurmancî digel **yekûdu** hatiye kirin.*¹³²

Devoka medreseyan: Wekî tê zanîn li medreseyan Kurdistanê ji mêj ve telîm û tadrîs hatiye kirin. Vê yekê hiştiye devokeke çêkirî ya ku ziman wekî amûr bi kar tîne pêk were. Îro jî gava mirov li berhemên medreseyan dinihêre kême zêde ev devok aşkere xuya dike. Divê bê gotin ku uslûb û devoka medreseyan hêjayî xebat û lêkolînên zanîstî yên serbixwe ne. Çend numûne ji *Tesrîfa Teremaxî*:

¹²⁰ H. b. , r. 33.

¹²¹ H. b. , r. 32.

¹²² H. b. , r. 35.

¹²³ H. b. , r. 42.

¹²⁴ H. b. , r. 43.

¹²⁵ H. b. , r. 43.

¹²⁶ H. b. , r. 42.

¹²⁷ H. b. , r. 43.

¹²⁸ H. b. , r. 45.

¹²⁹ H. b. , r. 51.

¹³⁰ H. b. , r. 53.

¹³¹ H. b. , r. 54.

¹³² H. b. , r. 30.

1. 1. Bikaranîna Erebi û Kurdî Digel Hev:

*Î'lem! Tu bizan! Ey mufredê muzekkerê muxatteb.*¹³³

*Şerf di lugetêd 'ereban da, tehwîlu'l-eşlî'l-wahidî îla emşîletîn muxtelîfetîn yanî; Wergerandina eşlekî bi tenê ye, bi bal mîsaline terz bi terz, mesela weku îsm be ji wî îsmî mufred û teşniye û cem' û muzekker û muennes têtin.*¹³⁴

*Îsmucins nav e ji boyî cinsekî min heysu'l-mecmu' we'l-efrad. Yanî ew nav ji mecmu'ê ra jî tête gotin û ji ferdekî ra jî tête gotin.*¹³⁵

*Fî'la şulaşî ku sêherfî ye.*¹³⁶

*Îsmumef'ûl jî nav e ji boyî wî kesî û ji boyî wî menê ku ew fê'l li ser wî waqî' dibi.*¹³⁷

1. 2. Term û Têgihên Alîkar ên Vegotinê:

*Tu bizan.*¹³⁸

*Me'lûm bibe.*¹³⁹

*Ji boyî te beyan bikim.*¹⁴⁰

*Weku niha.*¹⁴¹

*Lakîn.*¹⁴²

*Lewra.*¹⁴³

*Ma'lûmê te bû.*¹⁴⁴

*Îcarê.*¹⁴⁵

¹³³ H. b. , r. 29.

¹³⁴ H. b. , r. 30.

¹³⁵ H. b. , r. 32.

¹³⁶ H. b. , r. 34.

¹³⁷ H. b. , r. 38.

¹³⁸ H. b. , r. 29.

¹³⁹ H. b. , r. 30.

¹⁴⁰ H. b. , r. 34.

¹⁴¹ H. b. , r. 35.

¹⁴² H. b. , r. 31.

¹⁴³ H. b. , r. 32.

¹⁴⁴ H. b. , r. 41.

1. 3. Teşe û Qalibên Vegotinê:

*Îsmûzeman ew lefz e ku mexşûş e bi zemanî.*¹⁴⁶

*Îsm ew e ku nav e ji boyî tiştê ku tête ‘emilandin.*¹⁴⁷

*Mşsder goya eşlê fi ‘lê ye.*¹⁴⁸

*Fi‘la mute ‘ddî dixwaze fa‘il û mefû‘l.*¹⁴⁹

*Lazim e zikir û beyana îsmûmef‘ûlî.*¹⁵⁰

*Ew jî bi me‘na ma‘eda ye.*¹⁵¹

*Ew lefz delaletê li ser me‘nayê bike.*¹⁵²

1. 4. Ji Bo Hînbûn û Çavnasiyê Bikaranîna Term û Tabîrên Biyanî:

Şîrovekirina, zêde bikaranîna term û tabîrên biyanî, wekî qelsiya zimanê ku pê tê hînkirin dê rastiyê bi temamî îzah neke, lewre heman uslûb bi xwe re hînbûn û çavnasiya têgeh û tabîran jî tîne. Wekî niha:

*Îsmufa‘il yanî **nav** e ji boyî fa‘ilê fê‘lê.*¹⁵³

Di vê mînakê de “nav” hatiye bikaranîn, ji ber ku ne wekî têgeh hatiye bikaranîn. Lê di mînaka li jêr de “îsm” hatiye bikaranîn, ji ber ku têgeh e.

*Îsm jî şeş new‘ in: ‘Elem, kunye, îsmucins, îsmuzeman, îsmumekan, îsmualet.*¹⁵⁴

*Fi‘l, **mechûl** jî heye. Mechûl ew fi‘l e ku **fa‘il me‘lûm** nîne.*¹⁵⁵

***Emr û nehî** jî ji **fi‘êla muḍarî‘** têtin. Lakin ji **fi‘la mazî** emr û nehî nabî.*¹⁵⁶

¹⁴⁵ H. b. , r. 30.

¹⁴⁶ H. b. , r. 33.

¹⁴⁷ H. b. , r. 33.

¹⁴⁸ H. b. , r. 48.

¹⁴⁹ H. b. , r. 35.

¹⁵⁰ H. b. , r. 38.

¹⁵¹ H. b. , r. 43.

¹⁵² H. b. , r. 30.

¹⁵³ H. b. , r. 37.

¹⁵⁴ H. b. , r. 30.

¹⁵⁵ H. b. , r. 35.

*Yanî bikut ey mufredê muzekkerê muxaṭeb.*¹⁵⁷

*Yanî bikutin ey teşniye muennesêd muxaṭeb.*¹⁵⁸

*Û ji boyî mufredê muzekkerê muxaṭeb û ji boyî teşniya muzekkerêd muxaṭeb
û ji boyî cem‘a muzekkerêd muxaṭeb û ji boyî mufredê muennesêd muxaṭeb û ji boyî
teşniye û cem‘a muennesêd muxaṭeb lezz “t”a ye.*¹⁵⁹

*Xanî zerf e û tu meẓrûf î.*¹⁶⁰

*Me‘lûmê te bibe ku di zimanê farisî da jî fê‘l û fa‘il û meşder û îsmufa‘il û
îsmumef‘ûl û maḍî û muḍarî‘ û emr û nehiy û ġaûb û ḥazir û mufred û teşniye û
cem û zemîr ev hemû hene.*¹⁶¹

2. Dahurandina Tesrîfa Teremaxî ji Alî Rêzimanî ve

Divê ji bîra me neçe ku Teremaxî ev pirtûk ji bo zarok û yên ku nû dest bi xwendinê bikin amade kiriye.¹⁶² Ji ber vê yekê, dibe ku piraniya mijaran bi awayekî kemilî hilnegirtibe dest. Teremaxî dibêje: “Qismê kelam û xeberdanê herçî ku heye, sê new‘ in: Îsm û fê‘l û herf. Ji van hersêyan zêde, îdî new‘ê xeberdanê nabî.”¹⁶³ Em ê jî di vê dahurandinê de vê sinifandinê li ber çavan bigirin.

2. 1. Îsm/Navdêr

Teremaxî navên erebî li şeş qisman parve dike: ‘Elem, kunye, îsmucins, îsmuzeman, îsmumekan û îsmualet. Her yek ji van jî ji aliyê yekjimarî, dujimarî, pirjimarî, hazirî, nehazirî û bervêderiyê ve şîrove dike û dinirxîne.¹⁶⁴ Bi vê pêrabûnê du mebestên nivîskar hene, bi gotina wî: “Ev behsekî cizwî bû di keyfîyeta *îsmê* da ji zimanê ‘erebî hate beyankirin ji boyî muḥteyîyêd ekradan, da bi qewa‘îdê ‘ilmê şerfiye aşîna bibin û ewê qewa‘îdê jî bi heysu‘l-îmkan di lîsanê farisî û kurmancî da

¹⁵⁶ H. b. , r. 35.

¹⁵⁷ H. b. , r. 39.

¹⁵⁸ H. b. , r. 39.

¹⁵⁹ H. b. , r. 41.

¹⁶⁰ H. b. , r. 44.

¹⁶¹ H. b. , r. 46.

¹⁶² H. b. , r. 46-48.

¹⁶³ H. b. , r. 15.

¹⁶⁴ H. b. , r. 16-21.

jî îcra bikin.”¹⁶⁵ Çavnasiya ilmê serfê ji bo yên nû dest pê dikin û bikaranîna rêbazên erebî di farisî û kurmancî de.

Piştî wî behsa navdêra luxetê farisî û kurmancî dike. Di vir de ji nirxandin û şîroveyê bêtir cihêrengiya navên farisî û kurmanciyê ji hev û ji erebiyê diyar dike: “Me’lûmê te bibe ku îsmêd vî zimanî [farisî] jî mufred û teşniye û cem’ dibin, lakin muzekker û muennes ferq çu nîne. Weku niha”:

*Ġuk, mufred e. Ġukan û Ġukha cem’ e çi muzekker çi muennes.*¹⁶⁶

Esmayên kurmancî jî mufred cuda ne, weku niha:

“Merif” û “dar” û “hesp”. Evne mufred in, yanî ferdek ji van. Lakin teşniye û cem’êd wan jî weku farisiyan bi “**elîf**” û “**n**”ûnan têtin, weku niha: “*Merifan, daran, hespan*”.

“Evne ji boyî teşniyeyê jî û cem’ê jî têtin û ferqa muzekker û muennesê jî nabî. Yanî ji vana herdu û yanî ji vana cima’etik, herdu jî dibin.”¹⁶⁷

Wekî tê dîtîn behsa navdêrê bi danberheva rêbazên erebî û farisî dorsînor maye. Tenê mînaka yekjimarî, dujimarî û pirjimariyê hatiye dayin, ew jî ne bi rêk û pêk, lê em di metnê pirtûkê de dibînin ku musenif ji aliyê rêzimanî ve navdêran gelek rast û durist bi kar anîne. Şîroveya berfireh a vê mijarê em ji ciyê wê re dihêlin. Îcarê em li gorî teksta pirtûkê û bikaranîna nivîskar navdêrê hilgirin dest.

2. 1. 1. Navdêr li Gorî Mêjer, Zayend û Wesfandinê

“Di kurmancî de navdêrên yekjimar dema ku xwerû bin, nêtar in. Di dema ravekê de zayenda wan diyar dibe. Dema ku binavkirî bin tu qertafan nagirin, lê dema ku ne binavkirî bin, qertafa “-ek” digirin. Wekî din yekjimariya navdêran bi alîkariya tewang û veqetandekê tê nîşandan. Ligel yekjimariya navdêran zayenda wan jî diyar dibe.”¹⁶⁸ Mînakên ji *Tesrîfa Teremaxî*:

¹⁶⁵ H. b. , r. 21.

¹⁶⁶ H. b. , r. 51.

¹⁶⁷ H. b. , r. 51.

¹⁶⁸ Samî Tan, **Rêzimana Kurmancî**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2011, r. 97.

*Merif.*¹⁶⁹ (Yekjimar, xwerû û nêtar.)

*Kesek.*¹⁷⁰ (Yekjimar, nexwerû, nebinavkirî û nêtar.)

*Xeberdana rast.*¹⁷¹ (Yekjimar, binavkirî û mê.)

*Zimanê kurmancî.*¹⁷² (Yekjimar, binavkirî û nêr.)

Lefzeke ‘erebî.¹⁷³ (Yekjimar, nebinavkirî û mê.)

*Ev bahsekî cizwî bû.*¹⁷⁴ (Yekjimar, nebinavkirî û nêr.) Zayend şaş hatiye bikaranîn.

*Zikra şîgene pêkve beyan dibe.*¹⁷⁵ (Pirjimar û nebinavkirî.)

*‘Ilmê şerfê.*¹⁷⁶ (Yekjimar, tewandî û mê)

*Di behsa îsmuzemanî da ye.*¹⁷⁷ (Yekjimar, tewandî û nêr.)

*Tayîfa Ekradan.*¹⁷⁸ (Pirjimar û tewandî.)

Her çiqas Teremaxî mêjeran bi riya veqetandek û tewangan rast bi kar tîne jî, lê di lihevkirina kirde û lêkerê de di gelek ciyan de bi awayekî din tevdigere. Wekî neha:

*Fi‘la muḍari‘ jî, me‘lûm û meḥûl dibin.*¹⁷⁹ (Kirde û lêker li hev nakin.)

*Ev ḥusn û qubḥ ji fa‘ilî cuda nabî û li ser kesekî waq‘î nabî.*¹⁸⁰ (Kirde û lêker li hev nakin.)

*Evene şîge û elfazêd fîla sulasiyê mucerred bû hate beyankirin.*¹⁸¹ (Kirde û lêker li hev nakin)

¹⁶⁹ Xeznedar, r. 51.

¹⁷⁰ H. b. , r. 29.

¹⁷¹ H. b. , r. 29.

¹⁷² H. b. , r. 29.

¹⁷³ H. b. , r. 29.

¹⁷⁴ H. b. , r. 33.

¹⁷⁵ H. b. , r. 37.

¹⁷⁶ H. b. , r. 29.

¹⁷⁷ H. b. , r. 33.

¹⁷⁸ H. b. , r. 29.

¹⁷⁹ H. b. , r. 33.

¹⁸⁰ H. b. , r. 29.

*Van îsmufa‘il û îsmumef‘ûlan jî wezn heyê.*¹⁸² (Kirde û lêker li hev nakin.)

*Di beḥsa edat û ‘lametêd f‘ila muḍar‘i da ne.*¹⁸³ (Kirde û lêker li hev nakin.)

*Yanî qewm razî ne.*¹⁸⁴ (Kirde û lêker li hev nakin.)

2. 2. Cînavk

Ji bo nîrxandineke baştir em pênaseya cînavkan bi bîr binin:

“Cînav dikevin nava kevintirîn beşa bêjeyên ferhengî. Ji aliyê wate û nîşaneyên rêzimanî ve bi nav, hevalnav û jimareyê ve girêdayî ne û weku cîgirê van beşên axiftinê tîn bikaranîn û kategoriyên mêjer, zayend, nasyerî û nenasyeriyê nîşan didin. Cînav ji aliyê nîşaneyê rêzimanî û erkên rêzimanî ve li ser beşên kesî, nîşane, pîrsiyarî, pêve, nediyar, xwe, hev, diyar, çendî û neyînî ve dabeş dibin... Rewşa xwerû û tewandiya van cînavan di diyalekta kurmanciya Jorîn de li ber çavan dikeve”¹⁸⁵:

Kurmancî			Soranî
Yekjimar			
	Rewşa Xwerû	Rewşa Tewandî	
Kesê yekem	Ez	min	(e)min
Kesê duyem	Tu	te	(e)to
Kesê sêyem	Ew	wê (ji bo mê), wî (ji bo nêr)	Ew
Gelejmar			
	Rewşa Xwerû	Rewşa Tewandî	

¹⁸¹ H. b. , r. 40.

¹⁸² H. b. , r. 35.

¹⁸³ H. b. , r. 41.

¹⁸⁴ H. b. , r. 43.

¹⁸⁵ Qanatê Kurdo, *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*, Weşanxaneya Nûbihar, Îstanbul 2013, r. 115-116.

Kesê yekem	Em	me	ême
Kesê duyem	Hûn	we	êwe
Kesê sêyem	Ewan	wan	ewan

Teremaxî, cînavk ne li gorî tewangbarî û xwerûtiya wan ew sinifandine, li gorî rewşa wan a hazir û nehazir kategorîze kirine. Ê ji dêvla li ser teybetmendiyên cînavkên kurmancî bisekine rasterast ew bi yên erebî û farisî re muqayese kirine. Baştir e ku em cînavkên di *Tesrîfa Teremaxî* de derbas dibin bidin ser hev:

1. Cînavkên bi lêkera dema niha re tîbî bikaranîn: *Tu, ew, hûn, ewan, em, me.*¹⁸⁶
2. Cînavkên nehazir: *Ew, ewî, wan, ewan.*¹⁸⁷
3. Cînavkên hazir: *Tu, ez, em, hûn.*¹⁸⁸
4. Cînavkên şanîdanê: *Ev, evene/evana, ew, wehe, wan/ewan.*¹⁸⁹

2. 2. 1. Cînavkên bi Lêkera Dema Niha re Tîbî Bikaranîn

Teremaxî wiha dibêje, “Di kelimê ‘erebî da dayîm mufred û tesnîye û gayîb û hazir û mutelîm ji tekelumê ferq dibin, lewra ‘elamet hene. Emma di lugetêd mayî wusa nîn in, lazim e cizwek ji wan jî bête beyankirin.”¹⁹⁰ Ê pêde diçe; “di zimanê kurmancî da pênc şîge bi der dikevin, zêde nabî weku niha: *Diçî, diçe, diçîn, diçim, diçîn.* Ef‘alêd mayî jî li van qiyas bike. Evane pênc şîgan jî demayirêd kurmancî hene. Weku niha: *Tu, ew, hûn, ewan, em, me.* Eve şeş demîr jî demayirêd wan ef‘alan e digel wan tîbe ‘emilandin.”¹⁹¹ Lê dema em van cînavkan dixin ber lêkeran em dibînin ku hinek cînavk û lêker li hev nakin, ji ber ku lêkera “çûn”ê negerguhêz e

¹⁸⁶ h. b. r. 47.

¹⁸⁷ h. b. r. 51.

¹⁸⁸ h. b. r. 51.

¹⁸⁹ h. b. r. 52.

¹⁹⁰ h. b. r. 42.

¹⁹¹ h. b. r. 47.

divê digel cînavkên xwerû were bikaranîn lê çawa tên dîtîn cînavka “ewan” (Qanatê Kurdo ne tê de¹⁹², li gorî zimanzanên din) û cînavka “me” tewandî ne:

Tu diçî. (Li hev dîkin)

Ew diçe. (Li hev dîkin)

Hûn diçin. (Li hev dîkin)

Ewan diçin. (Ku cînavka “ewan” tewandî bê pejirandin li hev nakin)

Em diçîn. (Li hev dîkin)

*Me diçîn.*¹⁹³ (Li hev nakin)

2. 2. 2. Cînavkên Nehazir

Baweriya Teremaxî ew e ku cînavkên kurmancî jî -qet nebe yê nehazir- wekî cînavkên farisî ne, lewre wiha dibêje: “Demayirêd gayib êd zimanê kurmancî jî, hisêb ke weku zimanê farisî ye.”¹⁹⁴ Derbarê cînavkên farisî yê nehazir de wiha jî dibêje; ferqa yekjimarî, dujimarî û pirjimariyê heye, lê ferqa nêrîtî û meyîtîyê nîn e¹⁹⁵ û mînakên ji farisiyê dide:

Û (و), yanî yekjimariya neḥazir.

*Anha(ئەوان), yanî dujimarî û pirjimariya nêr û meyên neḥazir.*¹⁹⁶

Îcarê em dizanin ku di cînavkên kurmancî yê tewandî yê kesê sêyemîn ên yekjimar de nêrîtî û meyîtî diyar in:

Wê, yanî kesê sêyemîn, yekjimar û mê.

Wî, yanî kesê sêyemîn, yekjimar û nêr.

¹⁹² Dibe ku Qanatê Kurdo bi xwe jî di bikaranîna vê cînavkê de ji Teremaxî sûd wergirtibe?

¹⁹³ Hêjayê gotinê ye ku, li herêma Xerza bêhtir milê çiya bi taybet li derdora Hezoya Batmanê bilêvkirineke bi vî rengî tê dîtîn, lê ew para zehf di dema borî de formeke bi vî awayî bi kar tînin û mêjerê jî tîk dibin, dibêjin: “Min çû.” “We çû.” “Me çû.” ”Min hat.” “We hat.” “Me hat.” û hwd.

¹⁹⁴ Xeznedar, h. b. , r. 51.

¹⁹⁵ H. b. r. , 50-51.

¹⁹⁶ H. b. r. , 51.

Jixwe Teremaxî bi xwe jî dema cînavkên kurmancî yê nehazir li pey hev rêz dike: “Ew, ewî, wan, ewan” cînavka “ewî” anga cînavka tewandî ya kesê sêyemîn a yekjimar a nêr dide. Û dîsa tê dîtîn ku cînavka “ewê/wê” kêma dihêle.

2. 2. 3. Cînavkên Hazir

Teremaxî ji bo cînavkên hazir ên farisî van mînakên dide:

(To/و تو) û (men/من م) û (ma/ما م) û (şoma/شما ش).¹⁹⁷

Û ji bo cînavkên hazir ên kurmancî jî van mînakên dide:

Tû, ez, em, hûn.

Wekî tê dîtîn Teremaxî cînavkên kurmancî yê tewandî yê hazir “te”, “min”, “me” û “we” jî nedî ve hatiye, wekî di mînakên jêr de tên dîtîn ev cure cînavk dikarin di haziriyê de bînin bikaranîn:

Te ez dîtibûm.

Min tu dîtibû.

Me hûn dîtibûn.

We em dîtibûn.

2. 2. 4. Cînavkên Şanîdanê

Pêşî em bala xwe bidinê ka Eliyê Teremaxî der barê cînavkên şanîdanê de çi dibêje: “Û hem esmau‘l- îşaretêd kurmancî jî hebin, weku niha:

Ev, ji boyî hazirê mufred çih muzekker, çih muennes.

Evene û evana, ji boyî teşniye û cem‘êd haziran bîla ferq.

Ew, ji boyî mufredêd gayîben e bîla ferq.

Wehe, ji boyî mufredê muxaţebê hazire ye bîla ferq.

*Wan-ewan, ev herdu jî ji boyî teşniye û cem‘êd gayiban in bîla ferq.*¹⁹⁸

¹⁹⁷ H. b. , r. 51.

Gava em vê destnîşankirina Teremaxî bi xebatên îro re muqayese bikin, em ê rastî gelek cihêrengiyan werin, wekî niha: Teremaxî ev cînavk kêr hîştine:

Vî, ji bo yekjimariya nêr, hazir an nêz.

Vê, ji bo yekjimariya mê, hazir an nêz.

Wî, ji bo yekjimariya nêr, gayib an dûr.

Wê, ji bo yekjimariya mê, xayib an dûr.¹⁹⁹

Ji aliyê din ve Teremaxî cînavka “wehe”, ji bo yekjimariya nêr û mêyên muxateb ên hazir/nêz bi kar aniye.²⁰⁰ Ev forma xweser di pirtûkên rêzimanî yên îroyîn de cî nastîne. Dîsa Teremaxî ji bo dujimarî û pirjimariya nêr û mêyên hazir cînavka “evane/evana” bi kar aniye.²⁰¹ Wekî tê dîtin ev cînavka “van” a tewandî ye, ji cînavka xwerû “ev”ê tê, piştî tewiyaye bûye “evan”, “e”ya wê jê ketiye maye “van”. Di nav gel de hêjî wekî “evan”, “evana”, “vanakê”, “evanakê”, û êd. tê bikaranîn.

2. 3. Rewşa Banglêkirinê ya Baneşanan

Di rewşa banglêkirinê de navdêrên ku qertafên navlêkirinê digirin dibin baneşan. Qertafên ku ew digirin li gorî zayend û mêjerê ji hev vediqetin. Navdêrên nêr qertafa “-o” digirin, navdêrên mê qertafa “-ê” û navdêrên pirjimar jî “-ino” digirin. Dema ku em dibêjin “*Hevalê!*”, em qala hevaleke keç, dema dibêjin, “*Hevalo!*” em çêlî hevalekî xort û dema em dibêjin, “*Hevalino!*” jî em çêlî çend hevalan dikin”.²⁰²

Teremaxî wiha behsa baneşanê dike: “Di zimanê kurmancî jî, herfa nîdayê lefzê(o) [ye], weku niha dibêjî: *O Miho, o ‘Eyşê*, “ya” [bi latînî “ê” ye] ya di axirê [Eyşê] da elametê tenîsê ye.”²⁰³

¹⁹⁸ Xeznedar, r. 51-52.

¹⁹⁹ Kadri Yıldırım, **Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)**, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2012, r. 234-235.

²⁰⁰ Xeznedar, r. 52.

²⁰¹ H. b. , r. 52.

²⁰² Tan, r. 198.

²⁰³ Xeznedar, r. 52.

Teremaxî balê dikişîne ser qertafa mêyîtiyê ya ku bi dawiya navan ve dibe ku bi tîpa erebî “y” ye, em îro bi tîpa latînî heman dengî bi “ê” nîşan didin, lê tîpa “o”ya ku baneşaniya nêrîtiyê ye tîne ber nav. Diyar e ji gel çawa bihîstiye wisa lê kiriye, lewre îro jî gel vê yekê wekî xeletiyê meşhûr bi kar tîne. Û Teremaxî jixwe behsa baneşana pirjimariyê “ino” qet nake, wekî mînak:

*Hevalino an **geli** hevalan!*



BEŞA ÇAREM

A- METNA TRANSKRÎBEKIRÎ YA TESRÎFA TEREMAXÎ

HAZA KÎTABU ‘ÎBARETÎ ‘ELÎ TEREMAXÎ

HAZA KÎTABU ŞERFÎ LÎSANÊ KURDÎ

Bîsmîllahîrrehmanirrehîm

Î‘lem tu bizan ey mufredê muzekker ê muxateb ku ji boy tayîfa ekradan ra jî lazim e ku bi zimanê kurmançî ew ji ‘ilmê şerfê bizanin, lewra bina û esasa hemû ‘ilman, li ser ‘ilmê şerfê ye. ‘Îlm, hesêb ke weku mêzên e ji boy ‘ilûmêd mayî ra. Finûnêd be ‘ilmê şerf tene wezinandin ku dirist û geletîya wî ‘ilmî û xeberdana wî kelimî rast û dirist bibe, lewra weku tiştê neête wezinandin kesek temam û kêmasiya wî nizane. Bes weku ha ye, wacib e ku mirov ‘ilmê şerfê bizane da tekelum û xeberdana rast û dirist bibe. Bê ‘ilmê şerf ê kelim dirist nabî, lewra lazim e ku tu weq‘a xeberdanê bizanî, mesele mufred û teşniye û cem‘an ferq bikî û bizanî. Û gayib û hadirî ji yekûdû cuda bikî û muzekker û muennesê ji hevdû veqetînî ku heta xeberdana rast û dirist bibe. Mesele: Eger tu nizanî bi lefza mufredê digel teşniye û cem‘ê xeber bidî, kelimê te gelet dibî û cehla te me‘lûm dibe. Ev ‘ilm, şerf di hemû kafêd lisanan da heye û icra dibe. Emma ê ku niha ji boy me lazim e, zimanê kurmançî ye, lakin lazim e ku be‘dek ji zimanê ‘erebî û farisî mîsalan bînin, lewra ev ‘ilm, şerf bi eşl û îbtîda di zimanê ‘erebî da bûye û elfazêd ku lazim e ji boy ‘ilmê

şerf ê elfazêd ‘erebî ne. Meşela lefz: Fi‘l, îsim, herf, fa‘il, mef‘ûl, îsmufaîl, îsmumef‘ûl, demîr, êdî gelek elfazêd ‘erebî hene ku elbete lazim e ew elfaz di ‘ilmê şerf ê da bêne zikiririn, bilanê şerf a farisî û kurmancî jî bitin ji boy vî sebebî. Zîkrê şerfa ‘erebî û farisî û kurmancî digel yekûdû hatiye kirin. Şerf di lugetêd ‘ereban da (tehwîlu‘l-eşlî‘l-wahîdî îla emsîletîn muxtelîfetîn) yanî: Wergerandina eşlekî bi tenê ye, bi bal mîsaline terz bi terz, meşela weku îsim be ji wî îsmî mufred û teşniye û cem‘ û muzekker û muennes têtin. Eger lefzek ‘erebî fi‘l bibe şanzdeh sîge, yanî lefz ji wê fi‘lê peyda dibe, di cih de tete beyankirin. Emma ef‘alêd farisî, fîrqa muzekker û muennesê nabî, lakin fîrqa hađir û ğayib û mufred û cem‘ê dibe, ji fi‘lekî farisî çar sîge peyda dibe, yanî çar lefz peyda dibe. Ew jî ji niha bi şûn ve di cih da tete beyankirin. Lakin ji ef‘alêd kurmancî bi tenê bê demîr du lefz cuda dibin, mufred û cem‘, lakin muzekker û muennes fîrq nabî, îlla ku demîr hebî, wê hingê fîrqa ğayib û hađirî dibe. Weku te ev muqadîme zanî, lazim e ku îcarê mebdâe ‘ilmê şerfê di her sê lugetan da jî bête beyankirin, herçî lefz û xeber ku tekellum pê tete kirin. Eger ji lefzê tenê me‘nayek wahîde fehm dibe, ji wî kelimî ra îsim dibêjin, we îlla eger ji wî lefzî çend me‘nane cuda cuda tete fehmkirin, ji wî kelimî ra fi‘l tete gotin. We îlla eger ew lefz bi xû bi tenê musteqîlen me‘nayekê nade fehmandin, belkû muhtac e bi alî lefzekî ku jî îbtîda û yanî di axirê bi wî lefzî bizeliqe paşî ew lefz delaletê li ser me‘nayê bike, ji wî lefzî ra herf dibêjin. Wekî wiha bû, qismê kelim û xeberdan, herçî ku heye, sê new ‘in: Îsim û fi‘l û herf. Ji van her sêyan zêde, îdî new‘ê xeberdanê nabî. Elbete yan îsim yan fi‘l ji van sê qisman zêdetir qet xeberdan tune û nabî îcadî. Evan her sê qisemêd elfazan, be tertîb, zikir û beyan bikin da qewa‘idêd wan me‘lûm bibe.

ÎSMUTE‘RÎF Û BEYANA WÊ

Îsim jî şeş new‘ in: ‘Elem, kunye, îsmucins, îsmuzeman, îsmumekan, îsmualet. ‘Elem: Ew e ku bi tenê mexşûşê nav e ji boy mirovekî me‘lûm û mu‘eyyen meşela: Yûsuf û Hesen. Ji vî lefzî ew mirovê mu‘eyyen tete fehmkirin, îdî zêde me‘nayek fehm nabî. Eve îsmane jî mufred û teşniye û cem‘ dibin. Meşela, mufred: Yûsuf û Hesen ferdek. Teşniyeya îsman bi “y”²⁰⁴ a û “n”ûnan têtin, meşela: Yûsufeyn û Heseneyn, du mirovêd navê Yûsuf û Hesen mirad dibe. Ê cem‘a îsman jî bi “w”aw û

²⁰⁴ Ev nîşaneyên dunikê “ ” di eslê metnê de tunene; me lê zêde kirine.

“n”ûnan dibe, dibêjin: Yûsufûn û Hesenûn, mirad birrek herfêd navêd wan Yûsûf û Hesen dibe. Îslîm[Îsim] yanî ‘elem û nav jî muzekker û muennes dibin, lakin du ‘elamet û nîşanêd te’nîsê di axirê ismê da lazim e “ha”yin weyaxû “ta”yin dibe, ji wê ‘elametê me’lûm dike ku xweyê vî navî jin e. Mîsala ku ‘elametê te’nîsê di axirê lefzê “ha” be, mesela: Faîmeh, Xedîceh, ‘Aîşeh, ji vê “ha”yê me’lûm dike ku xweyê vî navî jin e. Ev îsmê di muennesan jî mufred û teşniye û cem‘ dibin, lakin teşniya muennesan bi lefzê “teyn” dibe, mesela: Faîmeteyn, Xedîceteyn, ‘Aîşeteyn, yanî du jinêd bi van navan. Cem‘a navêd jinan jî bi “elîftan”dibin, mesela: Fatîmat û Xedîcat û ‘Aîşat, yanî ji van îsman birrek jin, mîsala ku ‘elametê te’nîsê nabe, mesela: Telîheh, Esameh, beqereh, evine jî dîsanê teşniye û cem‘ dibin, teşniya wan jî bi lefzê “teyn” têtin. Xulaşê lefzê “teyn” daîma ji boy teşniya muennesan e, mesela: Telîheteyn, Esameteyn, beqereteyn, yanî ji van jinên ku bi van navan in du du, cem‘a van jî dîsanê bi “elîftan” têtin, mesela: Telîhat, Esamat, beqerat, yanî birrek muennesêd bi van navan, û hindik caran dibe ku teşniye bi “elîf” û “nûn”an jî têtin, mesela: Zeyneb û Zeyneban, yanî du jinêd îsim Zeyneb. Xulaşê îsmê ku ‘elem e yanî nav e ji boy şexşekî mu‘eyyen, li van mîsalêd ku hatine gotin tene qiyaskirin, teşniye û cem‘êd wan bi vê terzê tèn.

FEŞIL Di behsa kunyeyê da ye. Me’lûm bibe kunye ku ba niyeta xeberê û fala qencî ye. ‘Eraban ‘adet kirine navêd zarûkêd xû eger nêr û eger mê kunye dikirin. Eger kur bûya, bi lefzê ebû yanî bab, mesela: Ebû ‘Ebdullah û Ebû Yûsuf, yanî eve zarûka mezin bibe û xweyê ewlad bibe, navê kurekî xû Ebdullah weya Yûsuf dabine, lewra tayîfa ‘ereban ku ya ji berê da ev niyeta dikirin. Kunye fala bi xeberê ye û eger ewlad mê bûya bi “umm” yanî dayê kunye dikirin, mesela: Ummu Kulşûm û Ummu Rebî‘e, yanî ev keça mezin bibe û ewladekî mê biwelidîne û navê wê Ummu Kulşûm û Ummu Rebî‘e dabine, me‘na yanî Da Kulşûm û Da Rebî‘eyê. Tu bizan ku ev kunye jî muzekker û muennes û mufred û teşniye û cem‘ dibin, mesela: Ebu ‘Ebdulaheyn û Ebu Yûsufeyn teşniye ye bi “y”a û “n”ûnan. Ê cem‘ dibe bi “elîf” û “tan”, mesela: Ebu ‘Ebdullahat û Ebu Yûsufat, teşniya muennesan jî dîsanê bi lefzê teyn dibe, mesela: Ummu Kulşûmeteyn û Ummu Rebî‘eteyn, yanî du jinê navê Ummu Kulşûm û du jinê Ummu Rebî‘e. Ê cem‘a kunya jinan jî dîsanê bi “elîf” û “tan” têtin, mesela: Ummu Kulşûmat û Ummu Rebî‘at, yanî birrek jinêd navê Ummu Kulşûm û Ummu Rebî‘e.

FEŞIL Di beḥsa îsmucins da ye, îsmucins nav e ji boy cinsekî mîn heysu'l-mecmu' we'l-efrad, yanî ew nav ji mecmû'ê ra jî têtê gotin û ji ferdekî ra jî têtê gotin, meşela: Feres û hebeş, feres îsim e ji boy cinsê hesp, gelawnav e ji boy hespekî jî, û hebeş nav e ji boy mecmû'ê hebeşîyan û dibêjine ferdekî ji hebeşîyan. Teşniya îsmucinsêd zîrûhan bi "y" a û "n" ûnan dibe, meşela: Fereseyn û hebeşeyn, lakin cem'a îsmucinsêd zîrûhan bi "elîf" têtin, meşela: Efras û eḥbaş, yanî birrek hespan û birrek hebeşîyan ku mirad pê cem 'e, û îsmucinsêd camîdatan yanî bêruhan, weku qelem û 'elem û hecer û şecer, teşniya van jî bi "y" a û "n" ûnan dibe, meşela: Qelemeyn û 'elemeyn û hecereyn û şecereyn, yanî ji her yekê ji van dû dû, lakin cem'a îsmicinsêd camîdatan dîsanê weku zîrûhan bi "elîf" dibe, meşela: Eqlam û e'lam û eḥcar û eşcar têtê gotin.

FEŞIL Di beḥsa îsmuzemanî da ye. Îsmuzeman ew lefz e ku mexşûş e bi zemanî, meşela: 'Eşr û dehr û weqt, ev îsmuzeman xaş e bi tenê bi zemanî, ew jî tensîye û cem' dibin, teşniya îsmuzemanî jî bi "y" a û "n" ûnan têtin, meşela: 'Esreyn, dehreyn, weqteyn, ya du weqtan. Cem'a îsmuzemanî ew jî bi "elîf" têtin, meşela: E'şar, edhar, ewqat, gelek zeman têne miradkirin.

FEŞIL Di beḥsa îsmumekanî da ye. Îsim mexşûş e bi navê cihan, meşela: Meşrîq, meḡrib, meclis, yanî cihê bi derketina rojê û cihê gurûba şemsê û cihê 'eqda meclisê. Ev îsmumekan jî her çi hene, ew jî teşniye û cem' dibin. Teşniye, meşela: Meşrîqeyn û meḡribeyn û meclîseyn, bi "y" a û "n" ûnan teşniye dibin, lakin cem'a îsmumekanî jî bi "elîf" têtin, meşela: Meşariq û meḡarib û mecalis, yanî zaf meşriq û meḡrib û meclis mirad e, lewra mirad ji cem'ê zafî ye.

FEŞIL Di beḥsa îsmualetê da ye. Îsim ew e ku nav e ji boy tiştê ku têtê 'emilandin. Îsmuale jî teşniye û cem' dibin, meşela: Seyf, qews, rimḥ, teşniyeya îsmualetê jî bi "y" a û "n" ûnan têtin, meşela: Seyfeyn, qewseyn, rimḥeyn, yanî ji van her yekê dû dû mirad e û cem'a îsmualetê jî bi "elîf" têtin, meşela: Eşyaf, eqwas, rimah, yanî ji her yekê ji van birrek û gelek mirad dibe. Eve beḥsekî cizwî bû di keyfiyeta îsmê da ji zimanê 'erebî hate beyankirin ji boy mubtedêd ekradan, da bi qewa'idê 'ilmê şerfiye aşîna bibin û ewê qewa'idê jî bi heysu'l-îmkan di lîsanê farisî û kurmancî da jî îcra bikin ḥeta qewetar dikîye [ḥeta qeweta wan bigihîjê] zêde dikan

û kutubêd mu‘teberêd ‘ilmê şerf iye bi zimanê ‘erebî dixûnin û fehm dikin lewra zaf kitêbêd mufesssel ê ‘ilmê şerf iye hene îcarê ew pê zana û ‘alim dibin.

FEŞIL Di behsa fi‘lê da ye, ji boy te beyan bikim ku fi‘l çî ye û çend new‘e û ji boy fi‘lê çend tişt lazim e û çend kelîme ji fi‘lekê cuda dibe û demîrêd her fi‘lekê çî ye ber wechê tefşîl, emmamuxteşer ji kitêbêd ‘erebî îfade dibe, eger Xudê te‘ala tewfîq dide. Fi‘l çend eqsam in, me‘na fi‘lê hedeş e, yanî wuqû‘ata emrekî ye ku peyda dibe. Ewela ji boy fi‘lê meşderê lazim e ku fi‘l bi eqsamêd xû ji wî meşderî şeq bibe, yanî cida bibe. Fi‘l yan şulaşî dibe, yanî sêherfî. Yan ruba‘î dibe, yanî çarherfî dibe. Ji du qisman zêde fi‘la mucered nabî, lakin paşî herfekê û du û siyan lê zêde dikin, ji wê fi‘lê ra mezîdufîhî dibêjin. Fi‘la şulaşî ku sêherfî ye, şulaşî mucerred dibêjin, fi‘la ku ruba‘î û çarherfî ye, rubaî mucerred dibêjin. Eslê fi‘lan ev herdu ne, lakin paşî bi hesbî‘l-lizûm herfekê lê zêde dikin. Eger ew fi‘l di eşil da şulaşî mucerred e bi ziyada herfekê dibe şulaşî mezîdu fîhî be herfekê, mesela: Kereme li wezna fe‘ele, yekremu li wezna yef‘elu. Kerema meşder e, hemû elfaz ji meşderê cuda dibe. Fi‘l bê meşder nabî, elbete meşder lazim e ku fi‘l ji wê şeq bibe, yanî eşl e, me‘lûm e ku ji eşlê fer‘ cida dibe. Meşder herçî ku hene eşl in û kafeyê ef‘alan ji meşderê cuda dibin, yanî meşder, eşl û menşae wê fi‘lê ye, mesela: Mesder kereme bû, elîfek lê zêde bû îcarê bû be ekreme, yekremu, îkramen, li wezna: Ef‘ele, yef‘elu, îf‘alen. Ji vî babî ra, babê ef‘al dibêjin. Weku herfek zêde bû, me‘na jî zêde bûye. Ji vî babî ra, ef‘elutefdîl dibêjin, yanî zêde kerem kir, eve fi‘la kerem mađî, yanî delalet dike ev di zemanê mađî da, yanî di zemanê berî niha borî da kiriye. Fi‘l bi geyr ji mađî jî çend qism hene, lakin fi‘la mađî mexşûş e bi zemanê borî, îlla eqsamêd ef‘alan eve ne ku têne beyankirin. Fi‘la muđari‘ jî heye, fi‘la muđari‘ muşterek e di nêv hadir û îstîqbalê, eger ‘elametekî îstîqbalê digel wê heye, mesela: Yedribu elan, yanî dê niha derb bike. Lefzê elan, elametê hadirî ye. Seyedribu, yanî ji niha bi şûn ve dê derb bike. Fi‘l me‘lûm heye, fi‘la me‘lûm ew e ku fa‘ilî kifş e, mesela weku: Neşere Bekiru, yanî nuşret kiriye Bekirî. Fi‘l mechûl jî heye. Mechûl ew fi‘l e ku fa‘ilî me‘lûm nîne. Ew fi‘l bûye lakin lê kiriye name‘lûme, mesela weku: Surîqe we qutîle yanî hatiye dizîn û hatiye kuştin di zemanê borî da, lakin fa‘ilê wê sirqet û qetlê kifş nîne. Fi‘la muđari‘ jî me‘lûm û mechûl dibin. Mîsala weku me‘lûm bibe weku niha: Yekûnu‘l-emru we yeûdu‘l-mer‘u, yanî: Dê bibe emrê hanê û ‘ewdet bike Fa‘ilê şolê û ‘ewdetê kufş in. Mîsala weku fi‘la muđari‘ mechûl bibe û fa‘ilê wê

name'lûm bibe, weku niha: Yuqtelu we yuđrîbû, yanî dê bête qetilkirin û dê bête kutan, lakin fa'ilê wê fi'lê, name'lûm e. Ji vê fi'lê ra binamef'ûl dibêjin, lewra mef'ûlê wê me'lûm û lakin fa'ilê name'lûm e. Emr û nehî jî ji fi'la muđari' têtin, lakin ji fi'la mađî emr û nehî nabî, lewra ew fi'l bûye û çûye, boriye. Emr û nehî lazim e ku di hađir da bibe weyaxû di musteqbel da bibe ku bête îcrakirin. Mađî îcra bûye, êdî emr di wê da nabî.

FEŞIL Fi'l mute'edî heye û fi'l lazim heye. Fi'la mute'edî dixwaze fa'il û mef'ûl, mute'edî bi me'na mutecawiz e, yanî ji fa'ilê şadir dibe û waqi' dibe li ser mef'ûlê, meşela: Qetele Zeydun Bekiren. Zeyd fa'ilê qetlê ye, lewra qetl jî Zeydî şadir bûye û waqi' bûye li ser Bekirî. Ew Bekir mef'ûl e, lewra Bekir hatiye kuştin. Fi'l lazim heye, fi'la lazim ku di nefsa fa'ilî da ye, ji nefsa xweyî tecawuz nake, ji boy fi'la lazim êdî mef'ûl derûr nîne, meşela weku niha: Hesenun û qebîhun, li wezna fi'l mađî, yanî xweyê husn e û xweyê qubh e, di berî niha ev husn û qubh jî fa'ilî cuda nabî û li ser kesekî waqi' nabî, belkû di nefsa fa'ilî da ye, îdî mef'ûl lazim nîne. Fi'la mađî eger şulaşî mucered û eger ruba'î mucered û eger şulaşî mezîdufîh û eger rûba'î mezîdufîh û eger mute'edî û eger fi'l lazim û eger fi'l muđari', di van mecmû'an da mufred û teşniye û cem' û hađir û ğayib û muzekker û muennes û mutekellimwehdeh û mutekellimme'ğeyrîhî kifş in û her yek in, cuda cuda lefzek heye ku ji lefzê me'lûm dike ku fa'ilê wê fi'lê kî ye û çend in û çi cins e, ğayib û hađir e be tertîb zikir dibe, meşela: Qetele, yanî kuşt, di zemanê borî da, mufredê muzekkerê ğayib, demîra mufredê muzekkerê ğayib (hû) ye. Qetela, yanî kuşt, di zemanê mađî da du nefer muzekkerê di ğayib, demîra teşniya muzekkerêd ğayib (hûma) ye. Qetelû, yanî kuştin, di zemanê borî da, cem'ekî muzekkerêd ğayib, demîra cem'a muzekkerêd ğayib lefzê (hûm). Qetelet, yanî kuşt, di zemanê borî da, mufredê muennesê ğayib, demîra mufredê muennesê ğayib ji[jî] (hî) ye. Qeteleta, yanî kuştin, di zemanê borî da, du nefer jinêd ğayibe, demîra teşniya muennesêd ğayibe jî lefzê (huma) ye. Qetelne, yanî kuştine, cem'ekî muennesêd ğayib, di zemanê borî da, demîra cem'a muennesêd ğayibe (hunne) ye. Qetelte, yanî te kuştiye, ey mufredê muzekkerê muxateb, di zemanê borî da eve xîtabe digel wê hurûfê rûbirû xeber dide, demîra mufredê muzekkerê muxeteb jî (ente) ye. Qeteltuma, yanî we herdukan kuşte, di zemanê borî da, ey herdu muzekkerêd muxateb, demîra teşniya muzekkerêd muxateb jî lefzê (entuma) ye. Qeteltum, yanî

we kuştiye di zemanê borî da, ey cem‘a muzekkerêd muxateb, demîra cem‘a muzekkerêd muxateb ji (entum) e. Qeteltê, yanî te kuşt di zemanê mađî da, ey mufredê muennesê muxateb, demîra mufredê muennesê muxateb jî lefzê (entê) ye. Qeteltuma, yanî we herdukan, ey teşniya muennesêd hađire kuşt di zemanê borî da, demîra teşniya muennesêd hađire jî lefzê (entuma) ye. Qeteltunne, yanî we ceme‘atekê kuşt, ey cem‘a muennesêd hađire di zemanê mađî da, demîra cem‘a muennesêd hađire jî lefzê (entunne). Qeteltu, yanî fi‘l mutekelimwehde ye, min bi tenê kuşt di zemanê borî da, demîra mutekelimwehde jî lefzê (ena) ye. Qetelna, yanî fi‘la mutekelimme‘elgeyr e, yanî me di zemanê borî da kuştin, demîra mutekelim me‘elgeyr jî lefzê (nehnu) ye. Evne çarde sîge ne ku ji fi‘la mađî be tertîb digel demayîrêd xû hatine beyankirin, û dû sîge bi geyr ji van dîsanê ji fi‘la mađî cuda dibe ku şîxa muntehayê cem‘an dibêjin, yanî axirê cem‘an e, weku niha, mesela: Qewatîlu, qewatile dibêjin, yanî cema‘etek ji qatilan, lakin îdî ne me‘lûm e muzekkerî û muennesî. Evne emsalêd fi‘la mute‘edî bûn sîget bi sîge, lakin mîsallekê jî ji fi‘la lazim ji boy te *min heysu’l-mecmû’* zikir bikim da ef‘alêd mayî tu jî li wan qiyas bikî û tertîba şîxêd wan dirist bizanî.

FEŞIL Eve îcarê zikra sîge ne, pêkve beyan dibe û demayir jî mestûr in: Hesenê, Hesena, Hesenû, Hesenet, Heseneta, Hesenne, Hesente, Hesentuma, Hesentum, Hesenê, Hesentuma, Hesentunne, Hesentu, Hesenna. Şîxa muntehayê cem‘an jî hewas in û me‘lûmê te bibe ku fi‘la mezkûrê mute‘edî ku: Qetele bû, û fi‘la mezkûrê lazim ku: Hesenê bû, ew herdu fi‘l jî ev îxêd muxtelîfe her ji meşderê herdu fi‘lan şeq û cuda bûne ku qetl û husn, û cemî‘ê ef‘alê şulaşî û ruba‘î û mezîdufîh pêkve elbete ji meşderê şeq dibin. Bê meşder fi‘l nabî, belkû îsmufa‘il û îsmumef‘ul jî ji meşderê cuda dibin, keyfiyeta îsmufa‘il û îsmumef‘ulê jî ji boy te beyan bikim.

FEŞIL Îsmufa‘il yanî nav e ji boy fa‘ilê fi‘lê, di îsmufa‘ilê da jî mufred û teşniye û cem‘ û muzekker û muennes hene, û şîxa muntehayê cem‘an jî têtin, lakin hađir û gayib, me‘lûm nake mîsala îsmufa‘ilê weku niha: Naşîru, yanî nuşret kire mufredê muzekker. Naşîranî, yanî nuşret kirin teşniya muzekkeran. Naşîrûne, yanî nuşret kirin cem‘ek ji muzekkeran. Naşîretu, yanî nuşret kire ji muennesan mufredê muennes. Naşîretanî, yanî nuşret kirin du nefer ji muennesan. Naşîratun, yanî nuşret

kirin cem‘ekî ji muennesan. Newaşîru, newaşîre, yanî nuşret kirin çend cema‘et ji cem‘an.

FEŞIL Lazim e zikir û beyana îsmumef‘ûlî, îsmumef‘ûl jî nav e ji boy wî kesî û ji boy wî menê ku ew fi‘l li ser wî waqî‘ dibî, îsmumef‘ûl ji mufred û teniye û cem‘ û muzekker û muennes dibe, lakin zeman jê fehm nabî, meger qerînekî ku delalet li ser zemanî bike digel wê îsmumef‘ûlê bête zîkirkirin, îcarê ji wê qerîneyê zeman fehm dibî û şîxa muntehayê cem‘an jî ji îsmumef‘ûlê têtin, meşela: Menşûru, yanî nuşret bûye ji boy mufredê muzekker. Menşûranî, yanî nuşret bûye ji boy du neferêd muzekkeran. Menşûrûne, yanî nuşret bûye ji boy ceme‘tekî di muzekker. Menşûretu, yanî nuşret bûye ji boy mufredê muennes. Menşûreteynî, yanî nuşret bûye ji boy du neferê teşniya jinan. Menşûratun, yanî nuşret bûye ji boy cem‘etekê muennesan. Şîxa muntehayê cem‘an jî: Menaşîru, menaşîre, yanî nuşret bûye ji boy çend cem‘ekan. Eve emsalane hemû derheq fi‘la şulaşî bû. Wezna fi‘la şulaşiyê mucered (fe‘ele) ye, ji “fa”ya fe‘eleyê ra (fau‘l-fi‘l) dibêjin û ji “‘eyn”a fe‘eleyê ra (‘eynu‘l-f‘êl) dibêjin û “lam”a fe‘eleyê ra (lamu‘l-fi‘l) dibêjin, mirad ji vê beyanê ew e ku da tu bizanî ku sê hurûfêd ‘illeyê hene ku: (Elîf, waw û yê). Eger di fi‘lê da ji van her sê herfan tunîne, wê fi‘lê ra salim dibêjin. Meşela weku niha: Derebe ye, ji van hurûfan salim e. Eger ji van her sê hurûfan herfek di fi‘lê da hebe, ji wê fi‘lê ra mu‘tel dibêjin, yanî xweyî‘illet e, lewra ev hurûfane bi yekûdû tebdîl dibin, meşela: Waw munqelib dibe bi elîf, ya munqelib dibe bi elîf, sebeb vê xeberê, ji wê fi‘la ku hurûfêd ‘illeyê tê da hene mu‘tel dibêjin, eger herf ‘illet e waqî‘ bûye di îbtîda fi‘lê da, ji wê fi‘lê ra (mu‘telu‘l-fa) dibêjin, mîsall weku niha: We‘ede û yesere ye, eger herf ‘ille waqî‘ bûye di weşta fi‘lê da, ji fi‘lê ra (ecwef) dibêjin, yanî cewf bi ma‘na derûn e, yanî ew herf ‘ille waqî‘ bûye di cewfa wê fi‘lê da, meşela weku niha: Ba‘e û habe ye, eger ew herf ‘ille waqî‘ bûye di axirê fi‘lê da, ji boy wê fi‘lê ra (naqîs) dibêjin, yanî di herekeyê da nuqsan e, lewra axirê wê fi‘lê ku herf ‘illete bin. Ew hurûf, ekserî herekeyê qebûl nakin, lewra dibêjin wê fi‘lê naqîs bin. Ew hurûf, ekserî herekeyê qebûl nakin, lewra dibêjin wê fi‘lê, naqî,* meşela weku niha: Ğeza, û ‘esa û rema ne eşlêd van fi‘lan geze ye û ‘ese ye û remeye ye, axirî ku herfê ‘illete bûn, herfê ‘ille meftûhê maqablakin qaide ye, munqelib dibe bi elîfê, herf tebdîl bûye bi elîf, îcarê

* Ev hevok di eslê metnê de jî dubare ye.

bûne ğeza û ‘esa û rema, evene fi‘lêd mađî ne, lakin di muđari‘êd van ef‘alan jî anekora meqamê tebdîl û teħwîl dibe.

FEŞIL Eve beħsa fi‘la muđari‘ dike, fi‘la muđari‘ muşterek e di nîva ĥadır û îstîqbalê, lakin bi ‘elametê ferqa ĥadır û îstîqbalê dibe, meşela weku niha dibêjî: Ye’kulu el-an, yanî dê niha buxutin, lefzê elan elametê ĥadırî ye, yecîu ğeden, yanî dê şubeyê bêtin, ev lefzê xeden, bûye ‘elametê fi‘la muđari‘ ku bi cî ye bi îstîqbalê jî fi‘la muđari‘ emrê ĥadırî têtin, lewra emr ew e ku weqtê wê neboriye ku emr bike. Ew şola ku bibe fi‘la mađî borî ye bûye û çûye îdî emr di wî da nabî, lakin fi‘la muđari‘ mewcûd e emr dibî û di emrê da jî ğayib nabî, îlla dê ĥadır bin şeş sîge tên: Mufred û teşniye û cemi‘ û muzekker û muennes me‘lûm e, meşela weku niha: İdrib dibêjin, yanî bikut ey mufredê muzekkerê muxateb, idreba, yanî bikutin ey teşniye muzekkerêd muxateb, idrebû, bikutin ey cem‘a muzekkerêd muxateb idrebî, yanî bikut ey mufredê muennesê muxateb, idreba, yanî bikutin ey teşniye muennesêd muxateb, idrebne, yanî bikutin ey cem‘a muennesêd muxateb, nehî jî bi vî wechî şeş sîge dibin, meşela weku niha dibêjin: La tef‘el, yanî meke ey mufredê muzekkerê muxateb, la tef‘ela, yanî mekîn ey teşniye muzekkerêd muxateb, la tef‘elû, yanî mekîn hûn ey cem‘a muzekkerêd muxateb, la tef‘elî, yanî meke ey mufredê muennesê muxateb, la tef‘ela, yanî mekîn ey teşniye muennesêd muxateb, la tef‘elne, yanî mekîn ey cem‘a muennesêd muxateb. Evene sîge û elfazêd fi‘la şulaşî mucerred bû hate beyankirin. Lazim e mîsalleke jî fi‘la rubaî mucerred zikir bikin, lewra şîxêd wan jî cuda ne, mîsala fi‘la rûba‘îya mucerred weku niha: Deħrece, li wezna fe‘lele mađî, yudeħricu li wezna yufe‘lîlu muđari‘, deħreceten meşder e, evene û îsmufa‘il û şîxêd mayî hemû jî meşderê cuda dibin, lakin îsmifa‘il û îsmumef‘ûlê fi‘la ruba‘î û xumasî û sudasî be “mîm”ê têtin, meşela weku ruba‘î ye îsmufa‘il: Mudeħricu, yanî mehr ke mufredê muzekkerî, mudeħricanî, yanî mehr kin teşniya muzekkeran, mudeħricûne, yanî mehr kin cem‘ata muzekkeran, mudeħricatu, yanî mehr ke mufredê muennesê, mudeħricetanî, yanî mehr kin teşniya muennesan, mudeħricatun, yanî mehr kin cem‘a muennesan, eve şeş sîge tên di îsmufa‘ilî da axirê kelîmeyê meksûr e, lakin di îsmumef‘ûlî da axirê kelîmeyê meftûh e bi vî herekeyê ferq dibî, meşela weku niha: Muqetel, yanî hatiye kuştin mufredê muzekker, muqetelanî, yanî hatiye kuştin teşniya muzekkeran, meqetelûne, yanî hatine kuştin cema‘etkî muzekkeran, muqateletê, yanî hatiye kuştin mufredekî muennesê, muqeteleteynî,

yanî hatiye kuştin teşniye muennesan, muqetelatun, yanî hatiye kuştin cem‘ekî muennesan. Van îsmufa‘il û îsmumef‘ûlan jî wezn heye, madam ku ji meşderî şeq be hemûyan wezn heye ji şulaşiyar da wezn fa‘il ji boy îsmufa‘lî wezn e, mef‘ûl ji boy îsmumef‘ûlî wezn e û ji boy îsmufa‘ilê ruba‘iyê muf‘elîlun wezn e, û ji boy îsmumef‘ûlê ruba‘î ra muf‘elûn wezn e, û ji boy fi‘la şudaşî jî da îsmufa‘ilî da mustef‘îlun, û ji boy îsmumef‘ûlî mustef‘elun wezn e, me‘na weku niha: Mustexrecun dibêjî yanî fa‘il e ji wê deranînê eve îsmufa‘il e û îsmumef‘ûl nav e ji boy wî tiştê ku têtê bideranîn, weku niha: Mustexrecun dibêjî, yanî ew tiştê ku hatiye bideranîn.

FEŞIL Di behsa edat û ‘elamatêd fi‘la muḍarî‘ da ne, tu bizanî ku ji boy mufred û teşniye û cem‘a muzekkerêd ġayib lefz “ya” ye, weku niha: Yerkebu, yerkebanî, yerkebûne, û ji boy mufredî û teşniya muennesêd ġayib jî lefz “ta” ye, weku niha: Terkebu, terkebanî, ji boy cem‘a muennesêd ġayibe dîsanî lefz “ya” ye, weku niha: Yerkebne dibêjî, û ji boy mufredê muzekkerê muxateb û ji boy teşniya muzekkerêd muxateb û ji boy cem‘a muzekkerêd muxateb û ji boy mufredê muennesêd muxateb û ji boy teşniye û cem‘a muennesêd muxateb lefz “ta” ye, meşela weku niha: Terkebû, yanî siwar dibe mufredê muzekkerêd muxateb, terkebanî, yanî siwar dibin teşniya muzekkerêd muxateb, terkebûne, yanî siwar dibin cem‘a muzekkerêd muxateb, terkebîne, yanî siwar dibe mufredê muennesêd muxateb, terkabanî, yanî siwar dibin teşniya muennesêd muxatebe, terkebne, yanî siwar dibin cem‘a muennesêd muxatebe, û ji boy nefse mutekelîm weḥdehu lefz elîf e, meşela weku niha: Erkebu, yanî ez dê siwar bibim, û ji boy mutekelîm me‘elxeyr jî lefz “nûn” e, meşela weku niha: Nerkebu, yanî em dê siwar bibin.

FEŞIL Di fi‘lan da ḍemîr lazim e. Bê ḍemîr, fi‘l nabî. Eger fi‘la maḍî û eger fi‘la muḍarî‘ û eger emr û eger nehî û eger îsmufai‘l û eger îsmumef‘ûl, xulaşê herçî ku fi‘l bî, elbete dê ḍemîr hebî. Demayîran jî ji boy te ‘ed bikim da me‘lûmê te bibe. Me‘lûmê te bû ku fi‘l eger maḍî û eger muḍarî‘ çardeh sîge hene. Ji boy her yekê cuda cuda damîrek heye, meşela weku niha: Derebe maḍî, yedrîbu muḍarî‘. Ji boy mufredê muzekkerêd ġayib e. Demîra mufredî (hû) ye. Dereba, yedrîbanî, ji boy teşniya muzekkerêd ġayib in. Demîra teşniyeyê (huma) ye. Derebû, yedrîbûne, ji boy cem‘a muzekkerêd ġayib in. demîra cem‘a ġayiban (hum). Derebet, tedrîbu, ji boy

mufredê muennesê gayibe ye. demîra mufredê muennesê gayibe jî (hî) ye. Derebeta, tedribanî, ji boy tesniya muennesêd gayibe. Demîra wan jî (huma) ye. Derebne, yedribne, ji boy cem'a muennesêd gayibe ne demîra wan jî (hun). Derebe mađî, tedribu muđari', ji boy mufredê muzekkerê muxateb demîra wê jî lefz (ente). Dereba mađî, yedribanî muđari' ji boy tesniya muzekkerêd muxatab demîra wê jî (entuma). Derebtum mađî, tedribûne muđari', ji boy cem'a muzekkerêd muxateb demîra wan jî lefzê (entum). Derebtê mađî, tedribîne muđari', ji boy mufredê muennesê muxatebe ye demîra wê jî (ente) ye. Derebtuma mađî, tedribanî muđari', ji boy tesniya muennesêd muxatebe demîra wê jî (entuma) ye. Derebtunne mađî, tedribne muđari', ji boy cem'a muennesêd muxatebe demîra wê jî (entunne) ye. Derebtu mađî, edribu muđari', ji boy nefsê mutekelimwehde demîra wê jî (ena) ye. Derebna mađî, nedribu muđari', ji boy mutekelimme'elgeyr e demîra wê jî (neħnu) ye. Demayirêd mufred û tesniye û cem' û muzekker û muennes û mutekelimwehdehu û mutekelimme'elgeyr evene bûn ku beyan bûn. Di kelimê 'Erebî da dayîm mufred û tesniye û cem' û muzekker û muennes û gayib û ĥadır û mutekelim ji tekelumê ferq dibin, lewra 'elamet hene.emmadi lugetêd mayî wusa nînin, lazim e cizwek ji wan jî bête beyankirin.

FEŞIL Di beħsa ĥerfê da ye. Tu bizan! Ku ĥerf ew lefz e ku daîma tabî' e, ĥeta tabî' ne bi nefsaxo bi xo me'neyekê tamam nadî, belkû me'na heye lakin weku digel maqebil û mabe'dî nebî ew ma'na dirist nabî, lakin ĥurûf zaf in, ĥemû di vê muxteserê nayêne 'edkirin. Hindekî ku zêde ji boy tekelumê derûr û lazim in beyan bikim. Di beħsa ĥerfê da ne: Ĥerf ew e ku tabî' e, bê tabî'îyet fayde nadî. Ĥurûf jî zaf in, lakin çendekî qewî muste'mele beyan bikin: (Înne) û (enne) û (qed) û (elbete) û (labude) Evne ji boy tehqîq in weku di kelimê da carî bibin yanî muheqeq ku ev xebera wuha ye, lakin bê maqebliyê û mabe'd fayde nadî. (Heta) û (îla): Ev erdu jî ji boy gayet û nîhayet e, yanî meşela weku niha: Şîrtu île'l-beşretî, yanî ez çûm û nîhayeta seyra min ĥeta Beşrayê bû. We ekeltu's-semekete ĥete'r-re'sî, yanî min masî xwur, ĥeta serî jî xwur. (Mîn) û (mîne): Ev her du jî ji bo îbtîda ye û bi me'na "jî" ye, meşela weku niha: Mîne'l-beledî û mîne'n-neharî, yanî ji bajarî û ji îbtîdaya şubeyê. Ū (meta) û (ĥeysu): Ev her du jî, (meta) bi me'na kengê ye û (ĥeysu) jî bi me'na li ku ye ya kengê û li kû, meşela weku niha: Meta yecîu'l-emîru? We ĥeysu yûcedu'l-esedu? Yanî kengê mîr têtin û li kû şer bi dest dikeve. (La û ma): Ev her du

jî ji boy nefî û tuneşî ne, weku niha meşela: La rebîhe fihî, we ma geyre fihî, yanî feyde û xêr di vê şolê de nînin. (Ew), (emma), (lakin): Ev her sê ji boy teşkîka di kelamê da ne, meşkûk e, weku niha meşela: Ca'e Zeydu ew 'Emru Yanî aya Zeyd hatiye yan 'Emr hatiye, eve meşkûk e. Rizal-qewmuemmaena, yanî qewm radîne, emmarida min meşkûk e. Ca'el-beledîyyune we lakine'l-emîru, yanî ehlê bajarî hemû hatine îla hatina emîrî meşkûk e! Û ('ela) û (sewa): 'Ela ji boy îstî'la ye, yanî bi ma'na li ser mîsall, weku niha: 'ele's-şathî we'd- deynu 'ela fulanîn, yanî li ser banî û qer li ser filanekesî ye. Û (len) û (lem): Ev her du ji ji boy nefiyin bi men'a la û ma, lakin di fi'la muḍari' da û di emrê da dibin meşela weku niha: Len yunşere's-şultanu we lem yehşulu'l-meramu, yanî xundikar nuşretê nadite me û meqşeda me ḥaşil nabî. (Ġeyr) û (ma'eda): Ev herdu jî bi ma'na cuda ne, meşela weku niha dibêjî: Zarenî'n-nasu xeyru'l-emîrî, yanî ziyareta min kirin kafeyê xelkê îla emîrî ziyareta min nekiriye. Ma şumtu ma'ede'l-yewmu, yanî min rojî negirtiye îla rojek girtiye. Û (maxela): Ew jî bi ma'na ma'eda ye, yanî xeyr ji yekê. (Ledey): Ew jî bi ma'na 'inde û nik e, meşela weku niha dibêjî: Ledeyi'l-muraffi'etu, yanî li nik muraffi'eyê. Yanî li nik muraffi'eyê. (Bel): Ev jî bi ma'nşa belkû ye û ji boy subût e weku niha dibêjî: Ma qetele'l-emîru bel mate, yanî ew mîr qetil nekir belkû bi xwo miriye. Ji boy subût e. Û ('en): Lefz 'en herf e, ji bo ji be. Weku niha: 'Eni'l-beledî, we 'eni'l-ḥukkamî, dibêjî yanî ji bajêrî û ji li nik ḥakimî. Û (key): Eve jî mexşûş e bi zemanî weqtî. Weku niha dibêjî: Key qetele'l-xurraşşûne? Yanî çi zemanî sariq hatine qetilkirin. (Leyte) û (le'elle): Ev herdu jî ji boy temenî û hêvî û rica ne, weku niha dibêjî: Leyte's-şebabe ye'ûdu yewmen, yanî xweziya ku ciwanî rojekê 'ewde bikira, yanî vegeriya. Ev leyte ji boy temenna û ricaya şeyê muḥal e, lewra vegeryana ciwaniyê geyrê mumkin e, Lakin le'elle ji boy rica û temenna şeyê mumkun e, weku niha dibêjî: Le'elle'l-Lahu şîfanî, yanî xweziya cizbê Xwedê te'ala şîfa bidite min, yanî rica û hêviya şîfayê dike. Ev şîfa min terefi'l-Lahî mumkun e. (Ḥaşa) û (kela): Ev herdu jî ji bo înkâr û nefyê û tune ne, ji boy şond, weku niha dibêjî: Ḥaşa û kella ma fe'eletu, yanî di meqamê qesemê da ye ku ez şond dixwum ku min ev şola nekiriye. Fi'la wê şolê, înkâr û nefî dike. (B): Ev herf carre ye, ji boy arîkarî dibe, weku niha: Bismîllahî, yanî bi yarîkariya navê Xwedê te'ala, û ji boy qesemê têtin, weku niha: Billahî, yanî şondê dixwum bi navê Ellah te'ala, û ji boy muşahebet jî têtin, meşela weku niha: Tekelemtu bî Zeydîn, yanî min muşahebet digel Zeydî kir û

xeber da û bi me'na digel e. (Fî): Ev herfa jî, ji boy zerfîyet e dayîma, weku niha dibêjî: Dexeltu fi'd-darî. We nezertu fil-kîtabî, yanî ez daxilê xanî bûm û min nezer li kitêbê kir. Xanî zerf e û tu meZRûf î, lewra tu waqî' bûyî di nîva xanî da, eve meşela zerfê heqîqîyet, lakin: Nezertu fil-kîtabî û zerf mecazî ye, tu waqî' nabî di nîva kitêbê belkû nezera te waqî' dibî di nîva kitêbê da lakin eve zerf mecaz e. (W) û (t): Ev herdu herfana mexşûşî ji boy şond e, weku niha: Wellahî û billahî û tellahî dibêjî, yanî ez şondê dixwum bi Xwudê "waw" ji boy 'etfê jî 'ed bikî li ser hukmê maqebîlê, meşela weku niha: Ca'e Muhammed we Ehemmed we Bekir, yanî ew hukmê ku hatine di wê kelîmê da Ehemmed û Bekir jî daxil in, yanî Muhamed jî û Ehemmed jî û Bekir jî hatin. Xulaşê hurûf û behsa hurûfê zaf e lakin ji boy muhtediyan hinde qeder kafî ye evene debt bike paşî ji kitêbê şerfê Se'dîn Teftezanî muyeser dibî dixwunî, kine û mahîyetê dizanî. Cuz wê me'lûmê te bibe ku ev hurûfane bi bal demîrê ve dem dibin û hindik ji hurûfan weqtê dema demîran, muennes û muzekker û mufred û teşniye dibin. (Haza) û (za): Evene herf in, lakin esmaul-îşaret dibêjine van. (Haza), ji bo mufredê muzekkerê hadir e, yanî eve, (hazeynî), ji boy teşniye muzekkerêd hadirî ye, yanî eve herdukan e. (Haûlaî), hem ji boy cem'a muzekkerêd hadirî ye, yanî evene cem' en. (Hazîhî), ji boy mufredê muennesê hadirî ye, yanî eve jin e. (Hateynî, ji boy teşniye muennesêd hadirî ye, yanî eve herdu jina ne. (Haûlaî), ji boy cem'a muennesêd hadirî ye, yanî cem'etekî jinanî ê hadir e. (Zake), ji boy mufredê muzekkerê hadir e, yanî eve mufredê muzekkerê hadir e. (Zakuma), ji boy teşniya muzekkerêd hadirî ye, yanî du neferêd muzekkerêd hadir e. (Zakum), ji boy cem'a muzekkerêd hadir e, yanî cem'etekî muzekkerêd hadir e. (Zakê), ji boy mufredê muennesê hadirî ye, yanî neferekî jinan. (Zakuma), ji boy teşniya muennesêd hadirî ye, yanî du nefer jinan. (Zakunne), ji boy cem'a muennesêd hadirî ye, yanî cem'etekî jinan. Hurûfêd mayî jî bi demîrê mu teşîl dibin, û mufred û teşniye û cem' dibin, meşela weku niha: (Înneke), ji boy mufredê muzekkerê hadirî ye, yanî be tehqîq tu. (Înnekuma), ji boy teşniya muzekkerêd hadirî ye, yanî be tehqîq hûn herdu. (Înnekum), yanî be tehqîq ku hûn cema'etek ji muzekkerêd muxateb e. (Înnekê), ji boy mufredê muennesê hadir e, yanî bi tehqîq tu ferdekî muennesê. (Înnekuma), ji boy teşniya muennesêd hadir e, yanî bi tehqîq hûn herdu jinêd hadirî. (Înnekunne), ji boy muennesêd hadirî ye, yanî bi tehqîq hûn cem'etekî jinan. (Mînke) û ('enke) û (bîke) û (leke) û (mînkuma) û ('enkuma) û (bîkuma) (lekuma) û (mînkum) û

(‘enkum) û (bîkum) û (lekum) û herfêd mayî jî li van qiyas bike, lewra bi tefşîl zîkr û beyan bibe, dirêj dibe û ji zihna zarokan zêde dibe.

FEŞIL Di behsa şerfa lugetê farisî de ye. Me‘lûmê te bibe ku di zimanê farisî da jî fi‘l û fa‘il û meşder û îsmufa‘il û îsmumef‘ûl û mađî û muđarî‘ û emr û nehiy û ğayib û ĥadır û mufred û teşniye û cem û demîr, eve hemû hene. Lazim e ku ji van jî cuzwekî ji boy te beyan û neqil bikin, da tu bi kelimê farisî jî aşîna bibî wexta xeberdanê nexelîtî û sewqa kelimê me‘lûmê te bibitin.

FEŞIL Di behsa fi‘la mađî de ye. Ji fi‘la mađî, di farisî de çar lefz ji meşderî cuda dibe. Îdî zêde nabî ferqa teşniye û cem‘ ê û muennes û muzekkerê û ĥadır û ğayibî di axirê fi‘lê da bi ‘elametekê dibî, meşela weku niha: (Reft), Fi‘la mađî ye, meşderê wê (reften) ji bo mufredî ye, ğayib çi muzekker çi muennes ferq nîne, yanî çûye di zimanê mađî da mirovek. Ê jî bo ĥadırî “ya”yek di axirî zêde dibe ew ‘elametê ĥadırî û xîtabî ye, meşela weku niha: (Reftî) ye. Ev ya ji boy mufredê muxateb e çih muzekker çih muennes e, yanî tu çûyî ey mufredê muxatebe di zimanê mađî da. (Reftîd): Îcarê di axirê lefzê “nûn” û “dal” ‘elametêd teşniye û cem‘a ne, yanî hûn çûn di zimanê mađî da ey teşniye û cem‘êd muxatban çih muzekker çih muennes. (Reftend): Ji boy teşniye û cem‘êd ğayiban e çih muzekker, çih muennes, yanî di zimanê mađî da çûne teşniye û cem‘êd ğayiban çih muzekker, çih muennes. Ji fi‘la mađî ev çar sîge bi der dikevin û ‘elameta mutekellim wehdehû jî “mîm” e, weku niha: (Reftem), yanî di zimanê mađî da ez bi xwe çûme û ji boy mutekellim me‘el ğeyr jî ‘elamet “mîm” û “ya” yek e, weku niha: (Reftîm), yanî em di zimanê mađî da çûne.

FEŞIL Di behsa fi‘la muđarî‘ da ye. ‘Elametê fe‘la muđarî‘ jî “mîm” e, bê wê nabî da tê da “ya” fe‘lê “mîm” ku ‘elametê muđarî‘î ye lazim e, weku niha: (Mîrevî) û (mîreved) û (mîrevîd) û (mîrevend) û (mîrevem) û (mîrevîm), şeş sîge dibî. (Mîrevî), yanî tu diçî ey muxateb, niha yan paşê, lewra me‘lûm e ku muđarî‘ muşterek e di nêv hal û îstîqbalê. (Mîrevd), yanî diçe mufredê ğayibe çih muzekker çih muennes e. (Mîrevîd), yanî hûn diçin teşniye û cem‘êd muxatebe çih muzekker, çih muennes e. (Mîrevend), yanî diçin ceme‘etekî ğayîbe çih muzekker, çih muennes e. (Mîrevem), ji boy mutekelimwehde ye yanî ez bi xo diçim, (mîrevîm), ji bo mutekellimme‘elğeyr e, yanî em diçîn. ‘Elameta mutekelimwehde û mutekellimme‘el

ğeyr ji herduyan di axirê kelîmeyê “mîm” dibe. Lakin di zimanê kurmancî da pênc sîge bi der dikevin zêde nabî weku niha: (Diçî), (diçe), (diçîn), (diçim), (diçîn). Ef'alêd mayî jî li van qiyas bike, evene pênc şîxan jî demayirêd kurmancî hene. Weku niha: Tu, ew, hûn, ewan, em, me. Eve şeş demîr jî demayirêd wan ef'alan e digel wan têtê 'emilandin.

FEŞIL Di behsa emrê haqîrî da ye. Ma'lûm bibe ku emrê haqîrî be herfa “ba”yê dibe, weku “Ba” di îptîda da waqî' bibî, 'elametê emrê ye. Ji kelamê farisî, ew jî dîsanê şeş sîge dibin, mesela weku niha: (Bide), (bidehed), (bidehîd), (bidehend), (bidehem), (bidehîm). Emrê haqîrî jî ji hemû ef'alan bi vê qiyasê cuda dibe. Bi zimanê kurmancî dîsanê pênc sîge di emrê haqîrî da jî dibe, mesela weku niha: (Bide), yanî mufredê muxateb e çih muzekker, çih muennes e. (Biden), yanî mufredê gayibe çih muzekker, çih muennes e. (Bidin), yanî hûn teşniye û cem'a gayiban çih muzekker, çih muennes e. (Bidim), yanî ez ku mutekelim-wehde me, (bideyn), yanî em ku mutekelimme'elgeyr in, em bideyn.

FEŞIL Di behsa meşderiyê da ye. Meşder goya eşlê fi'lê ye, bê zeman û bê fa'il û mef'ûlê mutleq 'îbareti ji wê fi'lê ye, mesela weku niha lefzê (fi'l) bi xwe mutleq 'îbareti ji kirînê, lakin mucered ji zemanî û meşder e, yanî cihê şudûr û şeqbûna ef'alan e, Ji fi'lan ra muşteq jî dibêjin, lewranê hinde sîgeyêd muxtelîfe ji meşderan şeq û cuda dibin ku her yekê cuda cuda me'na hene, lewra berê muceredkirî ne, paşê maqî tê û muqarî' û îsmê fa'il û mef'ûlî, evene jî tî: (Kerden) yanî mutleq kirin û (Borden), yanî mutleq birin, û (Xorden), yanî mutleq xwarin, îcarê ef'alêd mayî hemû ji meşderan cuda dibin, lewra meşder dibêjin ku cihê şudûra ef'alan e. Ekserî di axirêd meşadirêd elfazêd farisiye “dal” û “nûn” dibin, ew jî 'elametê meşderan in. Meşadirêd ef'alêd kurmancî jî hesêp ke weku meşadirêd ef'alêd farisiyê ne îlla di axirê wan de “dal” tune belku ekserî “ya” û “nun” dibin, mesela weku niha: (kirîn) û (birîn) û (xwirîn), yanî mutlaq (kirîn) û (birîn) û (xwirîn) mirad e, paşî weku sîge jî cuda dibin. Wî wextî fe'l û fa'il û mef'ul û maqî' û muqarî' jî ma'lum dibe. Di kurmancî de jî 'elametê fê'la muqarî' “dal” e di îptîda da dibe eger fe'l mute'eddî be, mesela weku niha: (dide), (dibe), (diçe), eger fe'la lazim bî îcarê ew “dal” di axirê fe'lêd heye, weku niha: (siwar dibe), (radibe), (radike). Evene jî fi'lêd muqarî'. 'Elametê fi'la muqarî' “dal” e, lakin di axirê kelîmeyê dibe.

FEŞIL Di behsa îsmufa‘ilêd elfazêd farisî ye. Îsmufa‘il, navê fa‘ilê wê fi‘lê ye, îsmê fa‘il navê fa‘ilê wê fi‘lê ye. Ew jî îbtîdaya meçmûm dibe û di axirê lefzê da jî “dal” û “ha” yek dibî, mesela weku niha: (Koşendeh), (konendeh), (xorendeh). Evne mufred in, yanî yê ku dike û ê ku dike û ê ku dixwe di îsmufa‘ilê farisî da bi tenê mufred û cem‘ heye, teşniye jî weku cem‘ê ye, lakin muzekker û muennes cuda nîn in, belkû hemû jî sîgeyek in îlla teşniye û cem‘ jî herdu yek in. Mesela weku niha: (Koşendekan) [Koşendegan] û (konendekan) [konendegan] û (konendekan) [konendegan]. Evne ji boy teşniyeyê jî tene gotin, yanî du qatil û do êd ku şolkî dikin û du êd ku dixwun. Ê jî boy cem‘ekê jî tene gotin, yanî cema‘etekî qatilan û şolkiran û xwariyan. Lakin di elfazêd kurmançî bixor ser îsmufa‘‘il bi lefz bi tenê nabî, belkû lazim e lefzê (ey) di berî wê kelamê bêne zikirkirin, weku niha ji boy mufredan dibêjî: (Ê kuştî), (ê kirî), (ê xûrî). Evne mufred in çih muzekker, çih muennes, çî hadir, çih gayib.emmaîsmufa‘ilêd teşniye û cem‘êd zimanêd kurmançî bi geyr ji lefzê (ey) di îbtîda da, di axirî da lefzê “nûn” û “ha”yek dibî ku delalet dike ku ew fa‘ilane teşniye weyaxud cem‘ in, mesela weku niha: (Ê kuştine), (ê kirine), (ê xûrine), yanî ew teşniye û cem‘êd ku kuştine û kirine û xûrine.

FEŞIL Di behsa îsmumef‘ûlêd elfazêd farisî ye, îsmumef‘ûl nav e ji boy wê tiştêkî ku ew fi‘l li ser wê tiştê weyaxu li ser wê hurûfê waqî‘ bûye, mesela: Meqtûl, ew qetla waqî‘ bûye li ser wî hurûfî, û me‘kûl ew ekla waqî‘ bûye li ser wê tiştê, yanî ew hurûf hatiye kuştin û ew şey’ hatiye xwarin, îsmumef‘ûl. Ewî ye îsmumef‘ûl di axirê da lefz “ha” dibe, weku niha: (Koşteh) û (birdeh) û (xordeh), evne ji boy mufredan in, ya ê ku hatiye kuştin û hatiye birin û hatiye xûrin çih muzekker û çih muennes, çî hadir û çî gayib.emmajî boy teşniye û cem‘êd îsmumef‘ûlî di axirê da lefz (kan) heye ku ew ‘alemetê teşniye û cem‘ê ye, weku niha: (Koştekan) û (birdekan) û (xordekan), evne ji boy teşniye weyaxo ji boy cem‘ ne, yanî ew tensiye û cem‘êd hatine kuştin û birin û xwarin, lakin di îsmumef‘ûlê zimanê kurmançî da, di axirê da lefzê “ya” dibî ew ‘elametê îsmumef‘ûlê ye, weku niha: (Kuştî) û (birî) û (girtî), evne nav in ji boy mufredêd meqtûl û birî û girtiyan, yanî ferdek hatiye kuştin û birin û girtin çih muzekker, çih muennes, çî hadir, çî gayibe.emmatensiye û cem‘êd wan jî ya elîf ya û nûn dibin, mesela weku niha: (Kuştîyan), (biriyan), (girtiyan). Evne ji boy tensiye û cem‘êd îsmumef‘ûla ne, yanî

evene ism in ji boy tensiye û cem'êd meqtûlan û şey'e birî û mehbûsan çih muzekker çih muennes çî hađire û çî jî ğayibe.

FEŞIL Di beħsa nehyê da ne, me'lûmê te bibe ku nehî bi me'na men' e, yanî men'a fi'la şolekî ye. Ew jî 'eksa emrê ye, lewra ew, emrê bi fi'la wê şolê ye. Lakin nehî men'a fi'la wê ye, meşela di 'erebî da weku niha: Ef'el la tef'el, yanî bike û yanî meke, lakin ev nehî jî di zimanê farisiye weku lîsanê 'erebî edatê nehyê hebin ku 'elametê nehyê û nefyê ne, 'elametê nehyê û nefyê ev herdu ħurûf in: "mîm" û "nûn" ew herdu ħurûf jî mexşûşê fi'la muđari' in, lewra nehî jî wê di ħal û îstîqbalê da bê ku xaş e bi fi'la muđari', lakin "mîm" jî xaş e bi ħalî, weku niha: (Mekon), ji boy mufredê hađirê muxateb e, yanî bilanî neke mufredê hađirê muxatebe çih muzekker, çih muennes, di niha da hađira (mekonîd), ji boy teşniye û cem'êd hađirêd muxatebe ne muzekker û muennes, yanî hûn nekin ey teşniye û cem'êd hađirêd muxatebe muzekker û muennes. Di nuha da yanî hađira (nekuned) ji boy mufredê ğayibe ye çih muzekker û çih muennes. Lakin di zemanê îstîqbalê da yanî ji niha bi şûn ve bilanê ew mufred wê şolê neke. (Nekonend) ji boy teşniye û cem'êd ğayibe ne ji ħuzûrê yanî bilanê ew teşniye û cem'êd muzekker û muennesan ku ğayibe ne ewê şolê nekin. Nehya kurmancî jî ħisêb ke ku ew jî mişlê nehya farisî ye, ew jî bi "mîm" û "nûn" e, weku niha dibêjî: (Meke), (mekin), (neke), (nekin), (nakim), (nakîn).

FEŞIL Di beħsa ğayib da ne û demayirêd wan da ye, lewra demîra ğayib û hađiran cuda ne, lakin ferqa mufredî û teşniye û cem'ê hene, lakin ferqa muzekker û muennesê nabî, weku niha: (Û), yanî mufredê ğayibe, (ûnan), (ûnha), yanî teşnuyeya ğayiba muzekker û muennes û cem'ekî muzekker muennesêd ğayib e. Demayirêd ğayib yêd zimanê kurmancî jî ħisêb ke weku zimanê farisî ye: (Ew), (ewî), (wan), (ewan). Demayirêd ğayibe eve ne me'lûmê te ye.

FEŞIL Di beħsa demayirêd hađire ye, ma'lûmê te bibe ku ji boy hađiran jî mexşûşe demîr heyin, weku niha: (To) û (men) û (ma) û (şoma) ye, yanî: (Tû), (ez), (em), (hûn). Ev demîrane zehf mîşal heyin, lakin hinde qeder ji boy muhtediyan kafi ye, tefşîla wan ji kitêbêd şerfê me'lûmê te dibî.

FEŞIL Di beħsa îsma lugetê farisî ye, me'lûmê te bibe ku îsmêd vî zimanî jî mufred û teşniye û cem' dibin, lakin muzekker û muennes ferq çune weku niha:

(Ġuk), mufred e, (ġukan) û (ġukha) cem‘ e çih muzekker çih muennes, ew lefz “ha” ya ku di axirê îsmê da têtin, ew ‘elametê cem‘ê ne. Weku niha: (Ademha) û (kebetha) îdî mayî jî li vê qiyasê ye. Esmayên kurmançî jî mufred cuda ne, weku niha: (Merif) û (dar) û (hesp). Evne mufred in, yanî ferdek ji vana, lakin tesniye û cem‘êd wan jî weku farisiyan bi “elîf” û “nûn”an têtin, weku niha: (Merifan), (daran), (hespan) evne ji boy tesniyeyê jî û cem‘ê jî têtin û ferqa muzekker û muennesê jî nabî, yanî ji vana herdu û yanî ji vana cima‘etik, herdu jî dibin.

FEŞIL Me‘lûmê te bibe ku di elfazêd farisiye jî weku zimanê ‘erebî esmau’l-îşaret heyin, weku niha dibêjî: (În), ji boy hadîrê mufred (înha), ji bo tesniye û cem‘êd hadîran, (an) ji boy mufredê gayîbe, (anha) ji boy tesniye û cem‘êd gayiban, (û) ew jî ji boy mufredêd gayîbe ne. (Ûnha) ew jî ji boy tesniye û cem‘êd gayiban e, esmau’l-îşaret û hem esmau’l-îşaretêd kurmançî jî hebin, weku niha: (Ev), ji boy hadîrê mufred çih muzekker, çih muennes, (Evne) û (evana) ji boy tesniye û cem‘êd hadîran bila ferq, (ew) ji boy mufredêd gayîbe ne bila ferq, (wehe), ji boy mufredê muxatêbê hadîre ye bila ferq, (wan), (ewan) ev herdu jî ji boy tesniye û cem‘êd gayiban in bila ferq.

FEŞIL Di beḥsa nîda da ye, me‘lûmê te bibe nîda bi me‘na gazîkirin e, yanî gazî ferdekî weya cema‘etkê bikî, ew jî mexşûşê şerfa nîdayê heye. Di lîsanê ‘erebî da (ya) û (wa) weku niha dibêjî: Ya Ebdullah, wa Eḥmed, yanî bi herfa nîdayê gazî van mirovan dikî ferda ferda. Di nîdayê da jî tesniye û cem‘ dibî, weku niha dibêjî: Ya Ebdullaheyn, we ya Eḥmedeyn, tesniye, we ya Ebdullahûn û ya Eḥmedûn, di munada cemî‘ da ne. Di lîsanê farisiye herfa nîdayê lefzê (ey), weku niha dibêjî: (Ey seyyîd) û (ey seyyîdeh), seyyîd ewladê Resûlî nêr, seyyîde ewladê Resûlî mê, “ha”ya di axirê da ‘elametê te’nîsê ye. Di zimanê kurmançî jî, herfa nîdayê lefz (o) weku niha dibêjî: O Miho, o Eysê, “ya”ya di axirî ‘elametê te’nîsê ye.

FEŞIL Di beḥsa îstifhamêd di lîsanê ‘erebî da, îstifham ew e ku dixwaze ku tişteke pirsyar bike û fehm bike ku bûye û yan jî nebûye. Herfa îstifhamê jî Hemze ye, weku niha dibêjî: E ca’e fulanun, yanî filan mirov hatiye, bi vê herfê dixûze ku fehm bike ku ew filan hatiye weyaxud nehatiye, îstifham di zimanê farisiye û kurmançî da herdukan jî bi lefzê (aya) weku niha dibêjî: (Aya felan kar temamşud), yanî dixûze ku bizane eceb ew şola me‘lûme temam bû weyaxud nebûye, ev jî

îstîfhama farisî ye. Di zimanê kurdî jî, weku niha dibêjî ku: (Aya serê hîvê bûye), ev jî îstîfhama kurmançî ye.

FEŞIL Di behsa muḍaf û muḍafuîleyh da ne, ev muḍaf û muḍafuîleyhî di hemû lîsan da heye û lazim e, yanî nisbet tiştêkî bi bal yekî dinê didî. Ew tiştê berê muḍaf dibêjin ew tiştê paşin muḍafuîleyhî dibêjin, yanî nisbeta şey'ekî bi bal şey'ekî didî, weku niha dibêjî: Xulamî emîrîn, xulam muḍaf e û emîr muḍafuîleyhî ye, yanî xulamê mîr, û Îbnu Yezîd, îbn muḍaf e û Yezîd muḍafuîleyhî ye, yanî kurê Yezîd, eve nisbet xulamî bibal emîrî û nisbeta îbn bi bal Yezîdî ve hebe. Ev muḍaf û muḍafuîleyhî di zimanê farisiye û kurdiye jî heyîn, lakin di farisiye da tu 'elametê nisbetê tunîne, belkû ji rewşa kelimê me'lûm dike muḍaf û muḍafuîleyhî ye, weku niha dibêjî: (Esp xaceh) û (ferzend mollî) lakin di zimanê kurmançî da 'elametê îdîfeyê ya ye di axirê muḍafî da lefz dibî, ew 'elamet eve ne : Muḍaf û Muḍafuîleyhî ne, mesele weku niha: (Hespê xoce), û (kurê mela), û (xulamê mîr), ev "ya" ye dilalet dike ku evne muḍaf û muḍafuîleyhî ne.

FEŞIL Eve jî mucered di behsa nisbetê. Mesele weku mirovekî weyaxu maleke nisbet bidî bi bal cihekî, ew jî di hersê lîsan da jî bi lefzê (ya) dibî û ji wê "ya"yê yaya nisbetê dibêjin, weku niha: Bexdadî yanî ev mirov mensûb e bi bal Bexdayê û ji ehlê wê derê ye, di lîsanê farisiye û kurdî da jî (beşrewî) farisî, (şamî) bi kurdî.

FEŞIL Xetmu'l- kîtab, me'lûmê te bibî ey talibê 'ilmê şerfê ku ev 'ilme zêde fenekî muşkil e û zaf şîge û i'lal û tebdîlat û demîr û keyfiyat heyîn, lazim e ku tu bi cid û se'î diqet û xîret bikî. Evne be'ḍ qewa'idêd cuziye bûn ku min bi heysu'l-qudret tenzîm kiriye, lakin evne cuzwî ne, bi cuzwî kul ḥaşîl nabî, lazim e tu kitêbêd şerfiye bixûnî îcarê bi eşl û fer' qewa'idê şerfiye me'lûmê te dibî, yanî 'ilmê şerfê mutleq ji hemû 'ilman çetintir e, lewranî, şa'irêd tîrkan gotine ku ev beyta tîrkî di 'ilmê şerfê da bit:

Şerfin i'lali çokdur bir demirden baş gerek

Okuyan derrak gerek, ya okutan qardaş gerek

Îcarê bi her wechê mewqûf diqet û se'î û geyreta talib

Wellahu'l- muwafîq, el muste'anû 'ela kullî'l- umûr.

B- METNA ROJANEKIRÎ YA TESRÎFA TEREMAXÎ

Di vê beşê de me xwest ku zimanê berhemê sade û rojane bikin. Ev berhem digel ku 400 sal berê hatiye nivîsandin jî zimanê wê zêde ne bi arîşe ye, kêr –zêde tê fêmkirin. Lê belê ji aliyê term û têgehên rêzimanî ve ji bo nifşa ji ilmê klasîk bêpar mane gelek aloz û zehmet e. Lewma me jî ji dêvla ferhengê pir û dirêj tercîha rojanekirina zimanê pirtûkê kir, da ku jê zêdetir sûd bê wergirtin.

HAZA KÎTABU ÎBARETÎ ELÎ TEREMAXÎ [EV ÎBARETÊ KITÊBA ELÎ TEREMAXÎ YE] HAZA KÎTABU SERFÎ LÎSANÊ KURDÎ [EV KITÊBA SERFA ZIMANÊ KURDÎ YE]

Bîsmîllahîrrehmanirrehîm

Î‘lem! Tu bizan! Ey kesê mêr ê muxateb, ji bera kurdan re lazim e ku ew jî bi zimanê kurmancî ilmê serfê bizanin. Lewre avakirin û binyada hemû ilman, li ser ilmê serfê ye. Hesab bike, ilm wekî mêzênê ye ji ilmên mayin re. Zanist bi ilmê serfê tîr wezinandin da ku xeletiya wan ilman rast bibe û xeberdana kelimê wan durist bibe. Lewra gava tiştek neyê wezinandin kes kêmasî û temambûna wî nizanê. Bes wekî hatiye, pêdivî ye ku mirov ilmê serfê bizane da ku axaftin û xeberdana rast durist bibe. Bê ilmê serfê kelimê durist nabe. Lewre lazim e ku tu rewşa xeberdanê bizanî, mesela yekjimar û dujimar û pirjimaran bizanî. Û neha jî û ha jî jî yekûdu fîrîq bikî û bizanî. Û nêr û mê jî hevdu veqetînin ku heta xeberdana rast û durist bibe. Mesela: Eger tu nizanî bi peyva yekjimarî digel dujimarî û pirjimariyê xeber bidî, kelimê te xelet dibe û nezanîna te diyar dibe. Ev ilmê serfê bi tevahî di hemû zimanên de heye û pêk tê. Lê yê ku niha jî bo me lazim e, zimanê kurmancî ye. Lê belê lazim e ku hinek ji zimanê erebî û farisî mîsalan binin, lewre ev ilmê serfê bi esl

û destpêk di zimanê erebî de bûye û lefzên ku ji boyî ilmê serfê lazim in lefzên erebî ne. Mesela lefz: Fê'1 (lêkêr), îsm (nav), herf (tîp), fa'il (kirde), mefûl (bireser), ismufa'il (kirde), ismumef'ûl (bireser), zemîr (cînavk). Îdî gelek lefzên erebî hene ku elbete divê ku ew lefz di ilmê serfê de bêne zikirkirin. Bilanê serfa farisî û kurmancî jî çêbin bi vê sebebê. Zikrê serfa erebî, farisî û kurmancî digel yekdu hatine kirin. Serf di zimanê ereban de *“Tehwîlu'l-eslî'l-wahidî îla emsîletin muxtelîfetîn”* yanî: Wergerandina eslekî bi tenê ye bi bal mîsalline terz bi terz. Mesela weku nav be ji wî navî yekjimar, dujimar, pirjimar, nêr, û mê têtin. Eger peyveke erebî fê'1 be şanzdeh bêje, yanî peyv li wê lêkerê peyda dibe, di cih de tête beyankirin. Lê lêkerên farisî, firqa nêr û mêyan nabe, lê belê, firqa hazir û nehazir, yekjimar û pirjimariyê dibe. Ji fê'lekê çar bêje peyda dibin, yanî çar lefz peyda dibin. Ew jî ji niha bi şûn de di cih de dê bête beyankirin. Lê belê ji lêkerên kurmancî bi tenê bê cînavk du lefz cuda dibin: Yekjimar û pirjimar. Lê belê nêr û mê firq nabin, lê ku cînavk hebin, wê hingê firqa nehazir û hazir dibe. Wekî te ev pêşgotin zanî, lazim e ku îcarê rêbazên ilmê serfê di hersê zimanan de jî bête beyankirin, her çî lefz û xeber ku axaftin pê tê kirin. Eger ji peyvê yek maneyek bi tenê fê'm dibe, ji wê kelimê re nav dibêjin. Heke na, eger ji wê peyvê çend manane cuda cuda tête fêmkirin, ji wê kelimê re lêker tê gotin. Heke na eger ew peyv bi xwe bi serê xwe maneyeke xweser nade fehmandin, belkî muhtac e bi alî peyvekê ku ji destpêkê yanî û yanî bi paşîya wê peyvê ve bizeliqepaşê ew peyv delaletê li ser maneyekê bike, ji wê peyvê re tîp dibêjin. Wekî wiha bû, qismê kelam û xeberdanê her çî ku heye, sê cure ne: Nav û lêker û tîp. Ji van hersêyan zêde, îdî cureyên xeberdanê nabe. Elbete yan nav an lêker an tîp ji van her sê qisman zêdetir qet xeberdan tune û nayê îcadê. Evan hersê qismên peyvan, bi tertîb zikir û beyan bikin da rêbazên wan bête zanîn.

NAVDÊRÊN DIYAR Î BEYANA WAN

Nav jî şeş cure ne: 'Elem (serenav), kunye, îsmucins (hevenav), ismuzeman (hokerên demî), îsmumekan (hokerên cih), îsmualet (navên alavan). Serenav ew e ku bi tenê mexsûsê nav e ji boyî mirovekî tê zanîn naskirin, mesela: Yûsuf û Hesên. Ji van peyvan ew mirovên tîn naskirin tîn fêmkirin, êdî zêde maneyek fehman nabe. Ev navên ha jî yekjimar, dujimar û pirjimar dibin. Mesela, yekjimar: Yûsuf û Hesên ferd in. Dujimariya navan bi “y” û “n”ûnan têtin, mesela: Yûsufeyn û heseneyn. Du

mirovên bi navê Yûsuf û Hesen tên qestkirin. Û pirjimariya navan jî bi “w”aw “n”ûnan dibe, dibêjin: Yûsufûn û hesenûn. Mirad birek herfên navên wan Yûsuf û Hesen dibe. Îslim[Îsim] yanî ‘elem û nav jî nêr û mê dibin. Lê belê du elamet û nîşanên mêyîtiyê di dawiyê de lazim in; “hayin” û yan jî “tayin” dibe, ji wê elametê tê zanîn ku xweyê vî navî jin e. Mîsala ku nîşaneyê “mê”yîtiyê di dawiya peyvê de “h”a be, mesela: Fatime**h**, Xedîce**h**, Ayîşe**h**. Ji vê “h”a yê diyar dibe ku xweyê vî navî jin e. Ev navên jinan jî yekjimar û dujimar û pirjimar dibin. Lê belê dujimariya “mê”yan bi lefzê “teyn”ê dibe, mesela: Fatîmeteyn, Xadîceteyn; Ayîşeteyn. Yanî du jinên bi van navan. Pirjimariya navên jinan jî bi “elîftan” dibin, mesela: Fatîmat û Xedîcat û Ayîşat. Yanî ji van navan birek jin. Mîsala ku elametê nabe, mesela: Telheh, Esameh, Beqereh, evîne jî dîsanê dujimarî û pirjimarî dibin. Dujimariya wan jî bi lefzê “teyn” têtin. Bi kurtî, lefzê “teyn” daîma ji bûyî dujimariya mêyan e, mesela: Telheteyn, Esameteyn, beqereteyn. Yanî ji van jinên ku bi van navan in du du. Pirjimariya van jî dîsanê bi “elîftan” têtin, mesela: Telhat, Esmat, Beqerat. Yanî birek mêyên bi van navan. Û hinek caran dibe ku dujimarî bi “elîf” û “n”ûnan jî bînin, mesela: Zeyneb û zeyneban. Yanî du jinên nav Zeyneb. Bi kurtî navê ku ‘elem e yanî nav e ji boyî şexsekî kufş e, li van mînakên ku hatine tene qiyaskirin, dujimarî û pirjimarîta wan bi vê terzê tên.

FESIL[1]²⁰⁵ Di beḥsa kunyeyê de ye. Bila bê zanîn ku kunye bi niyeta xebera xêrê û fala qencyê ye. Ereban adet kirine navên zarokên xwe eger nêr û eger mê kunye dikirin. Eger kur bûya bi lefzê “ebû” yanî bab, mesela: **Ebû** Ebdullah û **Ebû** Yusûf, yanî ev zarok mezin bibe û xweyî ewlad bibe, navê kurekî wî Ebdullah weya Yusûf deyne. Lewre tayîfa ereban goya ji berê de ev niyeta dikirin. Kunye fala bi xeberê ye û eger ewlad mê bûya bi “umm” yanî dayê kunye dikirin, mesela: **Ummu** Kulsûm û Ummu Rebîe, yanî ev keça mezin bibe û ewladekî mê biwelidîne û navê wê Ummu Kulsûm û Ummu Rebîe dayne. Mana yanî Da Kulsûmê û Da Rebîeyê. Tu bizan ku ev kunye jî nêr û mê yekjimar û dujimar û pirjimar dibin, mesela: Ebû Ebdulla**heyn** û Ebu Yûsufeyn tesnîye ne bi “y”a û “n”ûnan. Û pirjimar dibe bi “elîf û ta”yan, mesela: Ebû Ebdullahat û Ebû Yûsufat. Dujimariya mêyan jî dîsanê bi lefzê teyn dibe, mesela: Ummu Kulsûmeteyn û Ummu Rebîeteyn. Yanî du jinên bi navê Ummu Kulsûm û du jinên bi navê Ummu Rebîe. Û pirjimariya kunyeya

²⁰⁵ Ev kevaneka çarkoşeyî û hêjmarên di navê de min lê zêde kirine, ji bo baştir îstîfadekirinê. (A.Û.)

jinan jî dîsanê bi elîf û tayan tên, mesela: Ummu Kulsûmat û Ummu Rebîat. Yanî birek jinên bi navê Ummu Kulsûm û Ummu Rebîe.

FESIL[2] Di behsa hevenav de ye. Hevenav nav e ji boyî cinsekî min heys'ul-mecmu we'l-efrad. Yanî ew nav ji tevekê re jî têtê gotin û ji ferdekî re jî têtê gotin, mesela: Feresun û Hebeşûn. Feres nav e ji boyî cinsê hesp, her wiha nav e ji boyî hespekî jî. Ê Hebeş nav e ji boyî tevekê Hebeşîyan û dibêjine ferdekî jî ji Hebeşîyan. Dujimariya hevenavên zîruhan bi “ya”a û “n”ûnan pêk têtê, mesela: Fereseyn û Hebeşeyn. Lê belê pirjimariya hevenavên zîruhan bi elîf têtin, mesela: Efrasî û Ehbaş. Yanî birek hespan û birek Hebeşîyan ku mirad jê pirjimarî ye. Ê hevenavên cemîdatan yanî bêruhan, wekî qelem û nîran û kevîr û dar dujimariya van jî bi “y”a û “n”ûnan çêdibe, mesela: Qelemeyn û elemeyn û hecereyn û şecereyn, yanî ji yekê jî van du du. Lê belê , pirjimariya hevenavên bêruh dîsanê wekî zîruhan bi elîf çêdibe, mesela: Eqlam û e'lam û ehcar û eşcar têtê gotin.

FESIL[3] Di behsa hokera demî de ye. Hokera demê ew lefz e ku mexsûs e bi demê re, mesela: 'Esr û dehr û weqt. Ev hokera demê tenê xasê bi demê re. Ev jî dujimarî û pirjimarî dibin. Dujimariya hokera demê jî bi “y”a û “n”ûnan tên, mesela: 'Esrey, dehrey, weqteyn, ya du weqtan. Pirjimariya hokera demê ew jî bi *elîf* têtê, mesela: E'sar, edhar, ewqat. Gelek zeman têne miradkirin.

FESIL[4] Di behsa hokera cih de ye. Hokera cih mexsûs e bi navê cihan, mesela: Meşrîq, mexrib, meclis. Yanî cihê derketina rojê û cihê ku roj diçe ava û cîcivîn. Ev hokera cih jî her çî heye, ew jî dujimar û pirjimar dibe. Dujimar, mesela: Meşrîqeyn û mexrîbeyn û meclîsey, bi “y”a û “n”ûnan dujimar dibin. Lê belê pirjimariya hokera cih jî bi elîf têtê, mesela: Meşariq û mexarib û mecalis. Yanî zehf meşriq û mexrib û meclis mirad e, lewra mirad ji pirjimariyê zehfî ye.

FESIL[5] Di behsa navê alavan de ye. Navê alavan ew nav e ku ji boyî tiştê ku tên bikaranîn. Navê alavan jî dujimarî û pirjimarî dibin, mesela: Seyf, qews, rimh. Dujimariya navê alavan jî bi “y”a û “n”ûnan têtê, mesela: Seyfeyn, qewsey, rimheyn. Yanî ji van her yekê du du mirad e. Ê pirjimariya navê alavan jî bi elîf têtê, mesela: esyaf, eqwas, rimah. Yanî ji her yekê van birrek û gelek mirad dibe. Ev behseke qismî bû derbarê rewşa navdêrê de ji zimanê erebî hate beyankirin ji boyî kurdên ku

nû dest pê dîkin, da bi rêbazên ilmê serfê aşîna bibin û wan rêbazan jî heta ku dikarin di zimanê farisî û kurmancî de jî bikar bînin, heta qewetar dikiye [heta qeweta wan digihîjê] zêde dîkin û kitêbên giranbiha yên ilmê serfê bi zimanê erebî dixwînin û fehm dîkin, lewra zaf kitêbên berfireh ên ilmê serfê hene îcarê ev pê zana û alim dibin.

FESIL[6] Di behsa lêkerê de ye. Ji boyî te beyan bikim ku lêker çi ye û çend cure ne û ji boyî lêker çend tişt lazim in û çend kelîme ji lêker cuda dibin û cînavkên her lêkerekê çi ne bi awayekî berfireh, lê belê bi puxteyî ji kitêbên erebî dê îfade bibe, eger Xwedê teala tewfîq bide. Lêker çend cure ne, wateya lêkerê hedes e, yanî bûyîna îşekî ye ku peyda dibe. Pêşî ji boyî lêkerê raderek lazim e ku lêker bi cureyên xwe ji wî mesderî şeq bibe, yanî cuda bibe. Lêker an sulasî dibe, yanî sêherfî. Yan rubaî dibe, yanî çarherfî dibe. Ji du qisman zêde lêkera mucered nabe. Lakîn paşî herfekê û du û siyan lê zêde dîkin, ji wê lêkerê re “mezîdufîhî” dibêjin. Lêkera sulasî ku seherfî ye, sulasîyê mucerred dibêjin. Lêkera ku rubaî yanî çarherfî ye, rubaîyê mucered dibêjin. Eslê lêkeran ev herdu ne, lakin paşî bi heseb pêdiviyê herfekê lê zêde dîkin. Eger ew lêker di esil de sulasîyê mucerred e bi zêdekirina herfekê dibe sulasîyê mezîdu fîhî, mesela: Kereme li wezna fe‘ele, yekremu li wezna yef‘elu. Keremen rader e, hemû lefz ji raderê cuda dibin. Lêker bê rader nabe, elbete rader lazim e ku lêker ji wê şeq bibe, yanî esl e, tê zanîn ku ji eslê fer’ cuda dibe. Rader herçî ku hene esl in û tevekê lêkeran ji raderê cuda dibin. Yanî mesder, esl û cîderka wê lêkerê ye, mesela: Rader kereme bû, elîfek lê zêde bû îcarê bû ekreme, yekremu, îkramen, li wezna: Ef‘ele, yef‘elu, îf‘alen. Ji vê babê re, babê ef‘al dibêjin. Weku herfek zêde bû, wate jî zêde bûye. Ji vê babê re, ef‘elutefddîl dibêjin. Yanî zêde kerem kir, eve lêker kerem mazî, yanî delalet dike ev di zemanê mazî de, yanî di zemanê berî niha, borî de kiriye. Lêker bi xeyr ji mazî jî çend qism hene, lê belê lêkera mazî mexsûs e bi zemanê borî, îlla qismên lêkeran ev in ku têne beyankirin. Lêkera muḍarî‘ jî heye, lêker muddarî‘ muşterek e di nêv dema hazir û dema bê, eger elametekî dema bê digel wê hebe, mesela: Yedrîbu el an, yanî niha lê dide. Lefzê el an, elametê hazirî ye. Seyuddrîbû, yanî ji niha bi şûn ve dê lê bixe. Lêker, diyarkirî heye. Lêkera nediyarkirî ew e ku kirdeyê wê kifş e, mesela weku: Nesere Bekir, yanî nisret kirye Bekirî. Lêker, nediyarkirî jî heye. Nedyarkirî ew lêker e ku kirdeyê wê ne diyar e. Ew lêker bûye, lakin wê kiriye nediyarkirî, mesela weku: *Surîqe û qutîle*

yanî hatiye dizîn û hatiye kuştin di zemanê borî da. Lakin kirdeyê wê dizîn û qetlê kifş nîne. Lêkera muḍarî [dema niha] jî diyarkirî û nediyarkirî dibe. Mîsala weku diyarkirî be weku niha: *Yekûnu 'l-emru we ye 'ûdu 'l-mer'û*, yanî: Dê ev şuxil bibe û vegere. Kirdeyên şuxil û vegerînê kufş in. Mîsala weku lêkera muddari nediyarkirî be û kirdeyê wê nediyarkirî be, weku niha: *Yeqtîlu we yeddrîbû*, yanî dê bête qetilkirin û dê bête lêdan. Lê belê kirdeyê wê lêkerê, nediyarkirî ye. Ji vê lêkerê re binamefûl dibêjin. Lewre biresera wê diyarkirî û kirdeyê wê nediyarkirî ye. Ferman û neyînî jî ji lêkera muddarî tên. Lê belê ji lêkera mazî ferman û neyînî nabin. Lewre ew lêker bûye û çûye, boriye. Ferman û neyînî lazim in ku di hazirî de bibin weyaxûd di demên bê de bibin ku bête îcrakirin. Mazî îcra bûye, êdî ferman di wê de nabe.

FESIL[7] Lêkera gerguhêz heye û lêkera negerguhêz heye. Lêkera gerguhêz kirde û bireser dixwaze. Gerguhêz bi wateya mutecawiz e, yanî ji kirdeyê tê pê û bandorê li ser bireserê dike, mesela: *Qetele Zeydun Bekiren*. Zeyd kirdeyê qetlê ye, lewre qetl ji Zeydî peyda bûye û bandorê li ser Bekirî kiriye. Ew Bekir bireser e, lewre Bekir hatiye kuştin. Lêkera negerguhêz heye. Lêkera negerguhêz ku di nefsa kirdeyê de ye, ji nefsa xweyî derbaz nake. Ji boyî lêkera negerguhêz îdî bireser zerûr nîne, mesela meku niha: *Husnun we qubhun, li wezna fê 'lu 'l-mazî*. Yanî xweyê husn [delalî] e û xweyê qubh [nedelalî] e. Di berî niha de ev husn û qubh ji kirdeyê cuda nabin û li ser kesekî bandor nakin, belku di nefsa kirdeyê de ye, îdî bireser lazim nîne. Lêkera dema borî eger sêherfîya xwerû û eger çarherfîya xwerû û eger sêherfîya bi zêdehî ye û eger çarherfîya bi zêdehî ye û eger gerguhêz û eger lêkera negerguhêz û eger lêkera dema niha, di van tevekan de yekjimar û dujimar û pirjimar û hazir û ne hazir û nêr û mê û kesê yekemîn yekjimêr û kesên yekemîn pirjimêr e kifş in û her yek in, cuda cuda lefzek heye ku ji lefzê diyar dike ku kirdeyê wê lêkerê kî ye û çend in û çi cins in, ne hazir û hazir be bi tertîb zikir dibe. Mesela: *Qetele*. Yanî kuşt, di zemanê borî de, yekjimarê mêr ê nehazir. Cînavka yekjimar a mêrên nehazir “hû” ye. *Qetela*. Yanî kuşt, di zemanê borî de du nefer mêrên nehazir. Cînavka dujimariya mêrên nehazir “hûma” ye. *Qetelû*. Yanî kuştin, di zemanê borî da, gelek mêrên nehazir. Cînavka pirjimariya mêrên nehazir lefzê “hûm”. *Qetelet*. Yanî kuşt, di zemanê borî de, jineke nehazir. Cînavka yekjimar a jinên nehazir “hî” ye. *Qeteleta*. Yanî kuştin, di zemanê borî de, du jinên nehazir in. Cînavka dujimarî ya

jinên ne hazir jî lefzê “huma”. *Qetelne*. Yanî kuştin, hinek jinên ne hazir, di zemanê borî de. Cînavka pirjimarî ya jinên ne hazir “hunne” ye. *Qetelte*. Yanî te kuştiye, ey kesekê mêr ê hazir, di zemanê borî de. Ev xîtab e digel wî hurûfê rûbirû xeber dide. Cînavka kesê mêr ê ku hazire jî “ente” ye. *Qeteltuma*. Yanî we herdukan kuşte, di zemanê borî da, ey herdu mêrên hazir. Cînavka dujimar a mêrên hazir î lefzê “entuma” ye. *Qeteltum*. Yanî we kuştiye di zemanê borî de, gelî mêrên hazir. Cînavka pirjimarî ya mêrên hazir jî “entum” e. *Qeteltê*. Yanî te kuşt di zemanê borî de, ey jineke hazir. Cînavka yekjimar a jinên hazir jî lefzê “entê” ye. *Qeteltuma*. Yanî we herdukan, ey dujimariya jinên hazir kuşt di zemanê borî de. Cînavka dujimarî ya jinên hazir jî lefzê “entuma” ye. *Qeteltunne*. Yanî we cematekê kuşt, gelî jinên hazir di zemanê borî de. Cînavka pirjimarî ya jinên hazir jî lefzê “entunne” ye. *Qeteltu*. Yanî lêkera kesê yekemîn ê yekjimar e, min bi tenê kuşt di zemanê borî da. Cînavka kesê yekemîn ê yekjimar jî lefzê “ena” ye. *Qetelna*. Yanî lêkera kesê yekemîn ê pirjimar e, yanî me di zemanê borî de kuşt. Cînavka kesê yekemîn ê pirjimar jî lefzê “nehnu” ye. Ev çardeh sîxe ku ji lêkera dema borî bi tertîb digel cînavkên xwe hatine beyankirin. Û du sîxe bi xeyr ji van dîsanê ji lêkera dema borî cuda dibin ku sîxa muntehayê ceman dibêjin. Yanî dawiya pirjimaran e, weku niha, mesela: Qewatîlu, qewatile dibêjin. Yanî cemaetek ji qatilan. Lê belê îdî nêrîtî û mêtîtiya wê ne diyar e. Ev mînakên lêkera gerguhêz bûn sîxa bi sîxe, lê belê mînakekê jî ji lêkera ne gerguhêz ji boyî te bi tevahî bilêv bikim da lêkerên mayî tu jî li van qiyas bikî û tertîba sîxên wan dirist bizanî.

FESIL[8] Ev îcarê zikra sîxene pêkve beyan dibe û cînavk jî veşarî ne: *hesene, hesena, hesenû, hesenet, heseneta, hesenne, hesente, hesentuma, hesentum, hesentê, hesentuma, hesentunne, hesentu, hesenna*. Sîxa muntehayê ceman jî hewas in û melûmê te bibe ku lêkera nêr a negerguhêz ku hesene bû, ew herdu lêker jî ev sîxeyên cihêreng ji radera herdu lêkeran şeq û cuda bûne ku **qetl** û **husn** in. Û pirjimariya lêkerên sêherfî û çarherfî û lêzedekirî nabin lêker, belkî lêkernav û biresernav jî ji raderê cuda dibin. Çawaniya lêkernav û biresernavan jî ji boyî te beyan bikim:

FESIL[9] Lêkernav yanî navê ji boyî kirdeyê lêkerê. Di lêkernav de jî yekjimarî û dujimarî û pirjimarî û nêr û mê hene. Û sîxa muntehayê ceman jî têtin.

Lê belê hazir û nehazir, diyar nake. Mînaka kirdenavê wekî niha: *Nasîru*, yanî mêrek alîkarî kir. *Nasîranî*, yanî du mêran alîkarî kirin. -*Nasîrûne*, yanî gelek mêran alîkarî kirin. *Nasîretu*, yanî jinekê alîkarî kir. *Nasîretanî*, yanî du jinan alîkarî kirin. *Nasîratun*, yanî gelek jinan alîkarî kirin. *Newasîrû*, *newasîre*, yanî alîkarî kirin çend kom ji koman.

FESIL[10] Zikir û beyana biresernav lazim e. Biresernav jî nav e ji boyî wî kesî û ji boyî wî şexsê ku ew lêker li ser wî pêk tê. Biresernav jî yekjimarî û dujimarî û pirjimarî û nêr û mê dibe. Lê belê dem jê fehm nabe, meger qerîneyek ku delaletî li ser demê bike digel wê kirdenavê bête zikirkirin, îcarê ji wê qerîneyê dem fehm dibe û sîxeya muntehayê ceman jî ji biresernavê tê, mesela: *Mensûru*, yanî alîkariya mêrek bûye. *Mensûranî*, yanî alîkariya du mêran bûye. *Mensûrûne*, yanî alîkariya gelek mêran bûye. *Mensûretu*, yanî alîkariya jinekê bûye. *Mensûreteynî*, yanî alîkariya du jinan bûye. *Mensûratun*, yanî alîkariya gelek jinan bûye. Sîxa muntehayê ceman jî: *Menasîrû*, *menasîre*, yanî alîkariya çend koman bûye. Ev mînak hemû derheqê lêkera sêherfî de bûn. Wezna lêkera sêherfî ya xwerû (fe‘ele) ye, ji “f”aya fe‘eleyê ra (fau‘l-fê‘l) dibêjin û ji “e”yna fe‘eleyê ra (‘eynu‘l-fê‘l) dibêjin û “I”ama fe‘eleyê ra (lamu‘l-fê‘l) dibêjin. Mirad ji vê beyanê ew e ku da tu bizanî sê tîpên illê hene ku: Elîf, waw û yê ne. Eger di lêkerê de ji van her sê tîpan tunîne, ji wê lêkerê re re *salim* dibêjin. Mesela weku niha: *derebe* ye, ji van herfan *salim* e. Eger ji van her sê herfan herfek di lêkerê de hebe, ji lêkerê re *mu‘tel* dibêjin, yanî xweyî illet e. Lewre ev tîpane bi yekûdu diguherin dibin, mesela: **Waw** werdigere *elîfê*, ya werdigere *elîfê*. Sebebê vê xeberê, ji wê lêkera ku tîpên illê tê de hene *mu‘tel* dibêjin. Eger tîpa illê di destpêka lêkerê de hatibe, ji wê lêkerê re *mu‘telu‘l-fa* dibêjin, mesela weku niha: *We‘ede* û *yesere* ye. Eger tîpa ille di nivê lêkerê de hatibe, ji wê lêkerê re *ecwef* dibêjin, yanî *ecwef* bi ma‘na derûn e. Yanî ew lêkera illê di nivê lêkerê de hatiye, mesela weku niha: *Ba‘e* û *habe* ye. Eger ew tîpa illê di dawiya lêkerê de hatibe, ji boyî wê lêkerê naqis dibêjin. Yanî di herekeyê da nuqsan e, lewre dawiya wê lêkerê ku tîpên illê bin. Ew tîp, bi piranî herekeyê qebûl nakin, lewre dibêjin wê *lêkera naqis*, mesela weku niha: *Xeza*, û ‘*esa* û *rema* ne. Eslê van fê‘lan *xeziye* û ‘*esiye* û *remiye* ne. Dawî ku tîpên illê bûn, tîpên illê meftûh berî wê sakin qaîde ye werdigere *elîfê*, *tîp guherîne elîfê*, îcar bûne *xeza* û ‘*esa* û *rema*. Evne

lêkerên dema borî ne. Lê belê di demên niha yên van lêkeran jî anegora meqamê diguhere û vediguhere.

FESIL[11] Ev behsa lêkera dema niha dike. Lêkera dema niha muşterek e di nîveka hazir û dema bê de, lê belê bi nîşaneyê ferqa hazir û dema bê dibe, mesela weku niha dibêjin: *Ye'kulu elan*. Yanî dê niha bixwitin. Lefzê *elan* nîşaneya hazirî ye. *Yecûu xeden*. Yanî dê sibeyê bêtin. Ev lefz *xeden* bûye nîşaneya lêkera dema niha ku *yecî* e bi dema bê ji lêkera dema niha emrê hazirî têtin. Lewre, emir ew e ku weqtê wê neboriye ku emr bike. Ew şuxlê ku bibe lêkera dema borî, borî ye, bûye û çûye, îdî emr di wî de nabe. Lê belê lêkera dema niha mewcûd e, emir dibe û di emirê de jî gayib nabe, îlla dê hazir bin, şeş sîxe tên yekjimar û dujimar û pirjimar û nêr û mê melûm e, mesela weku niha: *Idreb* dibêjin, yanî lêxe ey mêrê hazir. *Iddreba*, yanî lêxin ey herdu mêrên hazir. *Idrebû*, *lêxin* ey gelî mêrên hazir. *Idrebê*, yanî lêxe ey jina hazir. *Idreba*, yanî lêxin ey herdu jinên hazir. *Idrebne*, yanî lêxin ey gelî jinên hazir. *Neyînî* jî bi vê rewşê şeş sîxe dibin, mesela weku niha: *La tef'el*, yanî meke ey mêrê hazir. *La tef'ela*, yanî mekin ey herdu mêrên hazir. *La tef'elû*, yanî mekin ey mêrên hazir. *La tef'elê*, yanî meke ey jina hazir. *La tef'ela*, yanî mekin ey herdu jinên hazir. *La tef'elne*, yanî mekin ey jinên hazir. Ev sîxe û lefzên lêkera sêherfîyên xwerû bûn hatin beyankirin. Lazim e mîsalekê ji lêkera çarherfîyên xwerû zikir bikin, lewra sîxên wan jî cuda ne. Mesela lêkera çarherfîya xwerû wekî niha: *Dehreçe*, li wezna *fe'lele* dema borî. *Yudehrîcu*, li wezna *yufe'lîlu*, dema niha. *Dehreceten*, rader e. Ev kirdenav û sîxên mayî hemû ji raderê cuda dibin, lê belê lêkernav û biresernavên lêkera çarherfî û pênerherfî û şeşherfî bin, “mîm”ê tên. Mesela wekî çarherfîya lêkernav: *Mudehrîcu*, yanî mehr ke yekî mêr. *Mudehrîcanî*, yanî mehr kin didoyên mêr. *Mudehrîcûne*, yanî mehr kin gelî mêran. *Mudehrîcatu*, yanî mehr ke yeka jin. *Mudehrîcetani*, yanî mehr kin didoyên jin. *Mudehrîcatun*, yanî mehr kin gelî jinan. Ev şeş sîxe di kirdenav de tên, dawîya kelîmeyê zêr e, lê belê di biresernav de dawîya kelîmeyê ziber e, bi vê herekeyê ferq dibe, mesela wekî niha: *Muqettele*, yanî hatiye kuştin yekî mêr. *Muqettelani*, yanî hatine kuştin du mêr. *Muqettelûne*, yanî hatine kuştin gelek mêr. *Muqatteletê*, yanî hatiye kuştin yeka jin. *Muqetteleteynî*, yanî hatine kuştin du jin. *Muqettelatun*, yanî hatine kuştin gelek jin. Van kirdenav û biresernavan jî wezin hene, madam ku ji raderê şeq dibin hemûyan wezin hene, di sêherfîyan de wezna *fa'il* ji boyî kirdenavan wezn e, *mef'ûl* ji boyî

biresernav wezn e û ji boyî kirdenavê çarherfî *mufe 'lilun* wezn e û ji boyî biresernavê çarherfî re *muf'elun* wezn e û ji boyî lêkera şeşherfî jî di kirdenav de *mustef'ilun* û ji boyî biresernav, *mustef'elun* wezn e. Me 'na weku niha: *Mustexrec* dibêjî, yanî kirdenav e ji wê deranînê re. Ev kirdenav e û biresernav nav e ji boyî wî tiştê ku têtê bideranîn, wekî niha: *Mustexrecun* dibêjî, yanî ew tiştê ku hatiye bideranîn.

FESIL[12] Di behsa daçek û nîşaneyên lêkera dema niha de ye. Tu bizanî ku ji boyî yekjimar û dujimar û pirjimariya mêrên nehazir lefz “y”a ye. Wekî niha: - *Yerkebu, yerkabanî, yerkebûne*. Û ji boyî *mufredî* û *tesniya muennesêd gayib* jî lefz “t”a ye, weku niha: -*Terkebu, terkebanî*. Ji boyî pirjimariya jinên ne hazir dîsanî lefz “y”a ye, wekî niha: -*Yerkebne* dibêjî. Û ji boyî kesê mêr ê hazir û ji boyî dujimarîya mêrên hazir û ji boyî pirjimariya mêrên hazir û ji boyî yekjimarîya jinên hazir û ji boyî dujimarî û pirjimariya jinên hazir lefz “t”a ye. Mesela wekî niha: *Terkebû*, yanî siwar dibe kesê mêr ê hazir. *Terkebanî*, yanî siwar dibin du mêrên hazir. *Terkebanî*, yanî siwar dibin gelek mêrên hazir. *Terkebîne*, yanî siwar dibe kesa jin a hazir. *Terkabanî*, yanî siwar dibin du jinên hazir. *Terkebne*, yanî siwar dibin gelek jinên hazir. Û ji boyî kesê yekemîn ê yekjimar lefz *elif* e, mesela wekî niha: *Eerkebu*, yanî ez dê siwar bibim. Û ji boyî *kesê yekemîn ê pirjimar* jî lefz “n”ûn e, mesela wekî niha: *Nerkebu*, yanî em dê siwar bibin.

FESIL[13] Di lêkeran de cînavk lazim e. Bê cînavk, lêker nabe. Eger lêkera dema borî û eger lêkera dema niha û eger kirdenav û eger biresernav, xulase herçî ku lêker bin, elbete dê cînavk hebin. Cînavkan jî ji boyî te bijmêrim da me 'lûmê te bibe. Me 'lûmê te bû ku lêker eger dema borî û eger dema niha çardeh sîxe hene. Ji boyî her yekê cuda cuda cînavkek heye, mesela wekî niha: *Derebe* dema borî, *yedrîbu* dema niha. Ji boyî kesê mêr ê ne hazir. Cînavka yekjimarîyê “hu” ye. *Dereba, yedrîbanî*, ji boyî dujimarîya mêrên ne hazir in. Cînavka dujimarîyê “huma” ye. *Derebû, yedrîbûne*, ji boyî pirjimariya mêrên ne hazir in. Cînavka pirjimariya ne haziran “hum” e. *Derebet, tedrîbu*, ji boyî yekjimarîya jinên ne hazir e. Cînavka yekjimarîya jinên ne hazir jî “hî” ye. *Derebeta, derebetanî*, ji boyî dujimarîya jinên ne hazir e. Cînavka wan jî “huma” ye. *Derebne, yedrîbne*, ji boyî pirjimariya jinên ne hazir e. Cînavka wan jî “hunn” e. *Derebte* dema borî, *teddrîbu* dema niha, ji boyî yekjimarîya mêrên hazir. Cînavka wê jî lefzê “ente” ye. *Derebtum* dema borî,

tedrîbûne dema niha, ji boyî pirjimariya mêtên hazir. Cînavka wê jî lefzê “entum” e. *Derebtê* dema borî, *tedrîbîne* dema niha, ji boyî kesa jin a hazir e. Cînavka wê jî “entê” ye. *Derebtuma* dema borî, *teddrîbanî dema niha*, ji boyî dujimariya jinên hazir e. Cînavka wê jî “entuma” ye. *Derebtunne* dema borî, *teddrîbne* dema niha, ji boyî pirjimariya jinên hazir e. Cînavka wê jî “entunne” ye. *Derebtu dema borî*, *eddrîbu* dema niha, ji boyî kesê yekemîn ê yekjimar. Cînavka wê jî “ena” ye. *Derebna* dema borî, *neddrîbu* dema niha, ji boyî kesê yekemîn ê pirjimar e. Cînavka wê jî “nehnu” ye. Cînavkên yekjimar û dujimar û pirjimar û mêtên û jin û kesê yekemîn ê yekjimar û kesê yekemîn ê pirjimar ev bûn ku beyan bûn. Di kelimê Erebî de dayîm yekjimar û dujimar û ne hazir û hazir û kesên yekemîn ji axaftinê ferq dibin, lewre nîşane hene. emmadi zimanên mayî wusa nînin, lazim e cizwek ji wan jî bête beyankirin.

FESIL[14] Di behsa *herfê* da ye. Tu bizan! Ku *herf* ew lefz e ku daîma tabî ‘ e, heta tabî ‘ ne be bi nefsa xwe bi xwe wateyeke temam nade, belkî wate heye lê belê wekî digel pêşiya xwe û paşiya xwe nebe ew wate durist nabe. Lê belê *herf* zaf in, hemû di vê puxteyê de nayêne hêjmartin. Hindekî ku zêde ji boyî axaftinê zerûr û lazim in beyan bikim. Di behsa *herfê* da ne: *Herf* ew e ku tabî ‘ e, bê tabî ‘îyet fayde nade. *Herf* jî zaf in, lê belê çendekî ku zêde tînin bikaranîn beyan bikin: *Înne* û *enne* û *qed* û *elbete* û *labudde*: Ev ji boyî tehqîq in, wekî di kelimê de carî bibin yanî muheqqeq ku ev xebera wuha ye, lê belê bê pêşî û paşiyê fayde nadin. *Heta* û *îla*: Ev herdu jî ji boyî dawî û xelasiyê ne, yanî mesela wekî niha: *Sîretu île’l-besretî*. Yanî ez çûm û dawîya seyra min heta Besrayê bû. *We ekeltu’s-semekete hete’r-re’sî*. Yanî min masî xwar, heta serî jî xwar. *Mîn* û *mîne*: Ev her du jî ji bo destpêkê ne û bi wateya “ji” ne, mesela wekî niha: *Mîne’l-beledî* û *mîne’n-neharî*. Yanî ji bajarî û ji destpêka sibeyê. *Î meta* û *heysu*: Ev her du jî, (meta) bi wateya kengê ye û (heysu) jî bi wateya li ku ye ya *kengê* û li kû, mesela wekî niha: *Meta yecîu’l-emîru?* *We heysu yûcedu’l-esedu?* Yanî kengê mîr tî û li kû şêr bi dest dikeve? *La* û *ma*: Ev her du jî ji boyî nefî û tuneiyê ne, weku niha mesela: *La rubhe fîhî*, *we ma xeyre fîhî*. Yanî feyde û xêr di vê şolê de nînin. *Ew*, *emma*, *lakîn*: Ev her sê ji boyî gumana di kelimê de ne, bi guman e, wekî niha mesela: *Cae Zeydu ew ‘Emru*. Yanî aya Zeyd hatiye yan ‘Emr hatiye. Ev, meşkûk e. *Rizau’l-qewmîemmaena!* Yanî qewm razîne, emmariza min bi guman e! *Cae’l-beledîyyune we lakîne’l-emîru*. Yanî ehlê bajêrî hemû hatine lê belê

hatina emîrî bi guman e! *Û 'ela* û sewa: *'Ela* ji boyî *îstî'la* ye, yanî li ser banê û deyn li ser filankesî ye. *Û len* û *lem*: Ev her du jî ji boyî neyiniyê ne, bi wateya *la* û *ma*. Lê belê di lêkerên dema niha de û di fermanê de dibin, mesela wekî niha: **Len** *yunserî'l-sultanu* we **lem** *yehsulu'l-muradu*. Yanî xundikar alîkarî nade me û meqseda me hasil nabî. *-Xeyr û ma'eda*: Ev herdu jî bi wateya cuda ne, mesela wekî niha dibêjî: *Zarenî'n-nasu xeyru'l-emîrî*. Yanî ziyareta min kirin tevekê xelkê, lê emîrî ziyareta min nekiriye. *Ma sumtu ma'ede* 'l-yewmu. Yanî min rojî negirtiye, lê rojekê girtiye. *Û maxela*: Ew jî bi wateya *ma'eda* ye, yanî xeyr ji yekê. *Ledey*: Ew jî bi wateya *inde* û *nik* e, mesela wekî niha dibêjî: **Ledeyi** 'l-murafti'etu. Yanî li nik murafti'eyê. *Bel*: Ev jî bi wateya *belkî* ye û ji boyî subût e wekî niha dibêjî: *Ma qetele'l-emîru bel mate*, Yanî ew mîr qetil nekîr, belku bi xwe miriye. Ji boyî tesbîtê ye. *Û 'en*: Lefzê *'en* herf e, ji bo "ji" ye. Wekî niha: **'Eni** 'l-beledî, we **'eni** 'l-hukkamî, dibêjî. Yanî ji bajarî û ji nik hakimî. *Û key*: Ev jî mexsûs e bi zemanî, weqtî. Wekî niha dibêjî: **-Key** *qetele'l-xurrassûne*? Yanî çi zemanî diz hatine qetilkirin. *Leyte* û *le'elle*: Ev herdu jî ji boyî temenî û hêvî û rica ne, weku niha dibêjî: **Leyte** 'ş-şebabe ye'ûdu yewmen. Yanî xweziya ku ciwanî rojekê ewde bikira, yanî vegeriya. Ev *leyte* ji boyî temenna û ricaya tiştên muhal e. Lewre vegeryana ciwaniyê xeyrê mumkin e. Lê belê *le'elle* ji boyî rica û daxwaza tiştên mumkun e, wekî niha dibêjî: **Le'elle** 'l-lahu şifanî. Yanî xweziya cizbê Xwedê te'ala şîfa bide min. Yanî rica û hêviya şîfayê dike. Ev şîfa ji aliyê Xwedê ve mumkun e. *Haşa* û *kela*: Ev herdu jî ji bo înkâr û neyiniyê û tune ne, ji boyî sondê, wekî niha dibêjî: *Haşa û kela ma fe'elet*. Yanî di meqamê qesemê de ye ku ez sond dixwîm ku min ev şola nekiriye. Fê'la wê şolê, înkâr û nefî dike. *B*: Ev herfa *care* ye, ji boyî arîkarî dibe, wekî niha: **Bismîllahî**. Yanî bi arîkariya navê Xwedê te'ala. *Û* ji boyî qesemê tê, wekî niha: **Billahî**. Yanî sondê dixwîm bi navê Ellah te'ala. *Û* ji boyî mûsahebet jî tê, mesela wekî niha: *Tekelemtu bî Zeydîn*. Yanî min mûsahebet digel Zeydî kir û xeber da û bi wateya digel. *F*: Ev herfa jî, ji boyî zerfîyet e daîma. Wekî niha dibêjî: *Dexeltu fî'd-darî*. *We nezertu fî'l-kîtabî*. Yanî ez ketim xanî û min li kitêbê nihêrî. Xanî *zerf* e û tu *mezrûf* î, lewre tu ketî nava xanî. Eve mesela *zerfê* heqîqî ye, lakin: *Nezertu fî'l-kîtabî* *zerfê* mecazî ye, tu nakevî nava kitêbê belku nêrîna te dikeve nava kitêbê, lê belê ev *zerf* mecaz e. *W(aw)* û *tê*: Ev herdu herfana mexsûs in ji boyî sondê, wekî miha: **We** 'l-lahî û **bi** 'l-lahî û **te** 'l-lahî dibêjî. Yanî ez sondê dixwîm bi Xwedê. *W(aw)*: Ji boyî 'etfê jî bihesibînî li ser

hukmê pêşiya wê, mesela wekî niha: *Cae Muhammed we Ehmed we Bekir*. Yanî ew hukmê ku hatine di wê kelîmê de Ehmed û Bekir jî têde ne. Yanî Muhemed jî û Ehmed jî û Bekir jî hatin. Kurte: Herf û behsa herfan zaf e. Lê belê ji boyî yên ku nû dest pê dikin ev çend bes e. Ev zebt bike, paşî ji kitêba serfê Se‘dîn Teftezanî serbikevî bixwînî, kine û mahîyetê dê bizanî. Hinek wê me‘lûmê te bibe ku ev herfane bi bal cînavan ve tî sipartin û hindik ji herfan weqtê sipartina cînavan, mê û nêr û yekjimar û dujimar dibin. *Haza* û *za*: Ev herf in. Lê belê *esmau’l-işarat* (cînavên şanîdanê A.Ü.) dibêjine van. *Haza*, ji bo yekjimariya nêrê hazir e, yanî ev. *Hazeynî*, ji boyî dujimariya nêrên hazir e, yanî ev herdu. *Haûlaî*, hem ji boyî pirjimariya nêrên hazir e, yanî ev pirjimar in. *Hazîhî*, ji boyî yekjimariya jinên hazir e, yanî ev jin e. *Hateynî*, ji boyî dujimariya jinên hazir e, yanî ev herdu jin. *Haûlaî*, ji boyî pirjimariya jinên hazir e, yanî gelek jinên hazir. *Zake*, ji boyî yekjimariya mêrê hazir e, yanî mêrekî hazir. *Zakuma*, ji boyî dujimariya mêrên hazir e, yanî ev herdu neferên mêr ên hazir. *Zakum*, ji boyî pirjimariya mêrên hazir e, yanî gelek mêrên hazir. *Zakê*, ji boyî yekjimariya jinên hazir e, yanî jinek. *Zakuma*, ji boyî dujimariya jinên hazir e, yanî gelek jin. Herfên mayî jî bi cînavkên pêvebestî dibin û yekjimar û dujimar û pirjimar dibin, mesela wekî niha: *Înneke*, ji boyî yekjimariya mêrê hazir e, yanî teqez tu. *Înnekuma*, ji boyî dujimariya mêrên hazir e, yanî teqez hûn herdu. - *Înnekum*, yanî teqez ku hûn gelek mêrên hazir. *Înnekê*, ji boyî yekjimariya jina hazir e, yanî teqez tu ferdeke jin. *Înnekuma*, ji boyî dujimariya jinên hazir e, yanî teqez hûn herdu jinên hazir. *Înnekunne*, ji boyî jinên hazir e, yanî teqez hûn gelek jin. *Mînke* û *‘enke* û *bike* û *leke* û *mînkuma* û *‘enkuma* û *bikuma* *lekuma* û *mînkum* û *‘enkum* û *bikum* û *lekum* û herfên mayî jî li van qiyas bike. Lewre bi berfirehî zîkr û beyan bibe, dirêj dibe û ji zihna zarokan zêde dibe.

FESIL[15] Di behsa serfa luxetê farisî de ye. Melûmê te bibe ku di zimanê farisî da jî lêker û kirde û rader û kirdenav û biresernav û dema borî û dema niha û ferman û neyînî û nehazir û hazir û yekjimar û dujimar û pirjimar û cînavak ev hemû hene. Lazim e ku ji van jî hinekî ji boyî te beyan û neqîl bikin, da ku bi kelamê farisî jî aşîna bibî, wexta xebirdanê nexelîtî û sewqa kelamê melûmê te bibe.

FESIL[16] Di behsa lêkera dema borî de ye. Ji lêkera dema borî, di farisî de çar lefz ji raderê cuda dibin. Îdî zêde nabe ferqa dujimarî û pirjimarî û mê û nêr û

hazir û nehazir. Di dawiya lêkerê de bi nîşaneyekê dibe, mesela wekî niha: *Reft*, lêkera dema borî ye, raderê wê *reften*, ji bo yekjimariyê ye, ne hazir çi nêr çi mê ferqî nîne. Yanî çûye di zemanê borî de mirovek. Û ji bo hazirî “y”ayek di dawiyê de zêde dibe ew nîşaneya hazirî û xîtabê ye, mesela wekî niha: *Reftî* ye. Ev ya ji boyî yekjimariya muxateb e çi nêr, çi mê ye. Yanî tu çûyî ey kesê/a muxatebe di zemanê borî de. *Reftîd*: Îcarê di axirê lefzê “n”ûn û “d”al nîşaneyên dujimarî û pirjimariyê ne. Yanî hûn çûn di zemanê borî de ey dujimarî û pirjimariyên muxateban çi nêr çi mê. *Reftend*: Ji boyî dujimarî û pirjimariyên gayiban e, çi nêr, çi jin. Yanî di zemanê borî de çûne dujimarî û pirjimariya gayiban çi nêr, çi mê. Ji lêkera dema borî ev çar sîxe bider dikevin û nîşaneya kesê yekemîn ê yekjimar jî “m”îm e, wekî niha: *Reftim*. Yanî di zemanê borî de ez bi xwe çûme. Û ji boyî kesê yekemîn pirjimar jî nîşane “m”îm û “y”ayek e, wekî niha: *Reftîm*. Yanî em di zemanê borî de çûne.

FESIL[17] Di behsa lêkera dema niha de ye. Nîşaneya lêkera dema niha jî “m”îm e, bê wê nabe, (da tê de ya lêkerê)²⁰⁶ “m”îm ku nîşaneya dema niha ye lazim e. Wekî niha: *Mîrevî* û *mîreved* û *mîrevîd* û *mîrevend* û *mîrevem* û *mîrevîm*, şeş sîxe dibin. *Mîrevî*, yanî tu diçî ey muxateb, niha yan paşê. Lewre me ‘lûm e ku dema niha muştêrek e di nêv dema niha û bê de. *Mîreved*, yanî diçe kesê/a nehazir çi mêr çi jin. *Mîrevîd*, yanî diçin du nefer û gelekên muxateb çi mêr, çi jin. *Mîrevend*, yanî diçin gelek kesên nehazir çi mêr, çi jin. *Mîrevem*, ji boyî kesê yekemîn yekjimar e, yanî ez bi xwe diçim. *Mîrevîm*, kesê yekemîn pirjimar e, yanî em diçin. Nîşaneya kesê yekemîn ê yekjimar û kesê yekemîn ê pirjimar ji herduyan di dawiya kelîmeyê de “m”îm dibe. Lê belê di zimanê kurmancî da pênc sîxe bider dikevin, zêde nabin wekî niha: *Diçî*, *diçe*, *diçin*, *diçim*, *diçîn*. Lêkerên mayî jî li van qiyas bike. Ev pênc sîxan jî cînavkên kurmancî hene. Wekî niha: *Tu*, *ew*, *hûn*, *ewan*, *em*, *me*. Ev şeş zemîn jî cînavkên wan lêkeran digel wan tên bikaranîn.

FESIL[18] Di behsa fermana hazir de ye. Me ‘lûm bibe ku fermana hazir be herfa “b”ayê dibe, wekî niha: “**B**”a, di destpêkê de tê, nîşaneya fermanî ye. Ji kelamê farisî, ew jî dîsanê şeş sîxe dibin, mesela wekî niha: *Bide*, *bidehed*, *bidehîd*, *bidehend*, *bidehem*, *bidehîm*. Bi zimanê kurmancî dîsanê pênc sîxe di fermana hazir de jî dibin, mesela wekî niha: *Bide*, yanî kesekî/e muxateb çi mêr, çi jin. *Biden*,

²⁰⁶ Mîmkun e ev hevoka me xist nav kevanê zêde be.

kesekî/e ne hazir çî mêr, çî jin. *Bidin*, yanî hûn du kes û gelek kesên ne hazir çî mêr, çî jin. *Bidim*, yanî ez ku kesê yekemîn yekjimar im. *Bideyn*, yanî em ku kesê yekemîn pirjimar in, em bideyn.

FESIL[19] Di behsa raderê de ye. *Rader* goya eslê lêkerê ye, bê dem û bê lêker û bireserê teqez îbaret ji wê lêkerê ye. Mesela wekî niha lefzê *lêkerê* bi xwe teqez îbare ji kirinê, lê belê mucered ji demê û raderê ye, yanî ciyê derketin û şeqbûna lêkeran e. Ji lêkeran re *muşteq* jî dibêjin. Lewranê hinde sîxeyên cihêreng ji raderan şeq û cuda dibin ku her yekê cuda cuda wate hene. Lewre berî xweruyê kirin e, paşê dema borî tê û dema niha û kirde û bireser. Ev jî tên: *Kerden*, yanî mutleq kirin. *Borden*, yanî mutleq birin. *Xorden*, yanî mutleq xwarin. Îcarê lêkerên mayî hemû ji raderan cuda dibin, lewre rader dibêjin ku cihê derketina lêkeran e. Para zehf di dawîya raderên gotinên farisî de “**d**”al û “**n**”ûn dibin, ew jî nîşaneyên raderan in. Raderên lêkerên kurmancî jî hisêb ke wekî raderên gotinên farisîyê ne, îla di axirê wan da “**d**”al tune, belku ekserî “**y**”a û “**n**”ûn dibin. Mesela wekî: *Kiriyên* û *biriyên* û *xwariyên*. Yanî teqez kirîn û birîn û xwarîn mirad e. Paşî weku sîxe jî cuda dibin, wê weqtê lêker û kirde û bireser û dema borî û dema niha jî tê zanîn. Di kurmancî de jî nîşaneya lêkera dema niha “**d**”al e, di destpêkê de dibe eger lêker gerguhêz be, mesela wekî niha: *Dide*, *dibe*, *diçe*. Eger lêkera negerguhêz bê, îcarê ew “**d**”al di dawîya lêkerê de heye, wekî niha: *Siwar dibe*, *radibe*, *radike*. Ev jî lêkerên dema niha ne. Nîşaneya lêkera dema niha “**d**”al e, lakin di dawîya peyvê de dibe.

FESIL[20] Di behsa kirdenavê gotinên farisî de ye. Kirdenav navê kirdeyê wê lêkerê ye. Ew jî bi destpêka meddmûm dibe û di dawîya gotinê de jî “**d**”al û “**h**”ayek dibe, mesela wekî niha: *Koşendeh*, *konendeh*, *xorendeh*. Ev yekjimar in, yanî yê ku dîkuje û ê ku dîke û ê ku dixwe. Di lêkerên farisî de bi tenê yekjimar û pirjimar hene, dujimarî jî wekî pirjimariyê ye, lê belê nêr û mê cuda nîn in, belku hemû jî sîxeyek in lê belê dujimarî û pirjimarî jî herdu yek in. Mesela wekî niha: *Koşendekan*[*Koşendegan*] û *konendekan*[*konendegan*] û *xorendekan*[*xorendegan*]. Ev ji boyî dujimariyê jî tênê gotin, yanî du qatil û du êd ku şolkî dîkin û du êd ku dixwin. Û ji boyî pirjiriyekê jî tênê gotin, yanî gelekî qatilan û şolkiran û xwariyan. Lê belê di gotinên kurmancî de bi xweser kirde bi lefz bi tenê nabe, belkî lazim e lefzê “**ê**” di berî wê gotinê de bêne zikirkirin, wekî niha ji boyî yekjimarên: *Ê kuştî*, *ê*

kirî, ê xwarî. Ev yekjimar in çî mêr, çî jin, çî hazir, çî ne hazir. Lê kirdeyên dujimarî û pirjimariyên zimanê kurmancî bi xeyr ji jefzê “ê” di destpêkê de, di dawî de lefzê “n”ûn û “h”ayek dibe ku delalet dike ku ev kirdeyane dujimar weyaxud pirjimar in. Mesela wekî niha: *Ê kuştineh, ê kirineh, ê xwarineh.* Yanî ew herdu û gelekên ku kuştineh û kirineh û xwarineh.

FESIL[21] Di behsa bireserên gotinên farisî de ye. Bireser nav e ji boyî wê tiştî ku ew lêker li ser wî tiştî weyaxud li ser wan herfan pêk hatiye. Mesela: *Meqtûl.* Ev qetla pêk hatiye li ser wê hurûfê. *Û me’kul.* Ev ekla pêk hatiye li ser wî tiştî. Yanî ew hurûf hatiye kuştin û ew tişt hatiye xwarin; bireser e. Eve ye bireser di dawiyê de lefzê “h”a dibe. Wekî niha: *Kuşteh û bireh û xordeh.* Ev ji boyî yekjimar in, yanî yê hatiye kuştin û hatiye birin û hatiye xwarin çî mêr û çî jin, çî hazir û çî ne hazir. Lê ji boyî dujimarî û pirjimariyên bireseran di dawiyê de lefzê “kan” heye ku nîşaneyê dujimarî û pirjimariyê ye, wekî niha: *Kuştekan û birdekan û xordekan.* Ev ji boyî dujimarî weyaxo ji boyî pirjimariyan e, yanî ew dujimarî û pirjimariyên hatine kuştin û birin û xwarin. Lê belê di bireserên zimanê kurmancî de, di dawiyê de lefzê “y”a dibê, ew nîşaneyê bireserê ye, wekî niha: *Kuştiy û biriy û girtiyy.* Ev nav in ji boyî yekjimariyên meqtûl û birî û girtiyan. Yanî ferdek hatiye kuştin û birin û girtin çî mêr, çî jin, çî hazir, çî nehazir. Lê dujimarî û pirjimariyên wan jî yan “elîf” yan û “nûn” dibin, mesela wekî niha: *Kuştiyan, biriyan, girtiyan.* Ev ji boyî dujimarî û pirjimariyên bireseran in. Yanî ew nav in ji boyî dujimarî û pirjimariyên meqtûlan û tiştê birî û girtiyan çî mêr, çî jin, çî hazir û çî jî nehaziran.

FESIL[22] Di behsa neyîniyê de ye. Melûmê te bibe ku nehî *bi wateya* men’e, yanî men’a lêkera şolekî ye. Ew jî ‘eksa fermanê ye, lewre ew, fermana bi lêkera wê şolê ye, Lêkera *nehî* men’a lêkera wê ye, mesela di erebî de wekî niha: *Ef’el! La tef’el!* Yanî *bike* û yanî *meke.* Lê belê ew *nehî* jî di zimanê farisiyê wekî zimanê erebî daçekên nehyê hebin ku nîşaneyên *nehyê* û *nefyê* ne. Nîşaneyên nehyê û nefyê ew herdu herf in: “m”îm û “n”ûn. Ew herdu herf jî mexsûsê lêkera dema niha ne, lewre nehî jî wê di hal û îstîqbalê de bê ku xas e bi lêkera dema niha, lê belê “m”îm jî xas e bi *halî.* Wekî niha: *Mekon,* ji boyî yekjimariya hazir ê bervêder çî mêr, çî jin. Di niha de hazir “mekonîd” ji boyî dujimarî û pijimariyên hazir ên bervêder in, mêr û jin. Yanî hûn nekin ey du kes û gelek kesên hazir ên bervêder,

mêr û jin. Di niha de yanî hazir “*nekuned*” ji boyî yekjimariya ne hazir e çî mêr û jin. Lê belê di zimanê *îstîqbalê* de yanî ji niha bi şûn ve bilanê ew takekes şolê neke. “*Nekonend*” ji boyî teşniye û cem‘ên ne hazir ne ji huzûrê yanî bilanê ew herdu û gelek kesên mêr û jin ku ne hazir in ewê şolê nekin. Nehya kurmancî jî hisêb ke ku ew jî mislê *nehya* farisî ye, ew jî bi “**m**”îm û “**n**”ûn e, wekî niha dibêjî: **Meke/mekin, nekî/nekîn, nake/nakin, nakim/nakeyn.**

FESIL[23] Di beḥsa nehazir û cînavkên wê de ye. Lewre *cînavka nehazir* û *haziran* cuda ne. Lê belê ferqa yekjimarî û dujimarî û pirjimariyê heye. Lê belê ferqa mêr û jinê nabe. Wekî niha: *Û*, yanî yekjimariya nehazir. *Ûnan, ûnha*, yanî dujimariya nehazir a mêr û jin, û pirjimariyeke mêr û jin ên nehazir. *Cînavkên nehazir* ên zimanê kurmancî jî, hisêb ke wekî zimanê farisî ye: *Ew, ewî, wan, ewan.* Cînavkên nehazir ev in me ‘lûmê te ye.

FESIL[24] Di beḥsa *cînavkên hazir* de ye. Ma ‘lûmê te bibe ku ji boyî haziran jî cînavkên mexsûs hene, wekî niha: *To û men û ma û şoma* ye. Yanî : *Tû, ez, em, hûn.* Ev cînavkane zehf mîsal hene, lê belê hinde qeder ji boyî destpêkeran kafî ye. Tefsîla wan ji kitêbên serfê me ‘lûmê te dibe.

FESIL[25] Di behsa *navê zimanê farisî* de ye. Me ‘lûmê te bibe ku navên vî zimanî jî yekjimar û dujimar û pirjimar dibin, lê belê mêr û jin ferq tune. Wekî niha: *Xûk*, yekjimar e. *Xûkan* û *xûkha* pirjimar çî mêr çî jin. Ew lefz, “**h**”aya ku di dawiya navan de tên, ew nîşaneyê cem‘ê ne. Wekî niha: *Ademha* û *kebetha*. Îdî ên mayî jî li vê qiyasê ne. Navên kurmancî jî yekjimar cuda ne, wekî niha: *Merif* û *dar* û *hesp*. Ev yekjimar in, yanî ferdek ji van. Lê belê dujimarî û pirjimariyên wan jî wekî farisiyan bi “**elîf**” û “**n**”ûnan tên, wekî niha: *Merifan, daran, hespan*. Ev ji boyî dujimariyê jî û pirjimariyê jî tên û ferqa mêr û jinê jî nabe. Yanî ji vana herdu û yanî ji vana gelek, herdu jî dibin.

FESIL[26] Melûmê te bibe ku di peyvên farisî de jî wekî zimanê erebî navên şanîdanê hene, wekî niha dibêjî: *În*, ji boyî hazirê yekjimar. *Înha*, ji bo dujimarî û pirjimariyên haziran. *An*, ji boyî yekjimariyên ne hazir. *Anha*, Ji boyî dujimarî û pirjimariyên ne haziran. *Û*, ew jî ji boyî mufredêd gayîbe ne. *Ûnha*, ew jî ji boyî dujimarî û pirjimariyên ne haziran e, navên şanîdanê. *Û* hem navên şanîdanê

kurmancî jî hene, wekî niha: *Ev*, ji boyî hazirê yekjimar çi mêr çi jin. *Evene û evana*, ji boyî dujimarî û pirjimariyên haziran bêyî ferqê. *Ew*, ji boyî yekjimariyên ne hazir in bêyî ferqê. *Wehe*, ji boyî yekjimariya bervêderê hazir e bêyî ferqê. *Wan û ewan*, ev herdu jî ji boyî dujimarî û pirjimariya nehaziran in bêyî ferqê.

FESIL[27] Di behsa *baneşanê* de ye. Melûmê te bibe *nîda* bi wateya *gazîkirin* e, yanî gazî ferdekî weya gelekî bikî. *Ew* jî mexsûs serfa *nîdayê* heye. Di zimanê de “**ya**” û “**wa**” wekî niha dibêjî: **Ya Ebdullah! Wa Ehmed!** Yanî bi herfa *nîdayê* gazî van mirovan dikî ferdaferd. Di *nîdayê* de jî dujimarî û pirjimarî dibe, wekî niha dibêjî: **Ya Ebdullaheyn! We ya Ehmedeyn!** Dujimarî. **We ya Ebdullahûn! We ya Ehmedûn!** Di munada pirjimarî de ne. Di zimanê farisî de herfa *nîdayê* lefzê “**ey**” e, wekî niha dibêjî: **Ey seyyîd û ey seyyîdeh.** *Seyyîd*: Ewladê Resûl ê nêr, *seyyîde*: Ewladê Resûl ê mê. “**H**”aya di dawiyê de nîşaneya mêyitiyê ye. Di zimanê kurmancî jî, herfa *nîdayê* lefzê “**o**” ye, wekî niha dibêjî: **O Miho, o Eysê.** “**Ê**”aya di dawiyê de nîşaneya mêyitiyê ye.

FESIL[28] Di behsa pirsnişanên di zimanên erebî de. Pirsnişan ew e ku dixwaze ku tiştêkê pirsyar bike û fehm bike ku bûye û yan jî nebûye. Herfa îstifhamê jî hemze ye, wekî niha dibêjî: **Ecae fulanun.** Yanî filan mirov hatiye. Bi vê herfê dixwaze ku fehm bike ku ew filan hatiye weyaxud nehatiye. *Pirsnişan* di zimanê farisî û kurmancî de, herdukan jî bi lefzê “**aya**”, wekî niha dibêjî: **Aya filane kar tamamşud.** Yanî dixwaze ku bizane eceb ew şola me’lûm e tamam bû weyaxud nebûye. Ev jî pirsnişana farisî ye. Di zimanê kurdî jî, wekî niha dibêjî: **Aya serê hîvê bûye.** Ev jî îstifhama kurmancî ye.

FESIL[29] Di behsa raveber û ravekerê de ye. Ev raveber û raveker di hemû zimanên de hene û lazim in. Yanî nisbeta tiştêkî bibal yekî dinê didî. *Ew* tiştê berê raveber dibêjin ew tiştê paşî raveker dibêjin, yanî nisbeta tiştêkî bibal tiştêkî didî. Wekî niha dibêjî: *Xulamu emîrîn.* *Xulam* raveber e û *emîr* raveker ye, yanî xulamê mîr. *Û Ibnu Yezîd.* *Îbn* raveber e û *Yezîd* raveker e, yanî kurê *Yezîd*. Eve nisbeta xulamî bibal emîrî û nisbeta îbn bibal Yezîdî ve çêbûye. Ev raveber û raveker di zimanê farisîyê û kurdîyê de jî hene. Lê belê di farisî da tu nîşaneyên nisbetê tunîne, belkî ji rewşa kelamê diyar dike raveber û raveker e. Wekî niha dibêjî: *Esp Xwace û Ferzend Mela.* Lê belê di zimanê kurmancî de nîşaneya raveberê “**y**”a (ango “**ê**”

A.Û.)ye di dawîya raveberê de bilêv dibe, ew nîşane ev in: Raveber û raveker in. Mesela wekî niha: *Hespê Xwace û kurê Mela û xulamê Mîr*. Ev “ê” nîşan dike ku ev raveber û raveker in.

FESIL[30] Ev jî mucered di behsa nisbetê de ye. Mesela wekî mirovekî weyaxu malekê nisbet bidî bibal cihekî. Ew jî di hersê zimanan de jî bi lefzê “y”a (ango “î”) dibe û ji wê “î”yê re “î”ya *nisbetê dibêjin*. *Wekî niha: Bexdadî. Yanî ev mirov mensûbê bibal Bexdayê û ji ehlê wê derê ye. Di zimanê farisîyê û kurdî da jî Besrewî farisî, Şamî bi kurdî.*

FESIL[31] Xetmu’l-kîtab Me ‘lûmê te bibî ey talibê ilmê serfê ku ev ilm zêde fenekî müşkil e û zaf sîxe û i ‘lal û guherîn û cînavk û keyfîyat heyin. Lazim e ku tu bi cid û se ‘î diqet û xîret bikî. Ev hinek rêbazên qismî bûn ku min bi qasî qeweta xwe tenzîm kirine. Lê belê ev qismî ne. Bi qismî tevek pêk nayê, lazim e tu kitêbên serfê bixwînî îcarê bi esl û fer ‘ rêbazên serfê dê me ‘lûmê te bibin. Yanî ‘ilmê serfê mutleq ji hemû ilman çetintir e. Lewranê şa ‘îrên tîrkan gotine ku ev beyta tîrkî di ilmê serfê da bit.

Serfin i ‘lalî çoktur bir demirden baş gerek

Okuyan derrak gerek, ya okutan kardaş gerek.

Îcarê bi her awayî mewqûf dîqat û se‘î û xeyreta talib

Wellahu’l- muwafiq, el muste‘anû ‘ela kullî’l- umûr.

ENCAM

Eliyê Teremaxî piştî xwendina xwe kuta dike vedigere gundê xwe, mizgeft û medreseyekê ava dike û dersa feqîyan dide. Gundiyên Teremaxê dibêjin Teremaxî li kêleka medreseyê ji bo debara feqîyên xwe aşekî zêdxasiyê jî daye çêkirin. Hêjayê gotinê ye ku ev yek feraseta Teremaxî ya pûtepêdana ilm, tahsîl û medreseyan nîşan dide. Nîşaneyên vê ferasetê û hemiyetê di berhemê de jî aşkera xuya ne. Derd û kula Teremaxî axaftina tekûz a kurdiya kurmancî û rêkûpêkiya wê ye; mebesta nivîsîna berhemê jî heman tişt e. Teremaxî armanca xwe wiha diyar dike: “Bê ‘ilmê şerfê kelam dirist nabî, lewra lazim e ku tu weq‘a xebirdanê bizanî, mesela mufred û tesniye û cem‘an ferq bikî û bizanî. Û gayib û hadirî ji yekûdû cuda bikî û muzekker û muennesê ji hevdu veqetînin ku heta xebirdana rast û dirist bibe. Mesela: Eger tu nizanî bi lefza mufredê [yekjimarî] digel tesniye [dujimarî] û cem‘ê [pirjimarî] xeber bidî, kelamê te gelet dibî û cehla te me‘lûm dibe. Ev ‘ilm, şerf di hemû kafêd lîsanana da heye û îcra dibe. Emma ê ku niha ji boy me lazim e, zimanê kurmancî ye... bilanê şerfa farisî û kurmancî jî bitin”²⁰⁷. “Bila serfa kurmancî jî hebe” ev fikra Teremaxî weke şoreşeke fikrî ye di kevneşopîya medreseyên kurdan de.

Derbarê bernavê Eliyê Teremaxî de nelihevkirinek heye, lêkolîneran bernavên wekî “Teremaxî”, “Teremûkî”, “Teremokî”, “Termûk”, û “Termokî” lê kirine, em gihîştin wê encamê ku bernavê rast “Teremaxî” ye. Em bi lêkolîn û lêgerîna nav pirtûkan nesekekin çûn gundê wî. Me bernavê wî, navê gundê wî, ciyê lê hatiye definkirin û hwd. gelek agahiyan ji devê gundî û nevîçîçîrkên wî selmandin. Li ser dîroka jidayikbûna wî hin agahî hene, lê belê binyad û çavkaniya wan ne zelal e. Bes mirov dikare bibêje ku Eliyê Teremaxî di şikesteka sedsala 16 û 17an de jiyaye. Eliyê Teremaxî berhema xwe bi kurdiya kurmancî û tîpên erebî nivîsiye. Devoka Hekariya û Botan xebitandîye. Di terîmînolojiya wî de ya ku bi kar aniye têgihên rêzimana erebî serdest in. Digel wan termên erebî, gelek term û têgihên kurdiya kurmancî jî yên alîkar û îfadekirinê bi kar anîne ku ev uslûb derbarê uslûba medreseyên Kurdistanê de agahdariyeke zengîn dide me.

Mijara vê angaştê li ser lêkolîn û dahurandina *Tesrîfa Teremaxî* bû. Mixabin me nekarî em xwe bigihînin destnivîsa orjînal, lê belê nusxeya ku Marûf Xeznedar çap

²⁰⁷ Teremaxî, h. b. , 29-30.

kiriye û tê de dibêje: “Di vê kitêbê de em temamê destnivîsê belav dikin, bêyî ku em dest bidin îmla, şêwe û nivîsînê.” Me jî bêyî ku em dest tê werdin ew transkirîbe û rojane kir. Ji aliyê ziman, rêziman, devok term û têgihan ve ew dahurand. Teremaxî erê bahsa giramera kurdiya kurmancî û farisî jî dike lê belê pîvana wî cardin serf û nehwa zimanê erebî ye, lewma vegotina gramera herdu zimanan jî qels mane. Hêjayê gotinê ye ku ev yek qedr û qîmeta berhemê kê nake, lewre ev xebateke destpêkî ye, bi qasî ku em dizanin berî wê nimûne nînin.

Bi wesîleya vê tezê em pê hisiyan ku xanedan, mîrek, eşîret û terîqetên kurdan gelek pûte bi medrese û feqîyan dane. Ji ber ku ne mijara me ya bingeîn bû em zêde li ser vê mijarê nerawestîyan, digel wê me behsa kevneşopiya medreseyan kir. Di dewra xanedan, mîrekî û terîqetên kurdan de rewşa medreseyan vegot. Behsa jiyana feqîyan û kitêbên wan ên ku dixweynin kir. Dîsa bi vê xebata tezê em gihîştin wê baweriyê ku peymanî Idrîsê Bedlîsî û Yavuz Sultan Selîm a piştî şerê Çildêranê di civaka kurdên Bakûr de geşedaneke sosyo kulturî pêk aniye û *Tesrîfa Teremaxî* bi xwe jî berhemek ji berhemên wê geşedanê ye. Ev mijar jî hêjayî lêkolîn û lêgerîneke ciddî ye.

Eliyê Teremaxî bi nivîsandina vê berhemê berî niha bi 400 salî ne tenê berhemêke rêzimana kurdiya kurmancî nivîsiye û ew bi zimanê erebî û farisî re berawird kiriye belkî ya jî wê jî girîngtir numûneyeke hayîhêja ya perwerdehiya bi zimanê kurdiya kurmancî jî daye. Her wiha pexşana ewil e jî. Berhem ji bo kesên ku nû dê dest bi xwendina erebî bikin hatiye nivîsandin, loma piraniya mijaran hêsan û di ser re hatiye dayîn. Heta gelekê mijaran kê in jî. Berhem ji destpêkekê û 31 yek fesl (beş)an pêk tê. Para zehf behsa rêzimana zimanê erebî dike. Ne bes be jî behsa rêzimana kurdiya kurmancî jî dike. Di berhemê de asta zanyariya Eliyê Teremaxî diyar e û xweşnêrîniya wî ya derbarê zimanên dîtir de hatiye selmandin, maxwena gramera zimanê erebî, farisî û kurdiya kurmancî dide ber hev û bi beytekê be jî cî dide zimanê tirkî.

PÊVEK 1

PÊŞGOTINA MELE MAHMÛDÊ BAZÎDÎ YA TESRÎFA TEREMAXÎ

MUQEDDÎMA ILMÊ SERFÊ Û BE 'DÊ USÛLÊ LAZÎME YÊ TE 'LÎMIYYE

BI ZIMANÊ KURMANCÎ

MUQEDDÎMA BEHSA MUSENIF Û MÛCÎDÊ SERFÊ DI NÊV EKRADAN
DA TÊTE BEYANKIRIN

1274H.

Bîsmîllahîrrehmanirrehîm

Malûmê te bibit ku telebe û fuqehayêd ekradan heta tarîxa hezarî, ilmê serfê ji kitêbêd erebî el îbare weku kitêba Se 'deddîn Teftezanî ku *Se 'dînî* dibêjinê û ji *Çarperdiyê* û ji *Se 'dullah Gewre*, ji van emsal kitêban îstînbat û îxrac dikirin û îxraca ji kitêbêd erebiye jî zaf dijwar dibûye. Paşî di tarîxa hezarî bi şûve ji qezayêd Hekariyan di qeza Miksê da gundek heye *Teremax* dibêjin, ji wî gundî navê Elî mirovike xoyzihn û îdrak sahibbîş û fitanet peyda bûyî, teleba ilm û funûnêd bedî'e kirî, mideyekî medîde li Bexda û Musil û Behdînan û Soran gerriyayî û mayî û xwendî û kesb kemal û funûnê ilûm kirî. Di fenê ilmê serfê da zêde miharet û risûx peyda kirî. Di zemanî xwedanî qewî zêde meşhûr û me 'rûf bûye. Û belku heta niha jî nav û nîşanêd wî di Kurdistanê da heyîn. Ewî Elî Teremaxî bi xwe bi destê xwe di nîva gundî mizgeft û medrese bîna kirine, û mideyekê bi xwe jî ders gotine. Weku dîtîye û muşahede kirine ku ilmê serfê fenekî zehmet û dijwar û asê ye. Û muptedî zû bi zû sîxe û i 'lalêd wan ji kitêbêd erebî îxrac nakin. Ji boyî hêsiya muptediyan bi zimanê kurmancan îbaretkî tesrîfê tesnîf kiriye ku ew îbaret di nîva telebeyêd

ekradan qewî meqbûl û ehem û lazim e. Elbette weku talibî murada xwendina serf û nehew û made û mentiq û ulûmêd mayî dikan. Elbette berê metn û îbareya Elî Teremaxî bixwînîn û jiber bikin, paşî dest bi ulûmêd mayî bikin, lewranê ev ilmê serfê mêzîn e, elbette her tiştek hewceyê mêzînê ne da dirist û nederistiya wan kifş bibe, lewranê berê zaf medaris di welatêd Kurdistanê da hebûn û şuhreta ulûman jî gelek hebûn di kafeê bajêr û qeda û qesebe û gundêd ehlê Îslamêd Kurdistanê da, elbette, felabudde medreseyek û du sê û belku îdî zêde hebûn. Û bîla derece dîqet î ihtîmam jî kinarêd walî û ehaliyan derheq emrêd medaris û uleman hebûn û li nik mezin û biçûkêd Kurdistanê qedr û rifêta ilm û uleman hebû, melayêd qewî zûfinûn di Cizîr û Îmadî û Soran û Si'ert û etrafan da zaf bûn, telebeyêd Kurdistanê heta Bexda û Besra û Mûsil diçûn û geriyan û tehsîla ulûman dikan. Mubtedêd Ekradan jî ibtîdada hîce û Qur'anê dixwînîn, paşî Mewlûda Kurmancî, paşî Nûbihar û Pendê Ettarî, paşî jî Şerî'etê: Îcaz û Muherrîr û Enwarê dixwînîn, îcarê îbarete Tesrîf û Zurûf û Terkîba Mela Yûnisê Helqetênî dixwînîn, ku eve hersêna bi zimanê kurmancî ne, paşî jî serfê Se'dînî û S'edullah Kuçuk û jî mentiqê Hisamkatî û Qewlehmed û Şerhşemsiye, xulase bi tertîb duwanzdeh ulûman dixwînîn û muntehî û mezûn dibin. Ew Elî Teremaxî û Mela Yûnus Helqetênî jî di gundêd xwe da medfûn in. Lakin niha îdî medrese û ulema û xwendin di Kurdistanê da qewî kêr bûye nadir peyda dibe. Elbette elametê axirî ye ku ilm û ulema niqsan dibin wellahu e'lem.

PÊVEK 2

FOTOYÊN HINEK ÇAVKANIYAN

ده ستووری زمانی عره بی به کوردی علی ته ره مافی سهدهی هه فدهمی زاین

ده ستووسی ژماره (C 1958) ی نامۆزگای
پۆژهه لاتنای نه کادیمی زانستی سۆفیهت
له لنینگراد
له سالێ ۱۲۷۴ هـ / ۱۸۵۷ - ۱۸۵۸ یونووس کراوه

لیکۆلینهوه و له سه رنوو سین و ناماده کردنی
بو چاپ

دوکتور مارف خه زنه دار
قوتابی و کارگری زانستی نامۆزگای پۆژهه لاتنای
نه کادیمی زانستی سۆفیهت له لنینگراد (۱۹۶۰ - ۱۹۶۸)

۱۹۷۱

به خه

چاپخانهی « دار الزمان »

138

FOTO 1: Berga Destûrî Zimanê Erebi Be Kurdî Eliyê Teremaxî Sedey Hevdemî Zayinî.

هنا کتاب عبارة

على تره ماخی

هنا کتاب صرف لسان کوردی

بسم الله الرحمن الرحيم

اعلم تو بزبان ای مفردی مذکری مخاطب کو و بوی طایفـ
اکرادان را وی لازمه کو بزمانی کورمانجی او و علمی صرفی بزانی .
لورا بنا و اساسا حمو علمان لـ علمی صرفی به . علم حمییکه و کو
میزینه و بوی علومید مایی را فنونید به علم صرف تی نه وزناندین کو
درست و غلطیا وی علمی و خبردانا وی کلامی راست و درست یه .
لورا و کو طشتک نه ایته وزناندین کسک تمام و کیماسیا وی نزانه .
بس و کو هایه واجیه کو مروف علمی صرفی بزانه دا تکلم و خبردانا
راست و درست یه . بی علمی صرفی کلام درست نایی . لورا لازمه
کو تو وضع خبردانی بزانی مثلا مفرد و تشیه و جمعان فرق بکی و
بزانی . و غایب و حاضری و یکودو جدا بکی . و مذکر و مؤنثی و
مقدو ققه طینی کو حتی خبردانا راست و درست یه . مثلا اگر تو
نزانی بلفظا مفردی دگل تشیه و جمع خبر بدی کلامی ته غلط دبی و
جهلا ته معلوم دبه . اف علم صرف د حمو کافید لساناندا هیه و اجرا
دبه اما ایکو نها و بوی مه لازمه زمانی کورمانجیه لاکن لازمه کو
بعضک زمانی عربی و فارسی مثالان بی نن لورا اف علم صرف باصل
و ابتدا د زمانی عربی دا بویه و الفاظید کو لازمه و بوی علمی صرفی
الفاظید عربینه مثلا لفظ : فعل ، اسم ، حرف ، فاعل ، مفعول ، اسم
فاعل ، اسم مفعول ، ضمیر ، ایدی گلك الفاظید عربی هنه کو البته

FOTO 1: Ji Destûrî Zimanî Erebi Be Kurdî destpêka metna Tesfîfa Teremaxî.

(اوها) او ژی ژ بوی تشیه و جمیع غایبان اسماء الانساره و هم اسماء الاشاره تید کورمانجی ژی هین، و کسو نها: (ا) (ا) ژ بوی حاضری مفرد چه مذکر چه مؤنث، (ا) و (ا) (ا) ژ بسوی تشیه و جمیع حاضران بلا فرق، (او) ژ بوی مفرد غایب نه بلا فرق، (و) ژ بوی مفرد مخاطبی حاضره بلا فرق، (وان)، (اوان) (ا) هر دو ژی ژ بوی تشیه و جمیع غایبان بلا فرق.

فصل ۴۷ د بحثا ندادایه، معلومی ته یه نلدا بمعنا گازی کره، یانی گازی فرده کی و یا جماعتکی یکی، او ژی مخصوص صرفا ندایی هیه. د لسانی عربیدا (یا)، (وا)، و کو نها دیژی: یا عبدالله، و احمد، یانی بحرفا ندایی گازی فان مروفان دکی فردا فردا. د ندادایه ژی تشیه و جمع دبی و کو نها دیژی: یا عبداللهین، و یا احمدین، تشیه، و یا عبداللهون، و یا احمدون، د منادا جمیعدا هیه. د لسانی فارسه حرفا ندایی لفظ (ای) و کو نها دیژی: (ای سید) و (ای سیدم)، سید اولادی رسولی نیر، سیده اولاد رسولی می، هابا د آخریدا علامتی تأثیری، د زمانی کورمانجی ژی حرفا ندایی لفظ (او) و کو نها دیژی: او محو، او عیشی، یا د آخری علامتی تأثیری.

فصل ۴۸ د بحثا استنهامید د لسانی عربیدا، استنهام اوه کسو دخوزه کو طشتکی پرسیار بکه و فهم بکه کو بویه و یانی نه بویه، حرفا استنهامی ژی همزه، و کو نها دیژی: آجاء فلان، یانی فلان مروف هاتیه، بی حرفی دخوزه کو فهم بکه کو او فلان هاتیه و یاخود هاتیه، استنهام د زمانی فارسه و کورمانجیدا هر دوکان ژی بلفظ (آیا) و کو نها دیژی: (آیا فلان کار تمام شد)، یانی دخوزه کو بزانه عجب او شولا معلومه تمام بو و یاخو نه بویه، اژی استنهاما فارسه. د زمانی کوردی ژی، و کو نها دیژی کو: (آیا سری هیشی بویه)، اژی استنهاما کورمانجیه.

89

- ۵۲ -

فصل ۴۹ د بحثا مضاف و مضاف الیه دانه، اف مضاف و مضاف الیه د حمو لساناندا هیه و لازمه، یانی نسبت طشتکی بیال یکی دنی ددی او طشتی پری مضاف دیژین او طشتی پاشین مضاف الیه دیژین، یانی نسبتا شیشکی بیال شیشکی ددی، و کو نها دیژی: غلام امیر، غلام مضافه و امیر مضاف الیه، یانی غلامی میر، و ابن یزید، ابن مضافه و یزید مضاف الیه، یانی کوری یزید، الله نسبت غلامی بیال امیری، و نسبتا ابن بیال یزیده هیه. اف مضاف و مضاف الیه د زمانی فارسه و کوردی ژی هین، لکن د فارسیدا نسو علامتی نسبتی تو فی نه، بلکه ژ روشا کلامی معلوم دکه مضاف و مضاف الیه، و کو نها دیژی: (اسپ خواجه) و (فرزند ملا)، لکن د زمانی کورمانجیدا علامتی اضافی (یا) د آخری مضافیدا لفظ دبی، او علامته اقه مضاف و مضاف الیه نه، مثلا و کو نها: (هسپی خواجه)، (کوری ملا)، (غلامی میر) اف یاه دلالت دکه کو اقه مضاف مضاف الیه نه.

فصل ۵۰ اقه ژی مجرد د بحثا نسبتی مثلا و کو مروشکی و یاخو مالکه نسبت بدی بیال جهکی، او ژی د هر سی لساناندا ژی بلفظ (یا) دبی و ژ وی یایی یا نسبتی دیژین، و کو نها: بنسدادی، یانی اف مروف منسوبه بیال بنسدادی و ژ اهلی وی دری، د لسانی فارسه و کوردیدا ژی (بهره وی) فارس، (شلمی) بکوردی.

فصل ۵۱ ختم الکتاب، معلومی ته به بی ای طالبی علم صرفی کو اف علمه زیده فکری مشکله و زاف صیغه و اعلال و تبدلات و ضمیر و کیفیات هین، لازمه کو تو بجند و سمی دقت و غیرت یکی. الله بعض قواعدید جزئی بون کو من بحثا القدرت تنظیم کری، لکن الله جزوی نه، بجزوی کل حاصل نایی، لازمه کو کسبید صرفیه بغوفی ابحاری باصل و فرع قواعد صرفیه معلومی ته دبی، یانی علم صرف

88

- ۵۳ -

FOTO 1: Ji Destûrî Zimanê Kurdî rûpelên berî rûpela dawî yên metna *Tesrîfa Teremaxî*.

مطلق و حو علمان چینی زه ، لوردانی شاعریه ترکان گوتسه کو ای
تیا زکی ذعلم صریفدا بیت :

صرفنك اطلالی چو فستند یو دهریدن بانی كوك
الوفیل ندانه كوك با الوندان قردانی كوك (۱۵)
ایجاری هر وجهی موقوف دقت و سعی و غیره نا طالب
والله الوفیق المستعان علی كل الانور

فهرهنگونی نیکستی دهسنوسی

« دهسنوسی زمانی عهری به کوردی »

عللی تهرماخی

به لای ئیموده عالی تهرماخی دهسنوره کی به زمانیکی
بارای کوردی نهوتو نویسیره ، که هه موو پیژینکی نام به بدانهو
خۆندهوارینکی کورد له مه به کانی ده گا . له گیل نهو مه هه ندی
ووشی ومان له تیکست کانداهلیزارد که له وانه به راست و خۆ
خۆندهو بو مانا کانیان نهچن .

ووشه کاندان بهو ئیملابه نویسیره که ل تیکست کانی
دهسنوسه که دا هاتوون ، ئیجا به ئیملای تازهو له پاشانا مانا کانیان
ئیک دراوه نهووه .

آسی : ئاسی ، عاسی ، سخت ، بالی : بال دی ، له لای نهو ، له زحمات .	کن نهو .
آز : ئاز ، من .	بیت : بیت ، بیت ، بین .
آف : ئاف ، نهفه ، ئهم ، ئهمه .	بسی : بسی ، به تهنی ، به تهنیا .
آفانا : ئه فانا ، ئهمانه .	برك : برهك ، پرئ ، پیچكه ،
آفنه : ئه فنه ، ئهمانه .	هه ندك ، هه ندی .
آلبته : ئه لبه ته ، هه لبت ، به لام ،	بری : بهزی ، ییتسی ، پاریزودو .
دیاره .	چرته : جودا بوونهووه .
ویدی : ئیدی ، ییدی ، ئیتر .	بشووه : بشووه ، بهولاوه .
باب : باق ، باوك .	بلانی : با ، بام ، بهی فاكا .
بازیر : بازیر ، شار .	بوری : بۆری ، بهزی ، پاریزودو .
بال : كن ، لك ، لا ، جام ، دهف ،	بوی : بۆی ، بۆنا ، بو نهو .
لالی .	بیکفه : بیکفه ، بیکهوه .

(۱۵) ئهم بهینه شیمه به زمانی تورکسی هۆزراوه نهووه و ماناکی
بهم جۆره به : « صرف » ئیملای نۆزه ، سهزینکی ئاسینبی دهوتی ، نهوهی
که له بێخۆن دهتێ نۆز هوشیار ی و نهوهی ده بێخۆنه دهتێ دهتێ بزا
وایسن .

FOTO 1: Ji *Destûrî Zimanê Kurdî* rûpelên dawî yên metna *Tesrîfa Teremaxî*.



FOTO 2: Hacer Elef. Nevîçîcirka Eliyê Teremaxî ye.



FOTO 5: İhsan Hatim, nevîçîrkê Eliyê Teremaxî. Ji milê rastê ve kesê duyem



FOTO 4: Dîmenek ji Gundê Teremaxê



FOTO 4: Dîmenek ji gundê Teremaxê



FOTO 5: Mizgefta Nankas



FOTO 6: Kavilê Dêra ku di nav gundê Teremaxê de ye.



FOTO 7: Mizgefta gundê Teremaxê ya ku li ser taqê mizgefta kevnare ya Eliyê Teremaxî hatiye lêkirin.



FOTO 7: Ji aliyê hundir ve taqê dîwarê Mizgefta ku Eliyê Teremaxî bi destê xwe daye avakirin. A niha di bin Mizgefta nû de maye.

ÇAVKANÎ

ADAK, Abdurrahman, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik**, Weşanên Nûbihar, İstanbul 2014.

ABDULMAJÎD MAHMOUD, Nairouza, "**Kîtabu's-Serfî (el-'Erebiyyî) Bîlluxetî'l-Kurdiyyeh Lî 'Elîyyî Teremaxî (el-Qern 16-17M.)**", (Yüksek Lisans, Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü), Diyarbakır 2015).

ARFA, Hasan, **Kürtler Üzerine Tarih ve Folklor Yazıları**, Sevgi Soysal-Enis Talu Çelikkan (Çev.), Öz-Ge Yayınları, Ankara 1991.

ARSLAN, Mesut, "**Di Dewra Osmaniyan de Weşangeriya Kitêbên Kurdî (1848-1923)**", (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî), Mêrdîn 2014.

AZÎZAN, Herekol, "Klasîkên Me", **Hawar**, c. 2, r.6.

AVCI, Ziya (Amd.), **Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî Mela Mahmûdê Bazîdî**, Lîs, İstanbul 2010.

BEDLÎSÎ, Şerefhanê, **Şerefname-Dîroka Kurdistanê**, Ziya Avcî (Wer.), Weşanxaneyê Avesta, İstanbul 2012.

BEG, Muhammed Emîn Zekî, **Kürtler ve Kürdistan Tarihi**, Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan (Çev.), Weşanên Nûbihar, İstanbul 2013.

BILEC, Şêrko, **el-Qediyetu'l-Kurdiyye Madî'l-Kurdî We Hazîrûhûm**, Dar Aras Li't-Teba'e We'n-neşir, Erbîl 2011.

BOLELLÎ, Nusrettin, "Kürt Bilginlerin Yazdıkları Bazı Eserlerin Tanıtımı", **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, c. 1, r. 67-81.

ÇÖGENLÎ, M. Sadi, **Arapça Fiil Çekimi ve Sarf Bilgisi**, Erzurum Kültür-Eğitim Vakfı Yayınları, Erzurum, 1997.

DOSKÎ, Tahsîn î. **Îqdu'l-Cuman: fî Teracîmî'l-Ulemaî we'l-Udebaî'l-Kurdî we'l-Mensûbîne îla Mudunî we Qura Kurdistan**, Mektebetu'l-Ûsale wet'-Turas, eş-Şarqe 2008.

DOST, Jan (Amd.), **Adat û Rusûmetnameê Ekradiye: Mela Mahmûdê Bayezîdî**, Nûbihar, İstanbul 2012.

DÜNDAR, Mahmut, "**Mısır Eyyûbilerinde Eğitim ve Öğretim Faaliyetleri**", (Doktora Tezi, Atatürk Üniversitesi sosyal Bilimler Enstitüsü), Erzurum 2014.

EBDULHEMÎD, Muhammed Muhyeddîn, **Durusu't-Tesrîf**, el-Mektebu'l-Esriyye, Beyrût 1995.

ed-DÎMEŞQÎ, Ebdulqadîr bin Muhammed en-Ne'îmî, **ed-Daris fî Tarîxî'l-Medaris**, Daru'l-Kitabu'l-İlmiyye, Beyrut 1990.

- ed-DIYARBEKİRÎ, Ehmed Hilmî Qoxî (Ed.), *Gulzara Hemûkan Şerha Nûbehara Biçûkan*, İhsan Yayınları, İstanbul 2004.
- el-XELAYÎNÎ, el-Şeyx El-Mustafa, **Camîu'd-Durûsu'l-Erebîyye**, Daru'l-Kutûb, Beyrût 2007.
- ETA, Yûsuf, el-Hemmadî, Muhammed Muhammed eş-Şennawî, Muhammed Şefiq, **El-Qewaîdu'l-Esasiyye Fî'n-Nehwî Wes'-Serfî**, el-Mektebu'l-Emîriyye, Qahîre 1994.
- EPÖZDEMİR, Şakir, **Medreseyên Kurdistanê: di Dewra Mîran û Neqşebendiyan de**, Weşanxaneyê Nûbihar, İstanbul 2015.
- EN-NEHWÎ, Ebu'l-Feth Usman bin Ebdullah İbnî Cinnî, **et-Tesrîfu'l-Mulûkî**, Misir 1913.
- ERGÜN, Zülküf, Zülküf, **Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan**, Nûbihar, İstanbul 2014.
- es-SUYÛTÎ, Ebdurrahman Celalu'd-dîn, **el-Mezher Fî Ulûmu'l-Luxetî we Enwa îha**, şerh û tewzîh: Muhammed Ehmed Cadu'l-Mewlabîk, Elî Muhammeder-Recawî, Muhemmed Ebu'l-Fedil İbrahîm, Daru't-Turas, Qahire 2008.
- et-TÛNİKÎ, Mahmûd hesen, **Mu 'cemu'l-Musennifîn**, Dimeşq 1957.
- el-CURCANÎ, es-Seyyid eş-Şerîf, **Seyyid Ele'l-Izzî**, Hacı Hüseyin Efendi Metbeesi, 1311 H.
- el-EŞNEWÎ, Elî bin eş-Şeyx Hamîd, **Tesrîfu'l-Ellame Elî bineş-Şeyx Hamîd el-Eşnewî**, Misir 1384H.
- et-TEFTEZANÎ, Se 'duddîn, **Tedrîcu'l-Edanî İla Qîraetî Şerhu'l-Se 'dî Ela Tesrîfî-i-Zîncanî**, Dar İhyau'l-Kîtab'l-Erebiye, Misir 1348.
- EMRE, Ahmet Cevat, **Türkçe Sarf ve Nahiv Eski Lisan-î Osmanî Sarf ve Nahiv**, TDK Yayınları, Ankara 2004.
- ERKAN, Arif, **Açıklamalı Emsile Bina Maksud Metin ve Tercemesi Arapça Kelime Bilgisi Sarf 1**, Sağlam Yayınevi, İstanbul 1981.
- ez-ZAZA, Muhemmed Nezîr, (Ed.), **el-Mecmu 'e'tu'l-Menheciyetu Ew Tesrîfu'l-Teremaxî Fî İlmî's-Serfî**, Mektebetu'z-Zengîyye-Mektebetu'l-Mînhac, Diyarbekir 2014.
- FINDÎ, Reşîd, **Eliyê Teremaxî Êkemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e**, el-Mektebetu'l -Weteniyye, Bexdad 1985.
- GORAN, Elî Seydo, **Mîn Umman Île'l-Emadiye**, Dar Aras, Erbil 2012.
- HASANPOUR, Amir, **Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil: 1911-1985**, İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan (Wer.), Weşanên Avesta, İstanbul 2005.
- HAZAR, Dursun, "Osmanlı Medreselerinde Arapça Öğretimi ve Ders Kitapları", **Gazi Üniversitesi Çorum İlahiyat Fakültesi Dergisi**, j. 1, 2002, r. 274-293.

- HELQETÎNÎ, Mele Yûnis, **Tesrîfa Kurmancî** Destxeta Mele Mihemedê Hirorişî.
- HİZMETLİ, Sabri, **İslam Tarihi(Başlangıçtan İlk Dört Halife Sonuna Kadar)**, Ankara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları, Ankara 1991.
- İBRAHÎM, Şehabbuddîn Ebdurrahman bin İsmâil bîn, **Kîtabu el-Murşîdu'l-Wecîz**, Darsadir, Beyrûd 1975.
- KAHRAMAN, Seyit Ali, – Yücel Dağlı (Ed.) **Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahatneme**, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul 2010.
- KURDO, Qanatê, **Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî**, Weşanxaneyê Nûbihar, İstanbul 2013.
- KURDO, Qanatê, **Tarîxa Edebiyata Kurdî**, Weşanên Lîs, Amed 2010.
- KEHHALE, Umer Rida, **Mu'cemu'l-Muellifîn**, el-Mektebu'l-Weqfiyye, c. 3. , Dimeşq 1957.
- LAZAREV, M. S. Ş. X. Mihoyan, E. İ. Vasilyeva, M. A. Gasratyan, O. İ. Jigalina, **Kürdistan Tarihi**, İbrahim Kale (Wer.), Avesta Yayınları, İstanbul 2001.
- Lîsanu'l- Ereb Lî İbnî Munzûr, “Medrese”, Daru'l-Me'arif, Qahîre 1119H.
- MAMOSTE QEDRÎ, “Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê “*Destûra Zimanê Erebî bi Kurdî Digel Hinde Numûneyêd Farisî û Kurdî*”, **Kovara Lêkolîn û Lêgerînê Bîr**,Diyarbakır 2005, j. 1, r. 192-198.
- MERAL, Ahmet, **Tesrîfu'l-Ef'alî We'l-Esmaî'l-Erebiyyeh**, Yasîn Yayınevî, İstanbul 2013.
- MUHSÎN, Muhammed Salîm, **Tesrîfu'l-Ef'al We'l-Esma' Fî Dew'î Esalîbî'l-Qur'an**, Mesûrat Ebdurrahman en-Necdî,Daru'l-Kîtabu'l-Erebî, Beyrût 1987.
- MINORSKY, “Kürtler”, **İslam Ansiklopedisi**, c. 6. İstanbul, 1955.
- NAROZÎ, Emîn, “Xwendin û Feqîtî”, **Bîrnebûn**, j. 18, 2002, r. 15-26.
- NEBEZ, Jemal, **Kurd (Dîrok û Kultura Wan)**, Ergîn Opengîn (Wer.), Weşanên Avesta, İstanbul 2008.
- NÛRSÎ, Bediuzzeman Seîd, **Dîwana Herba Urî**, Aydın Üneşi (Wer.), Hizmet Vakfı Yayınları, İstanbul 2012.
- Osmalıca-Türkçe Ansiklopedik Büyük Luğat, “Tasrîf”, Derya Dağıtım A. Ş., İstanbul 1978.
- PAŞA, Ekrem Cemîl, **Dîroka Kurdistan**, Omer Dewran (Wer.), Weşanên Bîr, Diyarbakır 2007.

- PURGSTAL, Baron Joseph Hammer, **Hammer Büyük Osmanlı Tarihi**, Mehmed Ata Bey, Vecdi Bürün, Refik Özdek, Erol Kılınç, Fuat Onuk, İsmet Elbaşı, Dr. Mumin Çevik (Çev.), Üçdal Neşriyat, c. 2, İstanbul 2010.
- RESÛL, İzzeddîn Mustafa, **el-Waqî‘ Fî’l-Edebî’l-Kurdî**, Dar Aras, Erbil 2010.
- REŞPOJAN, İmaduddîn, **Tesrîfa Kurdî Gulzara Zarokên Kurdan**, Mektebu Diyarbekir, Diyarbekir 2013.
- SAGŖNİÇ, Feqî Huseyn, **Dîroka Wêjeya Kurdî**, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2002.
- SADINÎ, M. Xalid, **Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî**, Weşanên Nûbihar, İstanbul 2012.
- SIDQÎ, Mela Seîd Kaban, **Muxteser Serf û Nehwî Kurdî**, Çapxaneya Necah, Bexda 1928.
- ŞEMREXÎ, Huseyin (Ed.) **Ehmedê Xanî-Mem û Zîn**, Weşanên Nûbihar, İstanbul 2009.
- SÜMER, Faruk, **Safevi Devletinin Kuruluşu ve Gelişmesinde Anadolu Türklerinin Rolü**, TTK Yayınları, Ankara 1992.
- ŞÊRKO, Bileç, **el-Qedîyet’ul-Kurdiye Madî’l-Kurdî We Hadîruhum**, Dar Aras, Erbil 1998.
- TALÛ, Mehmet, **Mecmu ‘etu’s-Serf (Emsîle , Bîna Fî’s-Sarf, Meqsûd Fî’s-Sarf, İzzî Fî’s-Sarf)**, Yasin Yayınevi, İstanbul 2013.
- TAN, Samî, **Rêzimana Kurmancî**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2011.
- TARÎNÎ, Mela Birhanê, **Medrese: Ji Her Aliyî Ve Medreseyên Me**, Weşanxaneya Lîs, Diyarbakir 2011.
- TELLÎ, Mela Ebdulla, “Ji Destpêkê Heta Îro Medreseyên Kurdî”, **Nûbihar**, j. 63/64, İstanbul 1998.
- TURGAY, Nureddin, **Açıklamalı İzzi Metin ve Tercümesi**, Sağlam Yayınevi, İstanbul 1986.
- ULUSOY, Ahmed, **Kuruluşundan 17. Yüzyıla Kadar Osmanlı Medreselerinde Eğitim-Öğretim Faaliyetleri**, (Yüksek Lisans Tezi, Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İlköğretim Ana Bilim Dalı Sosyal Bilgiler Öğretmenliği Bilim Dalı, Konya 2007.)
- XEZNEDAR, Marûf, **Destûrî Zimanê Erebî be Kurdî**, Çapxaney Daru’z-Zeman, Bexda 1971.
- YILDIRIM, Kadri, **Temel Araştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)**, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin 2012.

YILDIRIM, M. Said, **Mecmu 'etu's-Sarf(Emsîle, Bîna, Meqsûd, Tasrîf)**, Beka Yayınları, İstanbul 2006.

YILDIZ, Hasan, **XX. Yüzyıl Başlarında Kürt Siyaseti ve Modernizm**, Nûjen Yayınları, İstanbul 1996.

YÛSUF, Abdulreqîb, **Şaîrên Klasîk ên Kurd**, Weşanên Jîna Nû, Upsala 1988.

ZEHRAN, el-Bedrawî (Ed.), **el-Umûdû Kîtabun Fî't-Tesrîfî Ebû Bekir Ebdulqahir bin Ebdurrahman eL-Curcanî**, Daru'l-Me'arif, Qahîre 1995.

ZINAR, Zeynelabidîn, **Mele Elî Teremaxî Sserfa Kurmancî**, Weşanxaneyê Pencînar, Stockholm 1997.

ZINAR, Zeynelabidîn, **Xwendina Medresê**, Weşanxaneyê Pencînar, Stockholm 1993.

ZIHNÎ, Mehmet, **el-Muşezzeb yahut el-Murtabû Fî Serfî We Nehwî Lîsani'l-Ereb**, İstenbol 1980.

ÇAVKANIYÊN ÎNTERNETÎ

Tatvan Medine Medresesi, Tatvan Medine Medresesinin Eğitim ve Müfredat Programı,

http://www.Tatvanmedinemedresesi.com/main/index.php?option=com_content&view=article&id=39:medine-camii-medrese-mufredati&catid=12&Itemid=143

(18. 01.2016)

ŞÊXO, Mihemed, “Rûpelek ronîdayî ji dîroka toreya kurdî: Eliyê Teremaxî”, **Welatê Me**, 2016,
<http://www.welateme.info/kurdi/modules.php?name=News&file=article&sid=3169#.VyHm85qLQdU> (28.04.2016)

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisan Tezi

TEREMAXÎ'NİN TASRÎF'İ

(Metin ve İnceleme)

Aydın ÜNEŞİ

11711014

Danışman

Yard. Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin-2016